



K.T.

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYAYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

AJAL Ê NEBAT DI DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

Nîhat OĞURTAY

20711011

Şêwirmend:

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn-2023

K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYAYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

AJAL Ê NEBAT DI DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

Nîhat OĞURTAY

20711011

Şêwirmend:

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn-2023

T. C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

TEZ ONAYI

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 20711011 numaralı Yüksek Lisans programı öğrencisi Nihat OĞURTAY'ın hazırladığı “*Melayê Cizîrî Divanî'nda Bitki ve Hayvanlar*” başlıklı YÜKSEK LİSANS tezi ile ilgili TEZ SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 07/12/2023 günü saat 13:00'da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Başkan

Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

Üye

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Üye

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK (Danışman)

ONAY

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu'nun Tarih ve sayılı kararı ile onaylanmıştır.

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Enstitü Müdürü

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmada kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

Nihat OĞURTAY

2023

KURTE

TEZA LÎSANSÂ BILIND

AJAL Û NEBAT DI DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

Nihat OĞURTAY

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

2023: 107 rûpel

Xweza û hemû hêmanên xwezayê ji berê heta niha di jiyana me de xwedî cihekî girîng in. Çawa ku xweza û hêmanên xwezayê di jiyana mirovan de cihekî taybet digirin her wiha di wêje û helbestan de jî cihekî girîng digirin. Lewra di wêjeya kurdî ya klasîk de gelek unsurên siruştê bala nûser û helbestvanan kişandiye. Yek ji van helbestvanan jî Melayê Cizîrî ye ku xwezayê bala wî kişandiye û di gelek helbestên xwe de hêmanên xwezayê bikar anîye. Armanca xebata mejî ew e ku em di helbestên Melayê Cizîrî de ji hêmanên xwezayê ajal û nebatan tespît û analîz bikin. Bi vê mebestê me helbestên Melayê Cizîrî vekolandin û ji hêmanên xwezayê ajal û nebatên ku di helbestên wî de hatine bikaranîn tespît û analîz kirine. Ji bilî destpêk û metodolojîyê xebata me ji sê bêşên bingeîn pêk hatiye. Di bêşa yekem de derbarê jîyan, kesayet û helbestvaniya Melayê Cizîrî de agahî hatine dayîn. Her wiha girîngiya dîwana wî di çarçoveya edebiyata klasîk a kurdî de hatiye nîrxandin û agahî derbarê dîwana wî de hatine dayîn. Di bêşa duyem de nebatên ku di dîwanê de cih digirin bi wateyên ku ew hatine derbirin bi berfirehî hatine nîqaşkirin. Di bêşa sêyem de jî ajalên ku helbestvan cih daye wan hatine senifandin û analîzkirin. Her wiha rengvedana eleqeya helbestvan a ji heywanan re di helbestên wî de hat nîrxandin. Helbestvanan hêmanên xwezayê carna bi wateyên rastîn û carna jî bi wateyên mecazî bikar anîne. Taybetmendiyên xwezayê ji bo memdûh, evîndar û dilberê hatine veguheztin û ji xwendevanan re hatine dengvedandin. Hêmanên xwezayê bi hunerên edebî yên wekî şibandin, telmîh, mubalaxa û kînayê wateyên semantîk yên nû bi dest xistine. Di encama xebata me de eşkere bûye ku di helbestên Melayê Cizîrî de ji hêmanên xwezayê ajal û nebat gelekî hatine bikaranîn. Her wiha hatiye xuyakirin ku ji bo îfadekirina gelek hest û ramanên erênî û neyînî ji hêmanên xwezayê sûd hatiye wergirtin.

Bêjeyên Sereke:Edebiyata Kurdîya Klasîk, Melayê Cizîrî, xweza, ajal, nebat.

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MELAYÊ CİZİRÎ DİVANINDA BİTKİ VE HAYVANLAR

Nihat OĞURTAY

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

2023: 107 sayfa

Geçmişten günümüze doğa ve doğanın tüm unsurları hayatımızda önemli bir yere sahip olmuştur. Doğa ve doğa unsurları insan yaşamında özel bir yere sahip olduğu kadar edebiyat ve şiirde de önemli bir yer tutar. Bu nedenle klasik Kürt edebiyatında doğaya ait pek çok unsur yazar ve şairlerin ilgisini çekmiştir. Bu şairlerden biri de doğadan etkilenen ve birçok şiirinde doğa unsurlarını kullanan Melayê Cizîrî’dir. Bu çalışmanın amacı da Melayê Cizîrî’nin şiirlerinde yer alan tabiat unsurlarından hayvan ve bitkileri tespit edip incelemektir. Bu amaçla Melayê Cizîrî’nin şiirlerini inceleyerek şiirlerinde kullandığı doğa unsurlarından hayvan ve bitkileri tespit edip analiz ettik. Çalışmamız giriş ve metodolojinin yanı sıra üç ana bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde Melayê Cizîrî’nin hayatı, kişiliği ve şairliği hakkında bilgiler verilmiş, ayrıca klasik Kürt edebiyatı çerçevesinde divanının önemi değerlendirilerek divan hakkında genel bilgiler verilmiştir. İkinci bölümde divan da yer alan bitkiler, taşıdıkları anlamlarla ayrıntılı olarak ele alınmıştır. Üçüncü bölümde şairin şiirlerinde yer verdiği hayvanlar tasnif edilerek tahlil edilmiştir. Şairin hayvanlara olan ilgisinin şiirlerine yansması da değerlendirilmiştir. Şair tabiat unsurlarını bazen gerçek anlamlarla bazen de mecazi anlamlarla kullanmıştır. Doğanın özellikleri memdûh, aşık veya sevgiliye aktarılmış ve okuyucuya aksettirilmiştir. Tabiat unsurları teşbih, telmih, mübalağa ve kinaye gibi edebî sanatlar sayesinde yeni anlamsal anlamlar kazanmıştır. Çalışmamızın neticesinde doğa ve doğa unsurlarından hayvan ve bitkilerin Melayê Cizîrî’nin şiirlerinde çokça kullanıldığı meydana çıkmıştır. Ayrıca çalışmanın neticesinde birçok olumlu ve olumsuz duyguyu ifade etmek için doğa unsurlarından yararlanıldığı da ortaya konmuştur.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Melayê Cizîrî, tabiat, hayvan, bitki.

ABSTRACT

MASTER'S THESIS

Plants and Animals in the Divan of Melayê Cizîrî

Nihat OĞURTAY

Mardin Artuklu University

Institute of Graduate Education

Department of Kurdish Language and Culture

2023: 107 Pages

Nature and all the components of it have an important place in our lives. They also have vital importance in Literature and poetry for this reason, lots of elements of nature draw attention of writers and poets in Kurdish Literature. One of these poets is Melayê Cizîrî, who was inspired of nature and used the elements of nature. The purpose of this study is to determine and analyze the animals and plants which existed in Melayê Cizîrî's poems. Our study consists of three main parts, as well as introduction and methodology. In the first chapter, information about Melayê Cizîrî's life, personality and poetry is given, and general information about the divan is given by evaluating the importance of her divan within the framework of classical Kurdish literature. In the second chapter, the plants in the divan are discussed in detail with the meanings they carry. In the third chapter, the animals that the poet included in his poems were classified and analyzed. The reflection of the poet's interest in animals in his poems was also evaluated. The poet used natural elements sometimes with literal meanings and sometimes with figurative meanings. The characteristics of nature are transferred to the praised person, the lover or the beloved and reflected to the reader. Natural elements have gained new semantic meanings thanks to literary arts such as simile, allusion, exaggeration and allusion. As a result of our study, It has been revealed that nature and its elements, plants and animals, are frequently used in Melayê Cizîrî's poems. In addition as a result of the study, it was revealed that elements of nature were used to express many positive and negative

Key Words: Classical Kurdish Literature, Melayê Cizîrî, nature, animal, plant.

PÊŞGOTIN

Mirov wekî heyînekê ku li xwezayê dijî, bê guman bi bûyerên xwezayî yên li derûdora xwe re eleqedar bûye û gelek caran jî di bin bandora xwezayê de maye. Mirov li hember vê bandorê xemsar nemaye û hewl daye ku vê yekê bi awayên cûrbecûr teswîr bike. Kesê ku teswîran dike hem şiyana xwe ya çavdêriyê û hem jî xeyala xwe derdixîne holê. Bi vî rengî ew xeyalên xwendevan çalak dike. Dema mirov li helbestên klasîk dinêre, di nav dîwanan de piraniya redîfên helbestan hêmanên xwezayê ne, ev yek nîşaneyê helbestvanên klasîkê ye ku girîngî dane xwezayê. Em karin bêjin ku hêmanên xwezayê weke gul, bilbil, bihar, xezal, û hwd. di hemû helbestên klasîk de hatine teswîr kirin.

Ev xebata ku me “Ajâl û nebat di dîwana Melayê Cizîrî de” binav kiriye, li ser mijara di jiyana mirovan de cîh û girîngiya xwezayê sekiniye. Wekî din bivêlêkolînêşkere bûye bê çawa însan û xweza bandorê li hev dikin.

Hêmanên xwezayê di helbestan de wekî hêmaneke ku dîmenekî estetîk dide helbestê derdikeve peşberî me. Xweza di helbestên helbestvanan de bûye çavkaniya îlhamê û vê rewşê derfet daye me, ku em helbestan ji nêz ve binirxînin. Lêkolîna ku me li ser helbestên Melayê Cizîrî kir em bûne çavdêr ku di helbestên wî de bi awayekî xweşiktirîn xweza hatiye pêşandan.

Xebata me ji despêkek û ji sê bêşên sereke pêk tê. Di serî de, mijar, armanc, girîngî, rêbaz û tixûbdarkirina lêkolînê hatiye gotin. Piştî de bêşa yekem de di derbarê jiyana, kesayetiya edebî û helbestên Melayê Cizîrî de agahî hatine dayîn. Di bêşa duyem de analîza helbestên Melayê Cizîrî ji hêla nebatan ve û di bêşa sêyem de jî analîza dîwana Melayê Cizîrî ji hêla ajalan ve hatiye kirin. Ajâl û nebatên ku hatine tespît kirin bê bi kîjan meqsedê hatine bikar anîn hatine nirxandin û şîrove kirin.

Bêşa duyem ku ji nebatan pêk tê di bin banê sê serenavan de wekî; kulîlk û unsurên bi kulîlkan ve têkildar, dar û unsurên bi daran ve têkildar û bexçe hatiye senifandin. Di nav cureyên daran de dara ku herî zêde hatiye bikar anîn selwa û er’ar in. Ji bilî dara serwa û er’arê gelek cureyên daran wekî tûba, şimşîr û hwd. hatine bikar anîn. Gulîstan û bexçe di helbestan de bi piranî weke cih û meskenên kulîlkan û

dilberan hatine dîtin. Her wiha ji cureyên gul û kulîlkan jî dewlemendiyeke mezin ber bi çav e. Lewra ne gengaze ku em hemû cureyên gul û kulîlkan li vir bidin nasîn. Di dîwana Cizîrî de kulîlkên herî serdest gul û nêrgiz in. Ji bilî gul û nergizan gelek kulîlken weke sunbul, lale, binefş, belazîz û hwd. bi reng û şêweyên xwe bûne mijara helbestan.

Bêşa sêyem ku ji ajalan pêk tê di bin banê sê serenavan wekî; balinde, ajalên çar ling ên bejî û marîjok û kêzik hatiye senifandin û lêkolandin. Di dîwana Melayê Cizîrî de hem balinde hem ajalên bejî hem jî marîjok û kêzik gelekî xuya dikin û pirrengiyeke mezin teşkîl dikin. Ne gengaze ku em li vir hemû cihêrengî û dewlemendiyê nîşan bidin lewra di her serenavî de ajalên ku derdikevine pêş em dê binirxînin. Di nav balindeyan de balindeyê ku herî zahf derdikeve pêşberî me bilbil e. Ji ajalên çar ling ên bejî ên ku bi piranî bûne mijara helbestê xezal, piling, seg, fîl û hwd. in. Di bin serenavên kêzikan de ajala ku herî zêde em li rastî tîr perwane ye. Ajala ku di bin serenavên marîjokan de gelekî derdikeve pêş mar e.

Di encamê de, di destê helbestvanên hunerwer de, xweza bi awayê herî nuwaze li ber çavan hatiye raxistin. Ji ber ku lêkolîna me têgihiştina dinyayê û şêwaza jîyîna helbestvanê hunerwer nîşan dide girîng e.

Ji bo vê lêkolînê me ji gelek çavkaniyên nivîskî û ji gelek agahdarên zindî sûd wergirt. Ji ber vê yekê em deyndarên spasiyekê ne ji bo nivîskarên çavkaniyan û agahdarên zindî. Di serî de ez spasiya şêwirdarê xwe Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK dikim ku ji despêka xebatê heta dawîyê pêzanîn, sebr, têgihiştin û alîkarîya xwe ji min qut nekir. Ez spasdarê hevjinê xwe û her du zarokên xwe Janya û Rustem im ku min di pêvajoya vê xebatê de wan gelekî îhmal kir. Her wiha ez vê xebatê îthafî xwarzî û hevalê xwe gorbehişt Cesur Yalçın dikim.

Nihat OĞURTAY
Mêrdîn, 2023

NAVEROK

ETİK BEYAN	i
KURTE	iv
ÖZET	v
ABSTRACT	vi
PÊŞGOTIN	vii
KURTEBÊJE	xi
DESTPÊK	1
<u>Mijar, Sinor, Armanç û Rê û Rêbaza Xebatê:</u>	3
<u>Mijara Xebatê û Sînorên Wê:</u>	3
<u>Armanca Xebatê:</u>	3
<u>Rê û Rêbazên Xebatê:</u>	4
1. JIYAN, KESAYET û HELBESTVANIYA MELAYÊ CİZÎRÎ	5
1.1. Jiyana Melayê Cizîrî	5
1.2. Cihê Wî di Edebiyata Kurdî de	8
1.3. Dîwana Melayê Cizîrî	11
1.4. Hin Şerhên Dîwanê	12
2. NEBAT DÎ DÎWANA MELAYÊ CİZÎRÎ DE	15
2.1. Kulîlk û Hêmanên bi Kulîlkan ve Têkildar	15
2.1.1 Gul	15
2.1.2 Nêrgiz	18
2.1.3 Lale	21
2.1.4 Sunbul	23
2.1.5 Nesrîn	24
2.1.6 Sosin	26
2.1.7 Yasemîn	27
2.1.8 Rihan	29
2.1.9 Binevş	31
2.1.10. Erxewan	32
2.1.11. Gulnar	33
2.1.12. Kerbeş	34
2.1.13. Belazîz	35
2.2. Dar û Unsurên bi Daran ve Têkildar	36
2.2.1. Selwa	37
2.2.2. Narewan	39
2.2.3. ‘Er’er	40
2.2.4. Mêw	41
2.2.5. Şimşîr	42
2.2.6. Sêv	43
2.2.7. Tûba	44
2.3. Bexçe	45
2.3.1. Gulistan	46
2.3.2. Çîmen	47

3. AJAL DI DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ DE	50
3.1. Balinde.....	50
3.1.1. Silêmanê Dunikil.....	51
3.1.2. Nîmbismil.....	53
3.1.3. Bilbil.....	53
3.1.4. Bûm.....	56
3.1.5. Teyrê Tawis.....	58
3.1.6. Qijik.....	59
3.1.7. Huma.....	60
3.1.8. Teyrê Sîmir.....	61
3.1.9. Kew.....	63
3.1.10. Kevok.....	64
3.1.11. Qaz.....	65
3.1.12. Teyrêbaz.....	66
3.1.13. Goyîn.....	67
3.1.14. Tûtî.....	69
3.1.15. Qertel.....	69
3.2. Ajalên Çar Ling ên Bejî.....	70
3.2.1. Şêr.....	70
3.2.2. Weşek.....	72
3.2.3. Ga.....	72
3.2.4. Sihor.....	73
3.2.5. Hesp.....	73
3.2.6. Ker.....	74
3.2.7. Xezal.....	75
3.2.8. Fîl.....	76
3.2.9. Seg.....	78
3.2.10. Piling.....	79
2.3. Marîjok û Kêzik.....	80
2.3.1. Dûpişk.....	80
3.3.2. Tîmseh.....	83
3.3.3. Morî.....	83
3.3.4. Mar.....	84
3.3.5. Mêş.....	86
3.3.6. Perperîk.....	86
ENCAM	89
ÇAVKANÎ	91

KURTEBÊJE

AMD.	: Amadekar
C.	: Cild
Ç.	: Çap
DOÇ.	: Doçent
ED.	: Edîtor
H.	: Hicrî
H.B.	: Heman Berhem
HZ.	: Hezretî
HWD.	: Her Wekî Din
M.	: Mîladî
J.	: Jimar
K.T.	: Komara Tirkîyayê
R.	: Rûpel
S.S.	: Sedsal
WER.	: Werger
WEŞ.	: Weşan

DESTPÊK

Helbesta kurdî ji rabirdûyê heta roja me di konaxên cihêreng de pêşketina xwe domandiye. Di helbestên van konaxan de hin mijarên sereke wekî mijarên evînê her tim domdariya xwe diparêzin. Hin hêmanên wekî hêmanên xwezayê jî, carna wekî hêmanên alîker ku tevahiya helbestê temam dikin tene bikar anîn û carinan jî li gorî têgihîştina edebî ya wê serdemê dibin yek ji hêmanên bingehîn ên helbestê. Mijarên ku tene nexşandin ji hêla vegotinê û derbirinê ve ji hev cûda dibin. Di dîwana Melayê Cizîrî de li gorî vekolandinê me piştî mijara evînê hêmanên xwezayê mijarên bingehîn in. Beriya ku em qala van hêmanên xwezayî bikin pêwîste mirov bi awayeke giştî lê binere ku ev hêman di helbesta klasîk de çawa hatine bikaranîn û nirxandin.

Edebiyata klasîk ku bi sedsalan hebûna xwe domandiye, bûye mijara gelek lêkolînan. Di van lêkolînên ku di derbarê vê edebiyatê de hatine kirin lêkolîner gihiştine hin daraz û encamên hevpar. Li gorî vê yekê, di edebiyata klasîk de ji çeşnên edebî çeşna helbestê di rêza pêşîn de ye. Edebîyata klasîk ne edebiyateke razber e. Bêguman ew edebiyateke şenber e. Ev edebiyat ji mijarên civakî zahftir meylarê mijarên kesane ye. Helbesta klasîk ji aliyê mefhûm û mezmûnên ku ji edebiyata rojhilatî bi taybetî jî edebîyata farisî hatine wergirtin xwediyê kereste û meteryalên hevpar in.

Edebiyata klasîk ji ber ku xwediyê qalibên hevpar e û li ser kereste û qalibên hevpar hatiye sazkirin di hunerê de rê nedaye helbestvan ku ew di hunerê de azad û serbixwe tevbigere. Helbestvanên edebiyata klasîk xweza ne weke mijarekê nirxandine. Helbestvanan wekî hinceteke ku ew hûnerwariya xwe nîşan bidin nirxandine. Hêmanên xwezayê yên ku di helbesta klasîk de gelek caran tên dîtin ne xwediyê taybetmendiyên xwe yên alînegirin. Ev hêmanên ku ji dîmendariya xwe ya rastîn dûr dibin dikevîne teşeyê razber û weke hêmana alîker şayesandina ku hatiye xêz kirin temam dikin. Hêmanên xwezayê di helbesta klasîk de pirî caran ji bo teswîrên taybetmendiyên yarê tene bikar anîn. Lê di her du wezîyetan de jî hêmanên xwezayê ji çarçoveya îfadeyên klîşe xilas nabin û weke xwezayeke çêbuwar derdikevine pêşberî me.

Di helbesta klasîk de yek ji hêmanên qalibgirtî îmaja dilberê ye. Taybetmendiyên vê dilbera klîşê bi gelemperî bi hêmanên xwezayê tîr şayesandin. Ji ber vê yekê dîlber carinan roj e hin caran jî heyv e. Bejna wê wekî dara er'ar an dara serwayê ye. Porên wê an sunbul e an dupişk û mar in. Hinarkên wê dişibin gulên an jî gulnaran. Çavên wê mîna nergîzan xayîz in. Bîrhên wê kevan in, bijangên wê tîr in. Xemzeyên wê şûr an xençerîn, di pêşîra evîndar de diçikin. Lêvên wê hoqe ne an sindoqa cewheran in. Dinan jî di vê sindoqê de mirwar in. Dîsa lêv bi qasî xunce guleke ku hêj ne pişkiftiyê piçûk in. “Ev lêv ava jîyanê dibexşînin, kesê ku ji vê avê carekê vexwe êdî ew nemir dibe; lê heta niha kesî venexwariye. Ji ber ku dîlber her dem nazdar e.”¹

Her wiha evîndar bilbil, yar jî gul e û qijik jî berevan e. Rondikên evîndarê dilbikûl bi lehî û çeman tê şayesandin. Porên yarê bi şev û marên reş tê şibandîn. Bayê sibê agahîyan an bêhna yarê digihêne evîndar. Ew di nava aşîq û maşûk de di pozîsyona qasîd de ye. Her wiha mînakên bi vî rengî gelekî dikarin bêne zêdekirin.

Di vê xebata xweza navendî de, dîwana helbestvanê sedsala 16-17'an ya Melayê Cizîrî, ku yek ji helbestvanên herî hûnerwer e û ji hêmanên xwezayê ajal û nebat bi ewayekî eqilmendane di helbestên xwe de bikar anîne hatiye vekolandin. Derbirina helbestvan a di derbarê xweza û hêmanên xwezayê de hatiye nîqaş kirin. Gelek hêmanên xwezayê wekî bêhn û rengê kulîlkan, şewqa stêrkan, deng û rengê ajalan ku di piraniya helbestên klasîk de tîrê dîtin bi rengê pirhêl di dîwana Melayê Cizîrî de xuya dikin.

Ev xebat hewladana bi çavên helbestvanê klasîk xweza bê watedarkirin her wiha li ser nîrxandin û şîrovekirina du hêmanan ‘nebat û heywanan’ hatiye avakirin. Armanca vê xebatê analîzkirina hûnandina xwezayê ya di cîhana helbestvan de ye. Her wiha malikên dîwanê ku bûne mijara lêkolînê ji pirtûka Selman Dîlovan ya bi navê “Dîwana Melayê Cizîrî” ku di sala 2013an de li Stenbolê ji weşanên Nûbiharê derketiye hatine wergirtin. Her wiha ji bo têgihîştina hêsan, çavkaniyên rûpelan li kêleka malikan di nava kevanekan de hatine nîşandan.

¹ İskender Pala; *Ansiklopedik Dîwan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2005. s. 136.

Mijar, Sinor, Armanc û Rê û Rêbaza Xebatê:

Di vê beşê de di derbarê lêkolînê de agahîyên bingeîn hatine dayîn û ji hêmanên xwezayê ajal û nebat hatine lêkolandin. Armanc ew e ku di dîwana Melayê Cizîrî de ajal û nebatên ku derbas dibin werin ravekirin û têkiliya edebî ya bi van hêmanan re were tespît û analîzkirin.

Berîya ku em behsa nebat û ajalên ku di dîwana Melayê Cizîrî de derbas dibin bikin, di derbarê mijar, sînor, armanc û rê û rêbazê lêkolînê de agahî hatine dayîn û behsa jiyana, berhem û kesayeta helbestvan hatiye kirin.

Mijara Xebatê û Sînorên Wê:

Xweza avahiyeke zindî ye ku em tê de dijîn. Dema ku em di vê avahiyê de dijîn em di bin bandora xwezayê de dimînin an em bandorê li xwezayê dikin û xweza jî di bin bandora me de dimîne. Xwezaya ku berîya mirovahiyê jî hebû bi hebûna mirovahiyê re wate girtiye. Xwezaya ku em tê de dijîn ji aliyê derûnî, bedenî û giyanî ve bandorê li mirovan dike û ji aliyekî din ve jî mirovan xwedî dike. Helbestvan jî, ji hêla giyanî û derûnî ve di bin hêmanên xwezayê de mane û di encamê de berhemên bêhempa afirandine. Xwezaya ku berîya mirovahiyê hebû bandoreke çawa li mirovan kiriye? Tesîreke xwezayê çawa li ser hêmanên edebî çêbûye? Ev mijara sereke ye ku em ê pê re mijûl bibin.

Di xebata meya xweza navendî de, xweza bi piranî hatiye nîqaş kirin û dûv re bê bi çî awayî di helbestan de cih girtiye hatiye vekolîn. Mijara sereke ya xebata me xweza ye û lêkolîna me bi ajal û nebatên ku di helbestên Melayê Cizîrî de derbas dibin hatiye sînordar kirin.

Armanca Xebatê:

Armanca me ya sereke ew e ku em eşkere bikin bê ka unsurên xwezayê çawa di jiyana helbestvanê navborî de cih girtine û tesîreka çawa dane helbestên wî. Armanca vê xebatê ew e ku helbestên Melayê Cizîrî ên ku tê de bi taybetî bi bikaranîna hunera teşbîhê behsa bedewiyên xwezayê, kulîlk û ajalên xwezayê hatine kirin li hev kom kirin û îmaj û motifên ku hatine xeyal kirin tespît û analîz kirine. Hêjayî gotinê ye ku zanyarîya helbestvan a di cîhana kulîlkan de û eleqeya wî ya bi

alema ajalan re, bûye sedem ku ev hêmanên xwezayê bi awayekî hûnermendane di helbestên wî de cih girtine. Di lêkolînê de nimûneyên kulîlkên ku hatine bikaranîn, gengaze ku mirov di helbesta klasîk a kurdî de jî mînakên wan bibîne. Armanceke din a vê xebatê jî ew e ku di dîwana Mela de bê kulîlk ji kîjan alî ve hatine bikaranîn tesbîtkirin e û di vê çarçoveyê de berbiçavkirina dewlemendiya helbesta klasîk a kurdî derxistana hole ye. Her wiha di vê xebatê de ajal û nebatên ku di helbestên Melayê Cizîrî de derbas dibin nirxandin û ravekirin hatiye armanc girtin.

Rê û Rêbazên Xebatê:

Lêkolîna me bi raçavkirina lêkolînên li ser têgiha xweza û hêmanên xwezayê dest pê kiriye. Dema ku me mijara sereke xweza û hêmanên xwezayê vedikola ji aliyê din ve me di helbestên Melayê Cizîrî de ji hêmanên xwezayê ajal û nebatên ku hatine bikar anîn tespît dikirin. Ji bo ku di helbestan de em hêmanên xwezayê destnîşan bikin, me ji pirtûkên ku di vê mijarê de hatine amadekirin tez, gotar, kovar û ji weşanên cihêreng sûd wergirt.

Di xebatê de pêşî me xweza û edebiyata klasîk bi tevahî niqaş kir, paşê tesîra ku xwezayê daye helbestan me vekoland. Mijara sereke ya xebata me xweza ye. Lêkolîn bi helbestên Melayê Cizîrî ên ku di derbarê ajal û nebatan de ne hatiye sinordar kirin.

1. JIYAN, KESAYET û HELBESTVANIYA MELAYÊ CIZÎRÎ

1.1. Jiyana Melayê Cizîrî

Navê wî yê dirêj Ehmedê Kurê Mele Muhammed el-Botî el-Cizîrî ye. Di nava gel de bi nasnavê xwe yê binavûdeng hatiye naskirin. Mela li Cizîra Botan hatiye dinê. Botan navê eşîreke kurd a malmezîna e ku bi hezar salane li Cizîr û derdora Cizîrê bicih bûye. Mela jî mensûbê vê eşîrê ye û her wiha ji malbata Ensarîyan a navdayî ye. Navê Cizîrê yê herî kevin "Kardu Gazarta" ye, ku kardu kevintirîn forma nivîskî ya peyva kurd e. Kardu Gazarta tê wateye "Rahîptîya Kardu" ku kardu forma peyva kurd a îroyîn e. Her wiha Pers û Ereban ji vî bajarî re navên Gazarta û Bazîbda gotine, ji ber ku di serdema Ebasiyan de mîrê bajêr Omer bû ji bajêr re Cizîra Ibn Omer hatiye gotin. "Navê wî Şêx Ehmed e. Nasnavê wî yê meşhûr Melayê Cizîrî ye û bi Cizîra Ibn „Umer a ser qeraxê çemê Dîcleyê ku nêzî çiyayê Cûdî ye û bi navê Cizîra Botan tê naskirin, hatiye dunyayê."²

Ji ber ku hemû lêkolînerên Dîroka Edebiyata Kurdî nizanin ku Mela di hin malikên dîwanê de bi remz û razan amaje bi dîroka jidayikbûn û serdema xwe dike lewra serdem, jidayikbûn û wefata Cizîrî di nav wan de bûye mijara nîqaşê û di vê mijarê de nêrînên cûda derketine holê. Her wiha rewş gihiştîye wê astê ku hin lêkolîneran îdea kirine ku Cizîrî di sedsala 6an a hîcrî yê de jiyaye. Beravajî vê yekê hinekan gotiye ku Mela di sedsala 10an de jiyaye. Ji ber ku Cizîrî di helbestên xwe de qala şahsiyetên heta dawîya sedsala 15an dike eşkere ye ku Mela piştî sedsala 15an hatiye dine lewra îdayên ku Cizîrî berî sedsala 15an jiyabe bêbingeh dibin. Her wiha Şerefxanê Bitlîsî, Şehname di sala 1596an de nivîsiye lê qala şahsiyetekî wekî Cizîrî girîng nekiriye lewra îdaya ku Mela di sedsala 15an de jiyabe jî bêbingeh dibe. Lê dîrok û agahiyên herî bi ewle ku nezîkî rastiyêne dîwana Cizîrî bi xwe ye. Ji ber ku di serdema Melayê Cizîrî de helbestvanan bi hesabê ebcedê di malikên xwe de hin dîrokên girîng nîşe digirtin û Mela jî di bikaranîna hunerên edebî û rewanbêjîyê de mehareta wî eşkere ye, û ji listina peyv û îbareyan pir hez dikir lewra wek ku edeta

² Mela Ehmedê Zivingî; *Gerdeniya Gewherî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Cilt 1, Ç. Yekem, Wêş. Awesta, Stembol, 2013, r. 7.

wî ye agahî û tehlîlên di der barê jiyana xwe de ji hesasiyeta kesên rewşenbîr re hiştiye.

Mela munasîb dîtiye ku dîroka ku giyanê wî yê azad ketiye qalibê laşê wî yê mirî di helbesteke xwe de nîşan bide. Li gor felsefeya wî ev dîrok destpêka bêbextiya wî ye. Mela di qesîdeya ewil ya dîwanê de wisa dibêje:

Şevê zulmat û deryayê ji mewcan qet xeber nayê
Şikestî keştiya bayê 'ecacê wê şefeq dayê
Ji herfan mah û salê ma nehat der şiklê falê ma
Kuca danendi halê ma sibikbaranê sahilha (Dilovan, 2013:14)

Ez mîna mirovekî ku di şeveke tarî de li ser keştiyekê dinav pêlên dirinde ên behrê de li ber bayê biçim. Paşê sitûnên keştiyê dişkin û bi pêlan re têdikoşim û keştî ber bi binavbûnê ve diçe. Di vê şeva reş tarî de ji ber bahoza xedar tu hêvîya rizgariyê tune ye. Ji bo ku ez di vê kêliya krîtîk de fêrî sirên veşartî yên van rojan bibim, min xwest bi rêzkirina hin tîp û jimareyan fêrî tîpên ku meh û sala jidayikbûna min nîşan didin bibim. Loma min li fala xwe nêrî. Lê di vê falê de ji xeynî tîpên ku wêranî û bêdbextiya min nîşan didin tiştek xuya nedikir. Ji ber vê yekê, yên ku li qeraxa behrê di nav aramî û ewlehiyê de dijîn, çawa dikarin rastiya vê rewşa min a bîazar bizanîbin?

Her wiha kesên ku bixwazin di şeva tarî de di nav pêlên deryayê de tîpên ku helak û bedbextiya Melê nîşan didin hîn bibin dibe tîpên ku bi eşkereyî di vê helbestê de derbas dibin li gorî hesabê ebcedê binirxînin û berhev bikin.

حرفا = 289

ماه = 46

وسال = 97

ما = 41

شكل = 350

فال = 111

م = 41

Tevde = 975

elif ا	1	Ha ح	8	sin س	60	te ت	400
be ب	2	Tı ط	9	`ayn ع	70	peltek se ث	500
cim ج	3	yâ ي	10	fe ف	80	Hı خ	600
dal د	4	kef ك	20	Sad ص	90	zel ذ	700
he ه	5	lâm ل	30	kaf ق	100	Dad ض	800
vav و	6	mim م	40	ra ر	200	Zı ظ	900
ze ز	7	nun ن	50	şın ش	300	ğayn غ	1000

Wekî ku tê dîtin peyvên ku di helbestê de derbas dibin li gorî hesabê ebcedê tevahiya wan 975 e. Ev sal li gorî salnameya hîcrê ye û bi selnameya Mîladî ev beranberî sala 1565, 1568an e ku dîroka jidayîkbûna Cizîrî ye. Her wiha em di dîwana Cizîrî de dibînin ku qala Hafîzê Şîrazî û Camî hatiye kirin lewra ev yek ji me re dibe delîl ku Cizîrî piştî van kesayetên jiyaye.

Mela Ehmedê Zivingî radigihîne ku Cizîrî piştî sedsala 15an jidayîkbûye û di sala 1640an çûye ser dilovaniya xwe. Her wiha lêkolînerê edebiyata kurdî Marûf Xeznedar jî dibêje; Mela di navbera salên 1567 heta 1640î de jiyaye.³

Ji ber ku tarîxa jidayîkbûna wî bi hesabê Ebcedê kifş bûye, xuya dike ku ew di sedsala şazdehem û hevdehem (1567-1640) de jiyaye.⁴

Helbestvanê navdar Feqiyê Teyran ku hevpeyvîn bi Melê re kiriye ji bo wefata dostê xwe mersîyeya navdar ku bi peyva ‘îro werin...’dest pê dike heger ku bi rastî Feqî nivîsandibe wê demê wefata Melê Hîcrî 1050 e û bi Mîladî 1640-1641 e. Her wekî ku di çarîneke Feqiyê Teyran de jî xuya dike ew î ev mersiye di sala 1050 a hîcrî de nivîsiye.

Birîndarê îşqê me, dûr im ji siha bihan
Dizanim meddahê kê me di hezar û yek û sihan
Senaxanê Melê me li hemû erd û cihan (Sadî, 2014:201)

Li gorî agahiyên devkî Cizîrî 75 salan jîyaye ev yek jî vê îdeyê palpişt dike ku ew î di sala 1640an de wefat kiriye. Cizîrî hemdemê Xanşeref e, dema ku diçe ser dilovaniya xwe ew di qubeya başurde de ku bêşek ji Medreseya Sor e tê defînkirin, ku Mela bi salan li vê medreseyê dersdarî kiribû. Endamên malbata Mîr Şeref jî di

³ Marûf Xeznedar; *Mêjûyî Edebî Kurdî*, C. Sêyem, Weş. Aras, Hewlêr, 2001, r. 289-290.

⁴ Abdurrahman Adak; *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, Stenbol, 2014, r. 215.

heman goristanê de hatine definkirin. Li gorî ku em zanin, , mamosteyê wî yê yekem bavê wî ye û her wiha li gelek bajarên wekî Cizîr, Colemêrg, Heskîf û Diyarbekirê feqetî kiriye û di temenê 32an de li gundê Strabasê yê bi ser bajarê Diyarbekirê ve ji Seydayê Mela Taha destûra melatîyê girtiye û paşê li gundekî Diyarbekirê yê bi navê Sirba demeke dirêj melatî kiriye. Piştî Diyarbekir demekê li Heskîfê jî Melatî kiriye û ji wir veqetî cihê jidayikbûna xwe û heta dawîya emrê xwe li wir jiyaye. Li gorî ku tê rîwayetkirin Mela qet nezewiciye. Li gorî ku Mela Mehmûdê Bazîdî radigihîne Cizîrî dildarê xwîşka mîrê Cizîrê ye û hinek jî îdea dîkin ku dildarê Selma xatûn e ku qîza Melik Kamilê Heskîfê ye.

Mele Ehmed di helbestên xwe de du mehles bikar anîne Mela û Nîşanî. Li gorî kevneşopîya kurdan Mela tê wateya zana yan jî alimên olî yê ku îcazeta zanistên olî distîne û bi taybetî di warê zanistên îslamî de mamostetî û perwerdekirina xwendekaran dike. Ji bilî mehlesê Melê, Mele Ehmed di hin helbestên xwe de mehlesê Nîşanî jî bikar tîne.

Qesdê Serçeşmeyê heywanê heqîqet ke Nîşanî
Bi cihanê mebe Mexrûr ku cihan eynê serab e (Dilovan, 2013:526)

1.2. Cihê Wî di Edebiyata Kurdî de

Cizîrî, di edebiyata kurdîya klasîk de wekî mirovê hêrî navdar tê qebûl kirin û di qada edebî de neteweya kurd temsîl dike. Di nava kurdan de cara ewil dîwaneke bipergal a li gorî pîvanên edebiyata rojhilatê ji hêla Cizîrî ve hatiye nivîsandin û ev dîwan di nava hemû edebîyata rojhilatê navîn de xwedî cihekî girîng e. Helbestên ku di dîwana Cizîrî de cih digrin bi eşq û coş hatine nivîsandin. Mela helbestvanekî mezin e ku di helbestên xwe de coş û kelecane dide xwendekaran. Cizîrî hestên xwe di nava malikan de bi şêwazeke pir hunermendane, balkeş û bi heybet tîne ziman. Her çendî ji bilî dîwanê hin berhemên din ên Cizîrî wekî Ellah Sehergahê Ezel, Menzûmeya Gotûbêja Melayê Cizîrî û Mîr Imadedîn, Gotûbêja Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran hebin jî lê berhema herî binirx dîwan e.

Her wekî ku ew bi xwe di malîkekê de dibêje ku ‘ez çira şevê tarî me’ her wiha ew ji helbestvanên kurd re bûye çira û rîya helbest û hunerê nîşanî wan daye ku gelek helbestvanên kurd di bin bandora wî de mane û bûne şopgirê çiraya wî.

Mele Ehmed ji bilî nasnavên Nîşanî û Melê di nav gel de bi hin navên din jî tê naskirin ku ev nav ji aliyê gel ve li Cizîrî hatine kirin. Ji ber ku pêûsa Melê pir xurt bû û mirovekî pir hêja, bîrewer û hunermend bû di nav gel de ji bo dayîna pesnê wî jê re Reys El Şûara (Pêşengê Şaîran) û Pîrê Eşqê hatiye gotin.

Di helbestê de mirovê ku xweştirîn evînê bilêv dike Melayê Cizîrî ye. Cizîrî di malikeke xwe de vê yêkê wisa rave dike: Kesê ku pisporê evîneye û di deryaya evînê de bi hemû razên evînê dizane Melayê Botî ye. Tu mirov nikare di vê deryaya tijî raz de avjêniyê bi min re bike. Bi hemû kilît û razên evînê ez dizanin mifteyan wan li gel min in. Bi van qulf û razan sed Mela û sed alîkarên Melayan nizanin, bi van razan tenê ez dizanim. Malika resên wiha ye:

Tu j' Melayî her bipirs esrarê eşqê hel dikit
Vê mu' emmayê çi zanîn sed mela û muste'îd (Dilovan, 2013:88)

Evîna ku Cizîrî di malikên xwe de behsê dike û Sînema ku di helbestan de hatiye şayesandin wekî ku tê îdea kirin ne xuşka Mîrê Botan "Sitiya bisk kesk" û ne jî keça Mîrê Heskîfê "Selma" ye. "Ew perîruxsera ku Mela behsê dike walagewherek e, ji alemeke din e, lê ji bo ku em têbigihin, di lîbasê cism û can de xuya dike."⁵ Ji xeynî evînê her malikeke dîwanê bi serê xwe jêderka bîrewerî û hunerê ye. Mela di Dîwanê de ji dîrokê heta felsefeyê, ji hovîtiya Tîmûr û Cengîz heta bîrdoziya Sokrates, ji stêrnasiyê heta tevgerên dinyayê li ser gelek mijaran helbest nivîsandin e.

Cizîrî di nav edîp û şaîrên rojhilata navîn de bi nasnavê Pêşengê Şaîran tê naskirin û pesnê hunera wî bi vî nasnavî tê dayîn. Her wiha ev nasnav bêsedem ji bo Cizîrî nehatiye gotin. Em karin bêjin ku ji dewra Cizîrî heta niha tevahiya şaîr û nûserên kurdan di bin bandora Cizîrî de mane. Feqiyê Teyran, Xanî û Cegerxwîn hin ji van keseyetên binavûdeng in ku tesîreke xurt a Melê li ser hunera wan çêbûye.

Mela di wêjeya kurdî de helbestvanê ewile ku di bin sitara serwerekî de dîwaneke birêkûpêk nivîsandiye. "Li gor çavkaniyên berdest peywendiyên patronajê di edebiyata kurdî de cara pêşî di mînakê Melayê Cizîrî (1567-1640) û mîrên Cizîra Botan de tê dîtin."⁶ Ev pergal pêşîya Kurdan li gel Ecem û Ereban hebûye ku serwer

⁵ Selman Dilovan; *Dîwana Melayê Cizîrî*, Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 10.

⁶ Zülküf Ergün; "Peywendiya Mîr û Mela di Çarçoveya Patronaja Edebî de", *Mukaddime*, Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, Özel Sayı 1, Mêrdîn, 2017, r. 154.

ji hêla aborî ve piştgiriye dide helbestvan, ji bo ku hunera xwe karibe pêk bîne. Cizîrî jî di bin sitara Mîrê Botan de jiyaye û bi piştgiriya Mîr dîwana xwe amade û pêşkeş kiriye.

Dîwana Melê ji bo edebiyata kurdî gencîneyeke bêhempa ye. Mela di helbestên xwe de ji bilî zimanê kurdî zimanê erebî û farisî jî bikar aniye û her wiha çend peyvên tirkî hatine bikar anîn. “Guman tuneke ku yek ji unsurên sereke û hevpar ê tevahiya edebiyatên rojhilatê zimanê farisî ye.”⁷ Tevî vê yekê dîwan bi zimanekî dewlemend û wêneyî hatiye nivîsandin. Di helbestan de gelek gotinên pêşyan û biwêjên kurdî hatine gotin. Di dîwanê de gelek peyv derbas dibin ku piraniya wan peyvan yê zimanê kurdî ne. Dîwana Mela ji 140 helbestan pêk tê ku piraniya wan xezal in. Melê xezalên rindane, şûxane, hekîmane û yên sofîyane nivîsandine. “Melayê Cizîrî, di edebiyata kurdî de nûnerê terza xezalê ye. Divana wî bi gelemperî ji xezalan pêk tê.”⁸ Cizîrî bi rêbaza xwe di bin tesîra Şîrazî de maye ku ev yek di dîwanê de bi awayekî eşkere xuya dike.

Cizîrî, helbesvanekî mutesewif e û di wêneya kurdî de nûnerê rêbaza tesewîfê ye. Mela di derbarê derwêşxanê de helbest nenivîsandine, bêguman ew ne nûnerê edebiyata derwêşxanê ye. “Di dîwana wî de di derheqê tekyayê û pîrê tekyayê de helbest peyda nabin.”⁹ Tesewîfa Cizîrî, di nava xwe de felsefe yê di hewîn e. Ev felsefe di helbestên wî de bi du ewayan xuya dike baweriya ‘wehdetu’l-Mutlaq û evîna îlahî ne ku mîna evîra rastî jî tê binavkirin. Ji xeynî tesewuf û helbestkariyê, Mela zanyarekî olî bû, alimekî ku heya wî jî stêrnasî û gelek zanistên din jî hebû. Di zanistên Quranê û teswîrên de mîrovekî serwest bû. Cizîrî helbebestvanekî behremdar, zanyarekî mezin û rewşenbîrekî heyamê xwe bû. Di helbestê de gihiştîye asteke ku bibêje: Heger hûn bixwazin di nezmê de încîyê ku di ta de derbas bûne bibînin, werin helbestên Mela bixwînin hewce nake hûn herin Şîrazê. An ku Hafîzê Şîrazî ji xwe piçûktir dîtiye û di hunerê de xwe ji Şîrazî mezintir hesibandiye.

Ger lu'lu'ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şîrê Melê bîn te bi Şîrazê çî hacet (Dilovan, 2013:51)

⁷ Hayrullah Acar; “Di Edebiyata Kurdiya Klasîk de Farisnûsî: Nîmûneya Weda’î”, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi, Hejmar 1 (15), 2016, r. 299

⁸ Adak; *Destpêka Edebiyata Kurdî*, r. 231.

⁹ Adak; *Destpêka Edebiyata Kurdî*, r. 231.

Her wiha Cizîrî ji bo xwendina helbestên xwe bang li gelê kurd kiriye da ku helbestên wî yên bêhempa bixwînin. Heya Cizîrî jê hebû ku ew cewherekî bêhempa ye lê ew li cihekî ku qedrê cewheran lê nayê zanîn, wî zanibû ku ew di şevê reş û tarî de ronahî û çiraya miletê xwe ye.

Gulî baxê iremî Bihtan im
Şebçiraxî şebî Kurdistan im (Dilovan, 2013:273)

1.3. Dîwana Melayê Cizîrî

Di edebiyata klasîk a kurdî de kesê herî navdar Cizîrî ye lewra dîwana wî di nav gel de gelekî belav bûye û gelek helbestên wî hatine beste kirin û ji muzîka kurdî re bûne îlham û çavkanî. “Dîwana Melayê Cizîrî ji aliyê Belavbûna di nav kurdan de di pileya yekem de ye.”¹⁰ Her wiha ev berhema binirx bala gelek zanyar û lêkolîneran kişandiye lewra çap û wergerên dîwanê zêdene û gelek tez û gotar li ser hatine nivîsandin. Xuya ye ku di wêjeya kurdî de herî zêde xebatên akademîk li ser dîwana Cizîrî û Mem û Zîna Xanî hatine kirin. Destxetên dîwana Melê pir berbelav in hin ji wan di destê kesan de ne û her wekî din li gelek pirtûkxaneyên cihanê hatine dîtin û parastin. Bajarên ku dîwana Melê li wan peyde dibe ev in: Paytexta Ermenîstanê Erîvan, Marburga Elmanya, Bodileiana Bîrîtanya û li pirtûkxaneyên Enqera û Stenbolê tîsitar kirin Destxeta herî kevin ku hatiye tespît kirin ya Teyyar Paşa ye. “Destnivîsa herî kevin jî ya mîrê Amêdiyê, Teyyar Paşa ye ku di sala 1815an de hatiye istinsaxkirin.”¹¹ Her wiha destxetêke din a kevin ya rojhilatnasê Elman Martîn Hartman e ku di sala 1904an de li Berlîna paytexta Elmanya bi pêşgotîneke elmanî hatiye çapkirin.

Dîwana Cizîrî ji hêla gelek weşanxaneyan ve bi gelek çapan hatiye weşandin û bi qasî 16, 17 kesên helbestvan û lêkolîner şerha dîwana Cizîrî kirine.

Cizîrî di bin tesîra Hafîz de maye lewra dîwana wî jî her wekî ya Hafîz bi helbesta “Ela ya Eyuhel Saqî” dest pê dike. Dîwana Melê ji ber ku yekem dîwana bipergal e ji bo edebiyata kurdî gelekî binirx û bêhempa ye. “Yekem car Melayê Cizîrî di nava kurdan de dîwaneke mureteb li gorî kirîterên edebiyata rojhilatê û bi

¹⁰ Adak; *Destpêka Edebiyata Kurdî*, r. 223.

¹¹ Adak; *Destpêka Edebiyata Kurdî*, r. 233.

taybet a Îranê, nivîsandiye.¹² Lewra di edebiyata kurdî de di nav hemû zaravayan de dîwana bipergal ku gihiştiye destên me ya Cizîrî ye. Heta niha dîwaneke ji ya Melê kevintir nehatiye dîtin.

Dîwana Melayê Cizîrî ji aliyê wêje û hunerê ve di nav wêjeya kurdî de di asteke bêhempa û di dereceyeke bilind de ye. Ji bo kesên ereb Ebû Tayyîb el-Mûtenebbî û ji bo Eceman Hafîz, her çiqas hêja bin, ji bo kurdan jî Cizîrî keseyetekî ewqasî hêja û qedirbilind e.

1.4. Hin Şerhên Dîwanê

Dîwana Cizîrî di edebiyata kurdiya klasîk de berhema sereke ye, lewra ev berhem gelekî berbelav e. Ji ber vê yekê ji aliye gelek alim û akademîsyenan ve bûye mijara lêkolînan û heta niha lêkolînên herî zêde wekî tez, gotar, şerh û hwd. li ser dîwana Melê hatine nivîsandin. “Dîwana Melayê Cizîrî yek ji şaheserên edebîyata kurdî yaklasîk e û di medreseyan de hatiye xwendin. Ji ber vê yekê gelek alim û edîbên kurdan li ser Dîwana Melayê Cizîrî şerh nivîsine.”¹³ Her wiha ji ber ku têgihîştina hunera Cizîrî zor û zehmete ji bo têgihîştina dîwana wî şerh xwedî cihekî girîng in. Heta niha gelek kesan an li ser çend helbestên bijartî an jî dîwan bi giştî şerh kirine. Li jerê em dê qala çend şerhên ku bi me girîng in bikin.

Şerha Mela Abdusselamê Cizîrî (1878-1952): Ev şerh di sala 2004an de li Hewlêrê hatiye çapkirin. Tehsîn Îbrahîm Doskî sererastkirina vê şerhê kiriye û Jan Dost jî ji zimanê erebî vergerandiye bi kurdî. Ev şerh li bakur di avrêla 2018an de ji wêşanên Dara hatiye weşandin. Di vê şerhê de dîwan bi destxetên li ber dest û nusxeyên çapkirî yên din re hatiye berawirdkirin û cihên gelemşeyî hatine nîşan kirin. Wateyên malikan li gorî van gelemşeyan hatine şîrove kirin. Mela Ebdusselam şerha hinek malikan nekiriye lê belê gelekî girîngî daye wateye ferhengî ya peyvan. “Her wiha tahrîca ayet û hedîsên ku di şerhê de derbas dibin hatiye kirin.”¹⁴ Şêwaza wî hinekî qels e, lewra mirov di hin cihan de baş jê fêhm nake. Li gor destxetên ku

¹² Morad Berouki Milan; *Hemanên Îranî Yên Dîrokî û Mîtolojîk di Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Dîwana Melayê Cizîrî de*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019, r. 19-20.

¹³ Tahsin İbrahim Doski; “Mele Ebdirrehîmê Westanî û Şerha wî li ser Dîwana Melayê Cizîrî”, *Kurdîyat, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* hej.7, Van, 2023, r. 59.

¹⁴ Abdalbaki Turan; *Melayê Cizîrî divanî ve şerhi*, Nûbihar, Stenbol, 2010, r. 38.

agahiya wî ji wan heye ravekirinên malikan kirine her wiha nerînên xwe jî lê zêde kirine. Ew dibêje ku di hin malikan de ji ber mustensihan hin tehrîf hatine kirin.

Mele Ebdusselam di şerha xwe de helbestên farisî û carinan jî yên erebî îstîşad dike, ji ber ku ew malik ji hêla wateyê ve gelekê dişibin malikên Melayê Cizîrî. Ev malikên ku hatine îstîşad kirin bi gelemperî yên Hafîzê Şîrazî ne. Şerha Mela Ebdusselam ji hêla van îstîşadan ve girîng e, xwendekar derfetê dibîne ku Mela û helbestvanên din muqayese bike. Her wekî ku min di jêrenotan de jî destnîşan kiriye, min di vê xwebatê de ji vê şerhê gelekî sûd wergirt.

Şerha Mela Ehmedê Zivingî (1893-1971): Ev şerh bi zimanê erebî ji aliyê miftiyê Qamişlo ve hatiye kirin. Çapa yekem di sala 1959an li bajarê Qamişlo ji weşanxana el-Rafîdîn ve hatiye çapkirin. Ev şerh ji du cîldan pêk tê. Werger û amadekariya wê bi navê Gerdeniya Gewherî ji aliyê Emîn Narozi ve hatiye kirin û ji wêşanên Awesta hatiye weşandin. Her wekî ku Zivingî jî ev yek destnîşan kiriye, wî ji şerha Mela Ebdusselam gelekî sûd wergirtiye. Lê berevajî Mele Ebdusselam şêwe û vegotina zivingî gelekî bi hêz e. Hemû malikên dîwanê pir xweş û xweşik hatine şîrovekirin. Nivîskar ewil wataya ferhengî ya bêjeyan daye piştê şerh û şîroveya bi giştî kiriye. Wî di malikan de hem wateya zahîrî hem jî wateya tesewufî daye. Di vê şerhê de eşkere ye ku Zivingî di zimanê erebî, farisî û kurdî de serdest e, her wiha şîrovêyên wî kurt û maqul in, xwendekar bêzar nakin Zivingî di pêşgotina dîwanê de wisa dibêje: Min bi xwe cehd û xebata ji bo rastkirina gotinên xerabkirî û sererastkirina hevok û derbirînên tevlihevkirî û diyarkirina raz û dirûvan û kifşkirina destnîşanan li gor hêz û biriya xwe ya kêmtir tu kêmasî nexistiyê, lê digel vê jî doza berîbûna ji şaşî û kêmasiyan nakim çunkî mirov cihê petatî û şetatiyê, dûrbûna ji rastiye û wargeha gunehan e û xwedî mafê lêborîn û bexşînê ji hevcinsê xwe û ji Şahê mihrîvan e.”¹⁵ Her wekî ku ew jî vê yekê destnîşan dike bi min ev şerh bê qusur e.

Şerha Hejar (1920-1990): Helbestvan, zimanzan, nivîskar û wegerê kurd Ebdurehman Şerefkendî an ku bi nasnav Hejar, şerha dîwanê bi diyaleta soranî li bajarê Mahabadê kiriye.

¹⁵ Zivingî, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, r. II .

Şerha Ebdulbakî Turan (1937-2020): Akademîsyen, profesorê îlahyatê, nivîskar û wergêrê kurd Ebdulbakî Turan şerha dîwana Mela bi zimanê tirkî kiriye. Ev şerh di sala 2010an de ji weşanxaneya Nûbiharê derketiye. Şerha ku ji cîldek û çar bêşan pêk tê di bêşa yekem de di derbarê jiyan, dîwan, huner û ramanên Cizîrî de agahiyên berfireh hatine dayîn. Ev şerha ku ji cîldek û 800 rûpelî pêk tê bi şêweyeka akademîk hatiye nivîsandin. Mamoste Ebdulbakî ji wateya zahirî zahftir li ser wateya tesewufî sekiniye. Her wekî ku ew jî vê yekê diyar dike wî jî şerha Zivingî gelekî sûd wergirtiye. “Her wekî ku min di jêrenotan de jî bi giştî daye nîşandan, min ji şerha Zivingî gelekî sûd wergirt.”¹⁶

Şerha Seydayê Cegerxwîn (1903-1984): Helbestvan, nivîskar û dîrokzanê kurd Mela Şêxmuse Hesarî an ku bi nasnav Cegerxwîn şerha dîwana Melê bi zaravayê kurmançî kiriye lê bi qasî ku em zanîn ev şerh nehatiye çapkirin.

Şerha Abdumukit Septioğlu: Di vê şerhê de nivîskar şerha sih û sisê qasîdeyên ewil yê dîwanê bi zimanê tirkî û kurdî kiriye. Lê mixabin nivîskar beriya ku şerha qasîdeya sih û sisêyan bike wefat kiriye. Şerha ku ji 208 rûpelan pêk tê di sala 2005an de li Stenbolê ji wêşanên Nûbiharê derketiye. Nivîskar ewil wateyên ferhengî yê peyvane dane piştî şîrove kirine, xuya ye ku ji şerha Zivingî sûd hatiye wergirtin.

Di demên cuda û li heremên cuda gelek xebat li ser dîwana Melê hatine kirin, Tevî ku ev xebat belawela û netêkildar xuya dikin jî ev rewş bûye sedem ku dîwana Melê ji aliyê gelek ziman û çandên cîyawaz ve bê naskirin.

Heta niha bêşek an tevahiya dîwana Cizîrî bi zimanê Elmanî, Farisî, Erebî, Rûsî, Îngilîzî, Tirkî û zaravayê Soranî hatiye şîrovekirin an wergerandin.

¹⁶ Abdalbaki Turan; *Melayê Cizîrî dîwanî ve şerhi*, r. 58

2. NEBAT DÎ DÎWANA MELAYÊ CİZÎRÎ DE

Heyîna ku her dem xwe diguheze û her tiştî di nava xwe de dihevwîne xweza ye. An ku ew hêza ku li derveyî çalakiyên mirovan her tim xwe diafirîne û diguheze xweza ye. Helbestvanan hêmanên xwezayê çî di wateya rastîn de çî di wateya mecazî de her tim bi kar anîne. Helbestvanên serdema klasîk bi gelemperî wateyên mecazî li hêmanên xwezayê bar kirine. An ku bi wateyeke mecazî van hêmanan di helbestên wan de cih girtiye. Di vê beşê de em ê hewl bidin ku di helbestên Melayê Cizîrî de ji hêmanên xwezayê nebatan di bin beş û binbeşan de tespît û analîz bikin.

2.1. Kulîlk û Hêmanên bi Kulîlkan ve Têkildar

Di helbestên Melayê Cizîrî de hêmanên herî zêde hatine bikaranîn kulîlk in. Helbest bi kulîlk û cureyên kulîlkan hatine xemilandin. Her wiha yar weke kulîlkeke bedew hatiye şayesandin. Çawa ku kulîlk xwezayê dixemilînin bi heman rengî dilê helbestvanan jî xweş dikin û tesîrê li rihê wan dikin. Kulîlkên ku di helbestan de cih digirin ne pêkan e ku em behsa hemûyan bikin. Kulîlka ku herî zêde di helbestan de cih girtiye gul e. Nergiz, sosin, sunbul û yasemîn li pey gulê tên. Di nav van kulîlkan de yekemîn kulîlka ku em ê lêbikolin gul e.

2.1.1 Gul

Gula ku cureyekî hejika bi sitrî ye, bi bêhna xwe ya xweş û bi kulîlkên xwe yên bedew yên bi rengên ciyawaz, bi sedan salan bandor li mirovan kiriye û di hemû keltûran de her dem xwedî cihekî pir taybet û hîlbijartîye. “Gul di her cureyên evîne de evîndaran sembolîze dike. Bilbil jî nûnertiya kesê ku bi êşa evîndarîyê dişewite dike.”¹⁷

Gul li gel bi tena serêxwebûnê li gel stirî û bilbil jî hatiye bikaranîn. Mijara evîne ya ku yek ji mijararên helbesta klasîk e, evîna gul û bilbilê ye. “Gul bi bedewî û stiriyên xwe bi evîndarê ku êş dikişîne ve girêdayî ye.”¹⁸ Gul di edebiyata klasîk de wekî remza dîlberê tê hesibandin û evîndar jî, ji ber êşa dil û evîne wekî bilbil tê

¹⁷ Beşir Ayvazoğlu; *Güller Kitabı*, Kapı Yay. İstanbul, 2010, r. 92.

¹⁸ Pala; *Ansiklopedik Dîvan Şiiri Sözlüğü*, r. 182.

şayesandin. Her wiha yara evîndar jî dibe gul. Yar, hem bi bedewbûna xwe, hem bi rengê xwe dişibe gulê. Evîndar her dem hewl dide ku xwe bigihêne vê gulê. Stiriye gulê hevrikê evîndaran e. Ji bilî vê yekê gul û stirî berawirdkirina başî û xirabiyê, hêsanî û dijwarîyê, dostanî û dijminîyê nîşan dide.

Li gorî rîwayetan, gula ku di destpêkê de ne sor e, qet rû nedaye bilbil. Bilbilê ku li ber xemsariya gulê ranaweste, rojekê difre û tevî her tiştî li ser gulê datîne. Stirîyên ku di laşê bilbil re diçin û xwîna wî dirijînin. Ev xwîna ku ji bo gulê dirije ji koka wê heta rayên wê belav dibe û gul piştî wê rojê rengê sor digire. Tê bawerkirin ku gul xwîna bilbil dirijîne, vedixwe û weke sorgulê li ser eniya bilbil dixe. Gul guh nade dengê bilbil, nabişkive û rûyê xwe nîşanî bilbil nade. Her tim bi stirî re hevkarîyê dike û dilê bilbil birîndar dike.

Gul yek ji cureyên kulîlkane ku helbestvanan di helbestê de herî zêde bi kar anîye. Ji van helbestvanan yek jê jî Melayê Cizîrî ye ku di beytên xwe de teşeya gulê neqîşandiye. Di helbestên xwe de peyvên wekî şaxê gulê, bişko, xunceleb, bêhna gulê, gulav, gulberojê û gulîstanê bi kar anîye.

Gul yek ji wan kulîlkan e ku bi rûyê yarê ve tê şibandin. Di keltûra îslamê de, kulîlka ku cenabê Pêxember pê hatiye sembolîze kirin gul e. “Hz. Pêxember der barê gulê de wiha gotiye: Gula sor, nîşaneyê heybeta Xwedê ye.”¹⁹

Ger çi bilbil cewhêrê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji îşqa bulbul e (Dilovan, 2013:199)

Her çiqas rastî û heqîqeta bilbilî gul e ciwanî û şan û şerefa gulê ji ber evîndariya bilbil e. Ji ber ku gul yara bilbil e.

Di helbesta klasîk de gelek peyvên ku bi têgeha bilbilê re peyda dibin hene. Bilbil hem di edebiyata Rojhilat de hem jî di edebiyata cîhanê de xwedî cihekî girîng e. Tê pejirandin ku di navbera bilbil û gulê de têkiliyeke evînê ya xeyalî heye. Ji ber ku bilbil di demsala biharê de dema ku gul dipîşkivin bi dengê xweş dixulxul e.

Ev yek temsîla rewşa yar û evîndar dike. Mebest ji cewherê zatê gulê bedewiya yarê ye. Yanî eger ne ji eşqa evîndar be tu qedr û qîmetê bedewiya yarê tune ye. Sedema navdarî, şoxî û bedewiya dîlberê evîna dildarî ye.

¹⁹ Şehredâr b. Şîrûye Deylîmî, *el-Firdevs bi Me'sûri'l-Hitâb*, Cilt 1, Beyrut, 1986, r. 171.

Xunceleba ji rengê gulê, dêmê bi sir numa Melê
Şubhetê bulbulan seher, lew me fixan û nale kir (Dilovan, 2013:91)

Yara devpiçûk û teng weke guleke ter û teze ye. Rûyê wê yê ter û nazik mîna şaxegulekê ji Melê re xwe diyar kiriye ku tijî raz û şîranî ye. Lewra me jî da nalîn û fixanan wekî bilbilê berbangê.

Xubçe ji aliyê helbestvanên klasîk ve ji bo teswîra devê dîlberê hatiye bikaranîn. Ev peyva ku ji bo kulîlkên ku hêj venebûne tê bikaranîn, di edebiyata tesewufê de sembola tazebûn û ciwaniyê ye. Di vê malikê de Mela bi peyva “xuncelebê” devê yarê şibandîye gula ku hej venebûye û evîndar jî wekî bilbilê ku evîndarê gulê ye teswîr kiriye.

Dûrî kirin ji sunbûlan, çiçek bişko û gulan
Dil me ji rengê bulbulan, şubhetê daxî lale kir (Dilovan, 2013, 91)

Ez ji wê dîlbera devpiçûk û rûçiçek dîr kirim û dilê min wekî dilê bilbil agir pêxist û dax da. Bişko û xunce hemwate ne. Her du jî tên wateya gulên ku gulpik in û hêj venebûne. Bilbil jî sembola evîndar e. Ew di qefesa xwe de bi hesreta gulistanê maye lewra her bi feryad û fixan e.

Di vê malikê de ji hûnerên edebî îstîiareya vekirî û hunera tenasûpê heye. Bisk, kezî û dev û rûyên yarê bi çiçek, bişko û gul û dildar jî bi bilbil hatiye şibandin. Çiçek, bişko, gul û bilbil peyvên ji aliyê wateyê ve lihevhatî ne û ne nakok in. Lewra dema ev peyv di malikekê de bi hev re tên gotin hûnera tenasûbê pêk tê.

Mehbûb û reyhan pur gulav, ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav, lew saqî ew cullabî da (Dilovan, 2013:17)

Ew yara ku porên wê mîna reyhana tevî ava gulan e dil û hinavên min parçe parçe kir. Ji bo ku min bikuje wê gulava ku tevlî jehrê bûye da min. Ew bi ser ket û ez kuştim.

Gulav weke ku ji navê wê jî xuya ye ava gula ye. Cullab jî di heman wateyê de ye. “Cullab peyveke koka wê farisî ye hatiye erebîkirin, ji gulab hatiye, ew jî ava gulan a tev li şekir e.”²⁰ Gul di helbesta klasîk de bi bêhna xwe ya xweş û bi kulîlkên xwe yên bedew yên bi rengên ciyawaz bûye hêmana teşbîhê. Di vê malikê de her

²⁰ Zivingî; *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, r. 58.

wekî ku dixuye ji ber bêhnxweşîya gulê porên dîlberê bi ava gulan hatiye şibandin. Her wiha di rista duyem de jî jahra ku pêşkeşî helbetvan hatiye kirin ji ber ku bi destê yarê ye ew weke ava gulan hatiye dîtin.

Çîçek û gul sehergehan, nesterenên di xergehan
Tekî ji misk û mawerê, mahî xunav û jale kir (Dilovan, 2013:91)

Çîçek û gulan an ku bisk û temberiyên yarê sibehê xwisî bi ser rûyê yara rû heyv de barandin.

Wextê ku di hewayê de dûkêla avê zêde dibe xwisî dikeve. Dikare bê gotin ku ew bi gelemperî di şevên sayî de bi guherîna germahîya hewayê xwisî dikeve. Xwêdana ku bi ser rûyê yarê de bariye bi vê diyardeya xwezayê hatiye teswîrkirin. Mela di vê malikê de bisk û temberiyên yarê weke bexçê gulan pênasê kiriye. Mebest ji xwisî ava gulan e. An ku xwêdana yarê bi ava gulan wekî xwisî dikeve ser gulîstanê hatiye teswîrkirin.

Wek gula zer, di bexçeya te me ez
Tu me têkil xwe wek gula zer ke (Dilovan, 2013:198)

Ez mîna guleke zer im di gulîstana te de sedema zerbûna min ji ber jan û êşa ji dûrîya te ye.

Mela di vê malikê de gula zer ji ber rengê wê bi kar aniye. Ji ber ku kesên nexweş û êşkişandî rengê wan zer dibe. Lewra Mela rengê xwe yî zer bi gula zer şibandiye. Di vê malikê de hûnereke edebî heye ku taybetmandiyeke xwezayê ji bo mirovan hatiye veguhestin. Zerbûn taybetmendiyeke xwezayê ye ku zer dibe û diseride lê helbestvan ev yek ji bo mirovan veguhestiye.

2.1.2. Nêrgiz

Bêjeyên wekî narkoz, narkotîk û nergiz ji heman kokê tên. Nêrgiz di nava xwe de madeyeke narkotîk dihevine. Ji ber vê yekê jî li gorî helbesta klasîk, nergiz bîmar, efsûnî û sermest e. “Nêrgiz, kulîlkeke ji cureyê narcissus e, ku di navîn de ji

çembereke zer pêk tê û bi pelên spî hatiye dorpêçkirin.²¹ “Di civaka kulîlkan de, nergiz weke kesekî ku qedeha wî tu carî ji destên wî nakeve hatiye sêwirandin.”²²

Nêrgiz kulîlkeke bi eslê xwe mîtolojîk e. Li gorî efsaneyan, xortekî bi navê Narsîs, pir delal bû ku ji evînê fêhm nedikir û dilê bedewan dişikand. Bedewan gilihên vî xortî li ba xwedayan kir û ev yek bû sedem ku Narsîs were lanetkirin. Narsîs diçe ber avê û xwe di avê de dibîne û aşiqî xwe dibe, dikeve avê û dixeniqe. Piştî demekê laşê Narsîs dibe ax. Ji vê axê çiçekeke ku dişibe çavan peyda dibe. Ev kulîlk nêrgiz e. Nêrgiz bi dîmenê xwe dişibihe çav lewra helbestvan ji bo şibandina çavên yarê gelek caran serî li nergizê dide.²³ Di hin helbestan de nêrgiz bi nazikiya xwe jî derdikeve pêşberî me.

Nergiza naziqed û şehleya mest
Dîn kirim ez bulbulan sewda gul e (Dilovan, 2013:199)

Ew yara ku weke nêrgizan bejinbilind e hingê ku bi kibr dimeşe weke serxweşan dixuye. Ez weke bilbilan li ser xwe dîn kirime ji ber ku bilbil jî li ser gulan dîn û har in.

Nêrînên dîlberê nêrgizê bi bîr dixin. Lewra dema ew bi vî rengî li evîndar dinêre evîndar serxweş û dîn dibe. Ew dîlbera gerdengaz weke nêrgizê sermest û pozbilind bi meşa xwe yî hejîn û nêrînên xwe yî efsûnî ez dîn û har kirime. Ez her wekî bilbilê ku evîndarê gulê ye li ser vê dîlberê dîn û har im. Di vê malikê de Mela ji ber kibr û pozbilindiyê yar bi nêrgizê şibandiye û evîna xwe şibandiye evîna gul û bilbilê.

Nergiza mestî ji bala çîmena sunbul û gul tê
Qedehê taze bi destê xwe meşî da me lealeb (Dilovan, 2013:33)

Nêrgiza bejinbilind weke serxweşan ji nav gulîstanên tijî sunbul û gul tê. Qedeheke taze li dev ku tijî meya evînê bû pêşkeşî min kir.

²¹ Yasemin Yaylalı; “İbn Yemîn’in Gazellerinde Çiçekler, Ağaçlar ve Meyveler”, *İlahiyat Tetkikleri Dergisi*, Hej. 2, Erzurum, 2017, r. 282.

²² Beşir Ayvazoğlu; Güller Kitabı, “*Türk Çiçek Kültürü Üzerine Bir Deneme*”, Kapı Yayınları, İstanbul, 2008, r. 162.

²³ Pala; *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 369.

Di vê malikê de nêrgiz di dewsa yarê de hatiye gotin. An ku Mela yara xwe bi efsûn û sermestiyê weke nêrgizê pênase kiriye an ku şibandiyê nêrgizê. Çimkî di edebiyata klasîk de nêrgiz sembola sermestî û pozbilindiyê ye.

Ew dîlbera ku behsa wê hatiye kirin dîlbereke xweşik û nefsmezin e. Lewra ew weke nêrgizê hatiye şayeserkirin. Ji kerb û kedera ku dide evîndar bê xeber e. Çawa ku evîndar her wextî bi derd û cefa ye û ew her dem di agirê evînê de disoje. Lê ev yek jê re ne xem e.

Her wiha di vê malikê de di navbera nêrgiz, çîmen û gulê de elaqeyek heye. Lewra di vê malikê de hunera tenasubê heye.

Nêrgizên şengî dimestin çep û rast
Saqiyan camî didestin çep û rast (Dilovan, 2013: 43)

Ew ciwan û bedewên ku bejnên wan nazik û bilindin weke nêrgizan in. Ji ber bayê weke serxweşan çep û rast dihejin, saqî jî qedehên meyê li çep û rast digêrin. Ew xweşikên mîna nêrgizan jî weke meyger me serxweş û dîn dikin bi bedewî û nazikiya xwe.

Di helbestên klasîk de ji ber efsaneyê Narsîs ciwanekî pir delal û nefsmezin bû û ji evînê fêr nedikir û dilê bedewan dişikand nêrgiz zêde hatiye bikaranîn. Helbestvanan di helbestên xwe de nefsmezinê û pîfî esmanan kirinên dîlberan bi nêrgizê şayeser kirine. Di vê malikê de nêrgiz ji bo wesfê bejn û bala yarê bi bedewiya xwe aşiqan serxweş dike hatiye bikaranîn.

Wan dest û zend û sa'îdan, mey dane şeyx û zahidan
Mestê bi çêsmê şahidan, ew nêrgiza sirabi da (Dilovan, 2013:17)

Wan dest û zend û milên kubar meya evînê ya resen da me şêx û zahidan. Ya ku serxweşî û mexmûriya çavên bedewan jî dide. Nêrgiza ku bi teyîsîna nava avê hatiye xapîn bi xwe ye.

Di vê malikê de çav û bejna yarê bi nêrgizên taze hatiye şibandin. Tiştê ku serxweşî û mexmûriya çavên bedewan jî dide çavên evîndara min in ku dişibin nêrgizên taze ku di avê de hesidî bû bedewiya xwe. Bi gotineke din bedew, mexmûrî û taybetemendiyên çavên xwe yên efsûnê ji çavên dîlbera min ku dişibihe nêrgizê

distînin. Çavên dilberên din ji ber ku dişibin çavên dilbera min û çavên wê bibîr dixin xweşik in.

Bi qedê nêrgiza Bohtanî
Nazikek şeng şubih rîhanî (Dilovan, 2013:272)

Di cure nêrgiz hene yek jê nêrgiza deştê ye ya din jî nêrgiza çiyayî ye. Nêrgiza çiyayî bi reng, bêhn û şeweya xwe ji nêrgiza deştê xweşîktir û bêhnexweştir e. Ew di belt û rizdeyên çiya û di deverên bilind û asê de şîn tê.

Di vê malikê de mebest ji nêrgiza bohtan nêrgiza çiyayî ye ku ji nêrgiza deştê dirêjtir e û bêhna wê xweştir e. Mela ji bo bejna yarê pênase bike serî li nêrgiza çiyayî daye û bejna yarê pê şibandiye. An ku wî dîlbera xwe di nav bedewan de ji bedewan bedewtir hesibandiye.

2.1.3 Lale

Lale ji famîleyan gulan cureyekî nazik e. Piştî gulê di wêjeya klasîk de yek ji çiçekên herî nasyar e. “Bi şeweya xwe dişibihe qedeha şerabê, bi rengê xwe dişibihe hinarkên yarê, evîndarê dilşikestî, xwîn, fînd; ji ber cihê ku lê çêdibe, di çavkaniyan de wekî kesekî gundewar tê binavkirin.”²⁴ Lale ji yek şaxê tenê kulîlkekê dide. Ji ber ku ev kulîlk bi şewe û şitla xwe rast e, esalet û zerafetê temsîl dike. Kulîlk vebûna yek laleyê li ser yek şitlê helwesta wê ya karîzmatîk zêde dike. Bilêvkirina laleyê bi erebî bi tîpên tewhîdê dest pê dike. Ji ber vê yekê lale tewhîdê temsîl dike. Bi vê têgihiştinê lale ji aliyê ola îslamê ve pîroz hatiye dîtin û di nav bedewiyên ku Xweda afirandiye de xwedî cihekî taybet e. “Bi rastî pîvazoka laleyê ji ber ku her şitlek, kulîlkekê dide nîşana tewhîdê ye.”²⁵

Lale ji bo îfadekirina gelek hêmanên bedewiyê yên wekî hinark, rû, lêv, laş, dil û dilê yarê hatiye tercîhkirin. Ji ber vê naveroka dewlemend a wateya wê, ne tenê di helbestan de, di hêmanên mîmarî yên girîng û yên olî de jî hatiye bikaranîn. “Di

²⁴ Fatma Sabiha Kutlar ve Özge Öztekin; “Divan Şiirinde Çiçeklere Dair”, II. Uluslararası Gölbaşı Göller-Andezit ve Sevgi Çiçeği Festivali, Bizim Büro Basımevi, Ankara, 2006, r. 617.

²⁵ Necdet Sakaoğlu; “Lale”, Dünden Bugüne İstanbul Ansiklopedisi, Cilt 5, Tarih Vakfı Yayınları, İstanbul, 1994, r. 178.

avahîyên wekî mizgeft, kanî û tirbeyan de û di xemilandinên çînî de lale gelekî hatiye bikaranîn.’’²⁶

Mela jî ji vê kulilka bedew bêpar nemaye û bi awayekî herî edebî di helbesta xwe de cih daye laleyê û helbestên xwe pê xemilandine.

Bi werdan zeyyînin gulşen, çîmen da lale bişkiftin
Binefş û çiçekan vêkra, şefeq da yek di rewdê da (Dilovan, 2013:25)

Bexçe bi kulîlkan xemilîn û li gulşenan lale bişkivîn. Binefş û çiçek bi hev re geş bûn û teyîsîn û şewqa wan li hev vegehiya.

Gulîstan, gulzar û çîmen navê bexçeyên ku gul û kulîlk lê şîn tînin. Di helbesta klasîk de gulîstan ji bo sembola bedewiyên yarê tê bikaranîn. Serwî bejn û balê, xunce lêvan, binefş porê û lale jî hinarkên yarê temsîl dikin. Di vê malikê de bedewiyên yarê weke gulîstaneke tijî gul û kulîlkên şeng hatiye teswîrkirin. Mebest ji laleyê hinarkên sor ên rûyê yarê ne. Ji ber bedewî û sorahiya hinarkên yarê ew bi laleyê hatine sêwirandin.

Di vê malikê de ji hûnerên edebî tenasûp û îstîfareya vekirî hene. Mela rûye yarê, enî, zulf û xişlên wê bi gul û laleyan re daye teşbîhkirin.

Çîmena sultaniyê, yek laleyek baxê te bit
Gulşena xaqaniyê, xarek ji gulzarê te bî (Dilovan, 2013:222)

Bila Xwedê baxê sultaniyê bike tayek lale ji gulên bexçeyê te û bila gulşena xaqaniyê jî di gulîstana te de bike stiriye.

Kulîlk vebûna yek laleyê li ser yek şitlê bûye sedem ku ew di helbesta klasîk de bibe simbola tiştên yekane û bi tenê. Helbestan lavayî û başkurî ji Xwedê re kiriye ku baxê sultaniyê di gulîstana Mîr Şerefê Cizîrê de bibe yek tayê laleyê. Gulîstana hakaniyê jî di gulîstana wî de bibe stiriyeke kêmnirx û bêbiha. Di vê malikê de lale weke cureyekî ji kulîlkên gulîstanê bi simbola yekber û yekdayîya xwe hatiye bikaranîn.

Sunbul bi sema tînin û gulên perde dirandin
Bişkiftine alal û hêşîn bûne terazîn (Dilovan, 2013:154)

²⁶ Beşir Ayvazoğlu; *Güller Kitabı, Türk Çiçek Kültürü Üzerine Bir Deneme*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2008, r. 124.

Sunbul semayê dikin û gulên hêj nepîşkiftî vebûn. Her wisa gulên laleyan jî vebûne û ji aliyê rojava ve erd şîn bûye.

Lale û dar û kulîlkên din bi saya av, ax û derketina rojê mezin dibin û kulîlkan vedikin. Di vê malikê de helbestvan dîlbera xwe bi rojê şibandiye û vekirina dar, kulîlk û laleyan bi hatina yara xwe peywendar kiriye. Sunbul, gul û lale hatine temaşeya ciwanî û xweşikiya yarê lewra ew bi dîtina hûsn û cemala yarê gelekî kefxweş û bextewar in.

Xuya ye ku di vê malikê de ji hunerên edebî mînakeke xweşik a hûsnû talîlê heye. Dema ku bûyerek diyardeyek an jî rewşeke ku sedema wê tê zanîn; ev sedem û diyarde bi sedemeke xeyalî were ravekirin û watedarkirin hunera hûsnû talîlê pêk tê. Lale dema rojê dibînin ji xwe dipîşkifin lê Mela ev yek bi hatina yarê peywendar kiriye. Lewra ev hunera hûsnû talîlê pêk tîne. Her wiha Mela yar bi rojê şibandiye ku ev cûre kulîlk bi hatina wê bîşkifîne.

2.1.4 Sunbul

Yek ji metaforên helbesta klasîk ku pir tê bikaranîn sunbul e. Piştî gul û laleyê, kulîlka ku herî zêde di helbesta klasîk de tê dîtin sunbul e. Sunbul bi bêhna xweş, bi şeweya xwe yî tevlihev û xalîçeyî porê yarê pê hatiye şibandin. Sunbulên ku gelek caran di dîmenên biharê de tene dîtin, pir caran jî bi rengê xwe şaîran şibandiye êşa dil.²⁷ Mela jî di helbestên xwe de sunbul ji bo teswîra bêhn xweşiyê û teswîra porên yarê sunbul gelek caran bikar anîye.

Sunbulên ter li gulan pali bi mestî diderin
Sosinên taze li nîsrînwereqan bûne helek (Dilovan, 2013:139)

Sunbulên terhîn û nazik pala xwe bi serxweşî dane gulan, û pelên sosin û nesrînan jî xelek xelekî bûne.

Sunbul di edebiyata klasîk de cihekî girîng digire. Di gelek helbestan de bi bêhna xwe ya xweş û şeweya xwe yî pêldar û tevlihev wek hêmana teşbîhê hatiye bikaranîn. Helbestvanan porên pêldar ên dîlberan gelek caran şibandiye sunbulan. Di vê malikê de jî mebest ji sunbul û sosin û nesrînan porên yarê ne ku bi ser rûyê wê de

²⁷ Pala; *Ansiklopedik Dîvan Şiiri Sözlüğü*, r. 428.

hatine, mebest ji gulan jî rûyê yarê ye. Her wiha di navbera sunbul, gul, sosin û nesrînan de hevahengek heye lewra ev yek ji hunera tenasûbê re mîna keke bedew e.

Nêrgîza mestî ji bala çîmenasunbul û gul tê
Qedehê taze bi destê xwe tenê da me leba le (Dilovan, 2013:33)

Di edebiyata kurdî û farisî de sunbul gelek caran ji ber bedewî û bîhn xweşiya xwe hatiye pesinandin û gelek caran ji bo teswîra porên yarê hatiye bikaranîn. Di vê malikê de Mela bi tenasûbê porê yarê şibandiye sunbul. Yar jî ji ber bîxembûnê şibandiye nêrgîzê ji ber ku di edebiyata klasîk de nêrgîz pozbilindiyê temsîl dike. “Sunbul bi porê dilberê re eleqeder e. Kulîlkeke ku di edebiyata klasîk de pîrî caran tê tîdin. Bi şêwe û bêhna xwe dişibe porê dilberê.”²⁸

Sunbulan seywan li dêmê taze kir
Afitab îbo di Burca Sunbul e (Dilovan, 2013:199)

Kulîlka sunbulê sîya xwe da ser rûyê yarê û ew nixumand her wiha roj ketê birca sunbulê.

Di vê malikê de sunbul hem di wateya kulîlkê de hem jî di wateya bircê de hatiye bikaranîn. Sunbul yek ji bircên felekê ye ku meha tebaxê dest pê dike. Ji ber ku birca sunbulê demsala payîzê dest pê dike Mela dema ku rûyê yarê bi siya kulîlka sunbulê ve tê veşartin, şibandiye demsala payîzê. Ji ber ku rûyê yarê weke rojê hesibandiye. Mebest ji kulîlka sunbulê jî zulf û tenberiyên yarê ne dema ku zulf û tenberî bi ser rû de tene berdan û belawela dibin ew dikevin şiklê birca sunbulê.

Di vê malikê de diyardeyeke xwezayê bi sedemeke xeyalî hatiye peywendarkirin. Dema ku birca sunbulê serdeste demsal vediguherê payîzê. Her ku sedama vê diyardeyê tê zanîn jî ev rewş bi sedemeke xeyalî ve hatiye girêdan an ku hunera hûsnû talîlê hatiye kirin.

2.1.5 Nesrîn

Nesrîn kulîlkeke strîdar e. Kulîlkên wê weke gulên spî ne. Lê hinekî piçûktir in. “Nesrîn gula bejî ye, jê re gula tebaxê jî tê gotin.”²⁹ Nesrîn û gul di edebiyata klasîk de wek sifetên gep û rûyê yarê tene bikaranîn. Ji ber rengê sor her çiqas bi gep

²⁸ Pala; *Ansiklopedîk Dîvan Şiiri Sözlüğü*, r. 414.

²⁹ İsmail Parlatır; *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, Yargı Yayınevi, Ankara, 2016, r. 1285.

û rûyê yarê ve tekildar jî be gelek caran di edebiyata klasîk de bi rengê spîbûnê jî balê dikşîne. Di helbesta klasîk de nesrîn bi piranî ji ber reng, bêhn û nazikî yê ve tê nîrxandin. Nesrîn di dîwana Mela de di hin malikan de bi navê “nesteren” ku hemwateya nesrînê ye hatiye bikaranîn.

Nesrîn û binefş e tewwizandin
Mawerdi reşandî şûşeyê’ ac (Dilovan, 2013:65)

Ava gulan ji şûşeya ji dinanên filan reşand û pê zulf û rûyê xwe xemiland.

Rengê nesrînê bûye sedema ku di navbera rûyê dîlberê û nesrînê de têkilîyek çêbibe. Gul û nesrîn têgihên klasîk in ku ji bo rû û hinarkên dîlberê tene bikaranîn. Di vê malikê de jî ji ber sipîbûna rengê nesrînê rûyê yarê bi nesrînê û zûlfên wê jî bi binefşê hatine simbolîzekirin. An ku mebest ji nesrînê rûyê yarê ye.

Çîçek û gul sehergehan nesterenên di xergehan
Têkî ji misk û mawerê, mahî xunav û jale kir (Dilovan, 2013:91)

Nesrîn û gulên di bin rûpoşê de yanî bisk, temberî, hinark û rûyê yarê, hemûyan di berbangê de xwîşîya misk û gulavê bi ser rûye yara rûheyv de reşandin.

Wextê ku di hewayê de dûkêla avê zêde dibe xwîşî dikeve. Dikare bê gotin ku ew bi gelemperî di şevên sayî de bi guherîna germahîya hewayê xwîşî dikeve. Xwêdana ku bi ser rûyê yarê de bariye bi vê diyardeya xwezayê hatiye teswîrkirin. Mela di vê malikê de bisk û temberîyên yarê weke bexçê gulan pê nase kiriye. Mebest ji xwîşî ava gulan e. An ku xwêdana yarê bi ava gulan weke xwîşî dikeve ser gulîstanê hatiye teswîrkirin. Nesrîna ku yek ji kulîlkên vê gulîstanê ye bi kulîlkên xwe yên spî ji bo teswîrkirina rûheyvîya yarê hatiye bikaranîn.

Bi xalên werd û nesrînan, ji qudret xet kişandî lê
Bi terha nêrgiza ‘elî, sehergehan nesîm lê da (Dilovan, 2013:28)

Di vê malikê de di dewsa hinark û rûyê yarê de werd û nesrîn hatine bikaranîn. Mebest ji gul û nesrînan hinark û rûyê yarê ne. Ji ber ku nesrîn xwedî cureyên gulên sor û spî ye. Ev yek bûye sedem ku teswîra rû û hinarkên yarê bi vê kulîka bedew bê kirin.

Were canim ku çi nazik weres in
Ji gul û nesterînan em te bes (Dilovan, 2013:84)

Were giyana min ku tu guleke zêrîn û pir nazikî, di nav gulîstana gul û nesrînan de tu tenê besî min î.

Di helbestan de dîlber wekî kulîlkekê derdikeve pêşberî me. Ev kulîlk an gul e an jî nesrîne. Hêmana ku hem evîndar hem jî berevan daxwazkerê wê ye gul e. Di vê malikê de gul û nesrîn bi awayekî sembolîk di dewsa xweşik û bedewan de hatine bikaranîn. Mela bedewa ku behsê dike û evîndarê wê ye bi gulê û hemû bedewên din jî bi gul û nesrînan sembolîze kirine.

2.1.6 Sosin

Sosin yek ji kulîlkên ku di helbesta klasîk de gelek caran hatiye bijartin. Ji ber ku bi rengê xwe yê spî tê nasîn û di helbestan de ji hêla wateyê ve gelek hestan di hundirê xwe de dihevine. “Sosin bi gelemperî spîbûna pak û zelaliya hestên helbestvanan vedibêje.”³⁰ Kulîlka sosinê di helbesta klasîk de paqijî û evîne temsîl dike. Her wiha sosin di helbesta klasîk de sembola jinê ye. Sosin ji ber teşe, rengên cihêreng û bêhna xwe ya xweş bûye sedem ku mirov vê kulîlkê bi vî rengî şîrove bike. “Li gorî efsaneya di mîtolojiya Yewnanî de, sosin ji dilopên ku ji sînga Hera, jina Zeus, dema ku kurê xwe Hercules şîr dida çêbûye. Dibêjin Venusa ku di çanda Roma/Pagan de ji kefên behrê çêbûye, dema sosin dîtiye çavnebariya wê kiriye. Sosin di heman demê de weke sembola jinbûnê jî tê dîtin.”³¹ Sosin di helbestê de wekî sembola hêmanên bedewiya yarê jî hatiye bikaranîn. Mela di helbestên xwe de sosin ji bo pênasikirina zulf û porên yarê bikaraniye.

Lew seher cewlan didît, bayê sebayê rast û çep
Sosin û sunbul bi mestî, tîn semayê rast û çep (Dilovan, 2013:41)

Di vê malikê de Mela ev her du cure kulîlk sosin û sunbul ji bo wesfê porê yarê bi kar anîne. Ji ber ku sira bayê hênîk di seheran de ji aliyê çepê û yê rastê ve radibe, zulfên yarê weke serxweşan çep û rast semayê dîkin.

Sunbulên ter li gulan palî bi mestî didirin
Sosinên taze û nesrîn wereqan bûne helek (Dilovan, 2013:131)

³⁰ Yavuz Bayram; “Çiçeklerle Diğer Bitkilerin Dîvân Şiirine Yansımaları ve Anlam Çerçeveleri”, *Ondokuz Mayıs Üniversitesi SBE*, Samsun, 2001, r. 216.

³¹ Rıdvan Gündoğdu; “XIX. Yüzyıl Klâsik Türk Şiirinde Mevsimler”, *Dumlupınar Üniversitesi SBE*, Kütahya, 2017, r. 77.

Sunbilên terhîn û nazik pala xwe bi serxweşî dane gulan. Pelên nesrîn û sosinan xelek xelekî bûne.

Di helbesta klasîk de yek ji hêmana bingehîn a bedewiyên dîlberê por e. Li gorî helbestvanên klasîk divê porên dîlberê xweşik, dirêj, gulgulî û bêhn xweş bin.

Mela di vê malikê de sosin ji ber bêhnxeşî û bedewiyê, ji bo pênasikirina porên yarê bikaraniye. Sosin û nesrînen ku xwe bi ser rûyê yarê de berdane bisk û keziyên yarê ne. Her wiha nesrîn û sosin ji bo teswîra porên yarê ên gulgulî, gul jî ji bo teswîra rûyê wê hatiye bikaranîn.

Sosinên tey ter û nazik, li gulan te'ne didin
Fe bi ha l-'enberû faih, we bi ha l-miskû 'ebîq (Dilovan, 2013:33)

Sosinên te an ku temberiyên te rexneyê li gulan dîkin ku bêhna gulan hindike li ber bêhna sosinên nazik.

Di helbesta klasîk de xasîtiyên herî berbiçav ên porê reşbûn, dirêjbûn û bêhnxeş bûna wê ne. Hemû xasîtiyên din mirov dikare bêje ku bi van xasîtiyan ve girêdayî ne. Her wiha perîşanî û gulgulî jî du xasîyetên porê ên balkeş in. Ev xasîtiyên porê ên efsûnker hiş û aqilê evîndar ji serê wî dibin. Lê belê tevî bedewiya xwe ya efsûnî por jî wekî dîlberê pir zalim, bêferaset û bêrehm e.

Di vê malikê de temberiyên porên yarê bi bêhnxeşiyê bi kulîlka sosinê ve hatiye şibandin. Di vê malikê de ji hûnerên edebî hûnera mubalaxayê heye. Sosin an ku porên dîlberê tinazên xwe bi gulan dîkin ku bêhna gulan li ber bêhna bisk û temberîyan hindike. Ji ber ku helbest hem bi kurdî hem jî bi erebî hatiye nivîsandin xezeleke mulemma ye.

2.1.7. Yasemîn

Yasemîn xwedî kulîlkên spî, zer û kêr caran jî pembe ye. Ev kulîlk kulîlkeke bêhnxeş, nerm û weke sermaşîkê çiçekeke hilkişînê ye. Bi gelemperî giyayeke pir salane ye. “Di helbesta klasîk de bi awayên cuda yên wekî semen, yasemen û yasemîn hatiye nivîsandin.”³² Kulîlka yasemînê bedewî, esalet, xweşîkbûn û zerafetê nîşan dide. Wateya kulîlka yasemînê li gorî rengê kulîlka yasemînê ji hev cûda dibe:

³² Yavuz, “Çiçeklerle Diğer Bitkilerin Dîvân Şiirine Yansımaları ve Anlam Çerçevesi”, r. 646.

Rengê wê yî sor weke gula sor remza evîn û hezkirinê ye. Rengê zer ber û bereketê temsîl dike.

Wer ji eksa xemreyan, qewsê qezeh dît yasemîn
Dê gul û reyhan bibarin, têk û têk gulzarî bît (Dilovan, 2013:44)

Eger bisk û berçama ku bi ser enî û rûyê yarê ve daleqandiye an rengên qurdeleya wê ya sor biteyîsin û ev teyîsînên reng keskesorî li ser rûyê yara rû yasemîn biçirisin, qet şik tune ye ku ev teyîsîn dê dîmenê ku gul û yasemîn weke baranê bi ser rûyê yarê de dibarin bide. Ev şewq dê weke tabloyekî ku bexçeyekî bi gul, rihan û kulîlkên rengîn hatibe xemilandin xuya bike. An ku Mela rûyê yarê ji ber van şewqvedanan şibandiye baxçeyê gulan.

Mela di vê malikê de rûyê yarê bi hunera tenasubê şibandiye yasemînê. Di vê malikê de têgehên wekî gul, yasemîn, rihan û gulîstan bi hev re ji bo afirandina ahengekê hatine bikaranîn û di navbera wan de ahengek heye. Lewra ev mîna keke xweşik a hunera tenasube ye.

Eger ku li yasemînan an ku li rû û bedena yarê ji şewqa por û biskan keskesorek vede wê gul û rihan weke baranê bi ser rûyê yarê de bibarin. Yanî wê bedewiya wê zêde bibe dê bibe weke gulîstanekê.

Me bi dil nêrgizên xasse divên
Semen û yasemînên taze divên (Dilovan, 2013:272)

Em ji nêrgizan ên qenc an ku ên çîyayî ku bejna wan dirêjtire ji nêrgizên deştê dixwazin û ji semen û yasemînan jî ên ciwan û bedew dixwazin.

Di helbesta klasîk de yasemîn bi rengê xwe yî spî û arîbûna xwe semboleke ku rû û hinarkên dîlberan pê tê şibandin. Di vê malikê de yasemîn û nêrgiz dîlber e. An ku mela ji bo pênasikirina dilbereke nazik, terhîn û bejin rast nêrgiz û yasemîn bikaranîne.

Di papûsa semensayê mi nêrî bejn û balayê
Le'ellî ebluxu'l-esbabe esbabe's-semewatî (Dilovan, 2013:273)

Dema ku min pîyê yara rû yasemîn maçî kirin, min li bejn û bala wê meyze kir. Lewra bi vê wesîleyê bikaribim xwe bigihînim meqamên bilind.

Di helbesta klasîk de rû xwedî cihekî pir girîng e. Di vê edebiyatê de rû û hinarkên dîlberê zelal, geş, nazik û nerm in. Her wiha di helbesta klasîk de rû û hinark, fêmbariya helbestvan a di warê bedewiyê de nîşan dide. Ji ber ku li gorî helbestvanê klasîk, bedewiya rû û hinarkan bi tu xweşikiyeke din re nayê hevberkirin û berawirdkirin. Li gorî wan hemû bedewî di rû de ye.

Her wiha helbestvan di malika jor de ji ber bejna bilind, nazikî û xweşikiyê rûyê dîlberê ew bi yasemînê şibandiye.

Di vê malikê de hunera îktîbasê heye ji bo ku fikr û raman bi hêztir û peyv xweşiktir be. Mela rista duyem ji ayeta Quranê neqil kiriye.

Dilo wer seyrê balayan di gulzara semensayan
Biha tehtezzu banatun lena min meysi qamatî (Turan, 2012:301)

Dilo were temaşa bedewên bejinzirav ên ku di gulîstanê de hinarkên wan weke yasemînan bike. Bedewên bejinbilind ji bo me di gulîstanê de hedî hedî bi gerdenfîrazî dimeşin.

Yasemen bi reng, bîhn û pelên xwe di helbesta klasîk de tê bikaranîn. Dema teswîra hinarkên dîlberê tê kirin şibandin bi yasemînê tê kirin. Carinan di nav bexçeyên gulan de tenê ew kulîlkek e. Bayê saba ji ber ku bêhna gul û yasemînan bi xwe re digêrîne, evîndarê evdal li pey şopa vê bêhnê tê xiriqandin. Mela jî di vê malikê de yasemîn xistiye hêmana şibandinê û bedewiya hinarkên bedewan bi yasemînan şibandiye.

2.1.8. Rihan

Rihan ku jê re feslexen jî tê gotin cureyekî kulîlkan e ku mîna her kulîlkê bêhna wê ya taybet heye. Dema ku mirov destê xwe didê bêhna xwe derdikeve derva û bêhna xwe li derdorê belav dike. Lewra bûye sedem ku ji aliyê helbestvanan ve bi dilberan were şibandin. Ji ber ku heta tu kes destên xwe nede mirov û eleqeya xwe bi mirov neyîne kes nikare çi hîs dike û çi di hundurê xwe de hîs dike îfade bike. Taybetmendiya herî bingeş a vê kulîlkê ya ku di helbesta klasîk a kurdî de tê bikaranîn bêhnek wê ya balkêş e. Rihan ji aliyê rengê kesk û bîhnexweşiyê ve bi mûyên bihên ku nû derketine ve hatiye şibandin. “Her wiha şanik, şerab, dûman û

etfal, ku bi pir hindik dubendî pê ve girêdayî ye, hêmanên din ên ku çarçoveya semantîkî ya rihanê pêk tînin.”³³

Mehbûb û reyhan pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cullabi da (Dilovan, 2013:17)

Ji ber pelên wê yên reş û bêhna wê ya xweş yara min dişibe rihanê û biskên wê yên tîr gulav dil û hinavên min perçe perçe kirine. Lewra jehra kujer tevî ava gulan kirin û ji bo kuştina min meyger bi min da vexwarin.

Cizîrî, bi peyva reyhan behsa zulfa yarê kiriye. Di edebîyata klasîk de ji aliyên gelek helbestvanan ve por û mûyên dilberê bi rihanê hatiye şibandin. Mela jî porê dilbera xwe ji ber bêhna wê ya xweş û rengê wê yê reş şibandiye rihanê.

Di vê malikê de ji hunerên edebî hunera îstîareya vekirî heye. Ji ber ku taybetmendiya porê hatine gotin û por rasterast nehatiye gotin. Tenê bi rihanê qesta porê hatiye kirin.

Misk e reşandî ez dibêm, wan nuqteyan hin bûne kêr
Pê xette reyhanî li dêm, katib ji nû i’rabi da (Dilovan, 2013:17)

Ez dibêm ku ew deqên li ser rûye yarê tenê miska reşandî ye. Lê belê ji ber ku bêşek ji rûye yarê ji van deqan bêpar maye nivîsyarê qudretê xeta reyhanî ji nû ve nivîsand.

Ez îdea û bawer dikim ku ew deqên reş ên ku li ser rûye yara min in, ji bilî miska ku li ser hinarkên wê hatiye reşandin pê ve ne tiştekî din in. Lê belê bêşek rûyên yara min ji van deqan bêpar maye. Lê nivîsyarê qudretê ew xeta reyhanî ji nû ve beyan kir û bi şêwazeke bedew nivîsand. Mebest ji beyankirinê xweşikkirin û rastkirina zulfan a li ser rûye yarê ye. Bi vî rengî ew bêşa rû ku bê deq mabû ji hate xemilandin û di encamê de bedewiya hemû rûye yarê pêk hat.

Di vê malikê de rihan ne weke giya û kulîlkeke hatiye bikaranîn. Xetên reyhanîyê cureyek ji cureyên destxetan e ku bi gelemperî di nivîsandina mishefan de

³³ Bayram Yavuz; “Klasik Türk Şiirinde Duyguların Dili: Çiçekler”, *Turkish Studies*, Hejmar 2/4, 2007, r. 215.

tê bikaranîn. “Reyhanî cureyek xetên erebî ye. Tê de elîf û lam mîna şitlên rihanê dirêj in.”³⁴

Bi qedê nêrgiza Bohtan î
Nazikek şeng şubih rihanî (Dilovan, 2013:272)

Gelek kulîlk hene ku ji ber reng û bêhna xwe ya xweş, por, bisk û temberiyê dîlberan bi wan tê şibandin. Yek ji van kulîlka jî reyhan e. Li vir jî tê xuyakirin ku di çêkirina teşbîhan de fonksiyonên reng û bîhnê li pêş in.

Di vê malikê de mebest ji nêrgiza bohtan cureya nêrgiza çîyayî ye ku ji nêrgiza deştê dirêjtir e û bêhna wê xweştir e. Mela ji bo bejna yarê pênase bike serî li nêrgiza çîyayî daye û bejna yarê pê şibandiye. Nazikî û bêhn xweşiya yarê jî şibandiye rihanê.

2.1.9. Binevş

Di farisî de jê re “benefşe”, bi erebî “menefşe” û bi tirkî jî “menekşe” ango “binevş” tê gotin. “Ji ber ku farisî ya wê benefşe ye carinan di dubendiyan de bi navê benefşe derbas dibe.”³⁵ Ev kulîlka ku gûniyekî yê pir salan e, bi piranî li cihên si, mêrg, dîwar û zozanan tê dîtin. Binevş cureyekî kulîlkan e ku ji cinsê viola, famîleya Violaceae L. ye. Nêzîkî nehsed cureyên binevşê hene. Di edebiyata klasîk de kulîlka binevşê îfadeya nefsbîçûkî û dilsoziye ye. Di heman demê de kulîlka binevşê îfadeya pakî û dilsoziyê ye. Ji ber vê sedemê wekî remza evînê tê dîtin. Binevş bi helwest, reng û bêhna xwe di helbesta klasîk a kurdî de bandor li helbestvanan kiriye û bûye mijara helbestan. Melayê Cizîrî ji yek ji wan helbestvana ye ku helbestên xwe bi gul û kulîlka xemilandiye û yek ji van kulîlkan jî binevş e.

Li cihê ku rûyê yarê hatiye tesfîrkirin binevş û gul bi hev re hatine bikaranîn.

Nesrîn û binevş e tewwizandin
Mawerdi reşandî şûşeyê’ ac (Dilovan, 2013:65)

Ava gulan ji şûşeya ji dinanên filan reşand û pê zulf û rûyê xwe xemiland. Di vir de Mela rûyê yarê bi nesrînê û zûlfên wê jî bi binevşê pênase kiriye. Helbestvan

³⁴ Zivingî; *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, r. 59.

³⁵ Pala; *Ansiklopedik Dîvan Şiiri Sözlüğü*, r. 305.

rûyê yarê şibandiye nesrînê. Zulûfên wê jî bi binefşê şayesandiye û di navbera bêhna ava gulan û binefşê de têkiliyeke semantîk çêkiriye.

Di baxê min mudam dil tê, cinesrî'w sosin û gul tê
Binefş û terh û sunbul tê, çevîn ser şubhê reyhanê (Dilovan, 2013:231)

Di baxê ku dilê min her tê de ye û pê ve girêdayî ye, nesrîn, sosin û gul hene. Menekşe û tirhên zirav û ciwan hene, van hemûyan weke rihana ku bi ser kulîlkên din de pal dide bi ser dilê min de pal dane.

Di serdema edebiyata klasîk de di piraniya helbestan de bêtayî gulan, gulşen û gulzar li ser bingeha mey, kêf û şahiyê ji bo îfadekirina bexçeyê gulan hatine bikaranîn. Carinan jî ji bo ravekirina baxçeyên razber û mecazî yên ku di bîra helbestvanan de cih digrin hatine bikaranîn.

Di vê malikê de Mela rûyê yarê weke bexçeyê gulan teswîr kiriye. Ew baxê ku gul û sosin, binefş û sunbul tê de ne teswîra rûyê yarê ye. Mebest ji binefşê bisk û temberiyên yarê ne ku weke rihanê bi ser dilê helbestvan ve tewiyane.

2.1.10. Erxewan

Erxewan di lîteraturê de wekî "Cercis Siliquastrum" hatiye binavkirin; di îngilîzî de jê re "Judas Tree" ango "Dara Yahûda" hatiye gotin. Erxewan di dawîya nîsanê û destpêka gulanê de tenê çend hefteyan kulîlkên mor û pembe vedide ku weke mizgîniya biharê tê hesibandin. "Erxewan kulîlkeke sor e û fêkîyê wê tune"³⁶ Li gorî hin baweriyên xirîstiyanan, hawarîyê ku îxanet li Mesîh Îsa kiriye Yahuda, xwe bi vê darê ve daleqandiye. Erxewan ji ber rengê xwe yî mor û pembeyî di helbesta klasîk de ji bo teswîra rû, gupik, lev û cilê yarê hatiye bikaranîn.

Sed padişah û Xusrewan, can dan ji'îşqê û rewan
Şêrînlîbasê erxewan, min dîn li bejna serwî qad (Dilovan, 2013:89)

Her çiqas di helbestan de erxewan wekî kulîlkên din pir caran nayê dîtin jî ew kulîlkek e ku ji hêla şêwe û rengê xwe yî cihêreng ve îlhamên cûda dide helbestvanan. Di helbesta klasîk de erxewan ji taybetmendiyên xwe yên estetîk zahîr bi rengê xwe derdikeve pêşberî me.

³⁶ Pala; *Ansiklopedik Dîwan Şiiri Sözlüğü*, r. 140

Di vê malikê de Mela ji bo bedewiya lîbasê yarê an ku cilê yarê serî li erxewanê daye û kinc û cilê yarê bi erxewanê şibandiye. Sed padîşah û Xusrewan an ku kralan canê xwe ji bo evîna te dane. Min jî fîstanê sor ê xweşik û şerîn ê erxewanî dîtî li wê yara ku bejna wê weke serwîyekê bilind ku bejna wê rast e.

Xûn ji dil co co rewan tê, wek eqîq û erxewan tê
Lê ji dest selwa ciwan tê, ew şepala şeng û şox (Dilovan, 2013:82)

Di helbesta klasîk de erxewan, ji bo teswîra mey, rondik, xwîn û hinarkên yarê hatiye bikaranîn. Dîsa hêmanên wekî qedeh, xwîn, agir, lêv, rû, hinark, birîn, ziman, dîlber û evîndar ku bi îlhama vê taybetiya nebatî ve girêdayî ne, wateya erxewanê temam dîkin.

Xwîn ji dil û hinavên min weke şirikan diherike. Wekî kevîrê eqîq û erxewanê sor e. Lê tişt nabe ji ber ku bi destê yara şox û şeng tê ku bejna wê weke dara serwîyê ye. Her wekî ku tê dîtî di vê malikê de xwîn ji ber sorahiyê bi erxewanê hatiye şibandin ku rengê erxewanê jî sor e.

2.1.11. Gulnar

Gulnar navê kulîlka hinarê ye. Rengê wê rengê sor e. Ev kulîlka ku bi şeweya xwe pir delal û xweşik e. Yek ji wan kulîlkên ku helbestvanan di helbestên xwe de gelekî bi kar aniyê. “Hinar bi reng, şewe, lib, av, kulîlk û şaxên xwe ve hatiye nîqaşkirin.”³⁷ “Hinar di heman demê de sembola dayikzadeyî û zayinê ye, hêma û sembola gerdûn û rehma jinan e. Nîşaneyê şîfa û vejîn, pît û bereketê ye.”³⁸ Di wêjeya klasîk a kurdî de gulnar ji bo îfade û teswîra rû û gulpikên yarê û zulfên sorhinekîrî hatiye bikaranîn. Melayê Cizîrî jî di helbestên xwe de zulfên hinekîrî yên ku sor in şibandiye gulnarê û di dewsa zulfên hinekîrî de gulnar bi kar aniyê.

Ew çiçekên şetrî şibeht, efa sifet qelbê me mêht
Selwa ji balayê we reht, ev perdeya gulnar-i xet (Dilovan, 2013:120)

Ew çiçekên ku weke morikan in, weke marekî bi dilê me vedan, yarê jî ew perdeya gulnarî ji serwîya bejna xwe dawirand. Mela zulfên yarê bi dirêjîyê

³⁷ Abdülkerim Gülhan, “Divan Şiirinde Meyveler ve Meyvelerden Haraketle Yapılan Teşbih ve Mecazlar” *Turkish Studies, International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Hejmar 3/5, 2008, r.363.

³⁸ Qendîl Şeyxbizînî, “Di nav çand û baweriya kurdî de dar”, *Xwebûn*, 8 Çile 2023, r.3.

şibandiye mar û bi rengê sor jî şibandiye gulnarê dibe ku mebest ji gulnarê porên sorhinekî bin.

Reng hem di hunerên dîtbarî de hem jî di wêjeyê de nirxa estetîk û pevgirêdana hîzrê zêde dîkin. Di edebiyatê de hem di teswîrên xweza û dîlberan de hem jî di rengvedana hest û ramanan de wateya rengan xwedî qadeke berfireh e. Sor ji ber tesîra xwe ya li ser mirovan û nîrxê xwe yî estetîk di nav rengan de xwedî cihê girîng e. Lewra di helbestan de rengê ku herî zêde hatiye bikaranîn sor e. Helbestvanên klasîk ji bo hinark, por û lêvên yarê û di motîfên sor ên wekî gul û laleyan de ev reng gelek caran dane der. Her wiha di dîwana Cîzîrî de ji bo teswîra gelek mijaran rengê sor xwedî rolekî girîng e.

Bulbulan sed gul di çav in, çav li sed gul dî dîkin
Min di baxê gulizaran yek gul û gulnarî bes (Dilovan, 2013:109)

Li ber çavê her bilbîlekî bi sedan gul hene. Lê ew çavên xwe li sedî din digîrînin. Lê ez di baxê bedewên gep gul de tenê gul û gulnarekê dixwazim.

Li ber çavên bilbilên ku karzanên eşqa mecazî ne bi sedan xweşik hene. Lê sed xweşikên din daxwaz dîkin. Ew kes serwest nebûne ku eşqa mecazî navgîneke yan jî pireke ji bo gihiştina eşqa îlahî. Ez ne ji wan kesan im ji ber ku eşqa min ji qonaxa mecazî derbasî eşqa îlahî bûye. Lewra ez evîndarê yek gulê me û ji wê gulê pê ve nikarim ji kesekî din hez bikim.

Gulnar ji ber ku piçûk, nazîk, ciwan û şeng e ji bo evîna îlahî weke sembolekê hatiye bikaranîn.

2.1.12. Kerbeş

Kerbeş giyayekî bi strî ye ku li çol û beyaran şîn tê. Ev giyayê strîdar bînîrx e û weke geyayê keran jî tê binavkirin. “Kerbeş di helbesta klasîk de bi bêqîmetî û negirîngîyê cih digire.”³⁹ Mela jî di helbestên xwe de ji bo kêmnîrxîyê kerbeş bikaraniye.

Camid çi kit bi husnê ku wan nezer li xwar e
Xer teb’et in di ebleh, çi nêgîz û çi kerbeş (Dilovan, 2013:111)

³⁹ Bayram; “Çiçeklerle Diğer Bitkilerin Dîvân Şiirine Yansımaları ve Anlam Çerçevesi”, r. 1401

Ma wê dilreş an ku dilhişk çî bikin ji xweşikiyê. Çavên wan tim li tiştên erzan û kêmnirx e. Tebîeta wan tebîeta keran e. Ew ehmeq in û li ba wan ferqa nêrgîza xweşik û kerbeşa strîdar wek hev e. An ku li ba kesen ehmeq û nezan ferqa tiştên xweş û nexweş tune ye dibe ku tiştên nexweş ji kesen ehmeq re bi tamtir û xweştir be.

Bazê dîkit ji qencan, ji remz û naz û xencan
Qedrê gulên çî zanî, kerbeşê divê kerê reş (Dilovan, 2013:111)

Mela di vê malikê de jî kerbeş bi heman wateyê bi kar anîye. Ew dilhişk xwe ji qencan û xweşikan dûr dixê. Xwe ji nazîkiya yara delalî dike. Kerê reş dê çawa qedre gulên bizanibe! Çavê kerê her tim li giyayê keran an ku li kerbeşê ye. Di van her du malikan de Mela kesên nezan û dilhişk şîbandine kerê û kesên nirxkêm jî şîbandine kerbeş e. Bi min Mela di van her du malikan de kesên nezan û dilhişk ku ji evîna îlahî bêparin ew bi keran şîbandiye. Ji ber ku kesên nezan û dilhişk her çavên wan li tiştên nirxkêm e û kerbeş jî sembola kêmnirxîyê ye.

2.1.13. Belazîz

Belazîz kulîlkeke bejî ye ku li çiyayan di demsalên biharê de hêşîn dibe. Rengê wê şînê vekirî ye. Bi tirkî jê re “dağ sümbülü” an ku “yaban sümbülü” tê gotin. Kulîlkeke zêde şeng û nazîk e. “Belazîz kulîlkeke xweşik, tenîk û nazîk e.”⁴⁰ Berî her tiştî, belazîz nebateke xemilandîye û pir hêja ye. Di edebiyata klasîk de ji bo bedewîya yarê û xweşikiya cilên yarê ev kulîlk hatiye bikaranîn.

Ko lê têt ew qebayê asimanî
Letîfa şeng û nazîk wek belazîz (Dilovan, 2013:104)

Ew a ku qebayê yan ku fîstanê şînê ezmanî li xwe dike, ew nazîka tîr û şeng weke kulîlka belazîz e.

Di hişmendîya mirov û civakê de li gorî taybetmendiyên heyînan carnan reng dibîne remz û sembol. Li ser bingeha bandora ku ezman û derya li ser mirovan dike, rengê şîn bêdawîtî û serbestiyê temsîl dike.

⁴⁰ Gülay Karaman; “Perîşan Çiçek Sümbül ve Klasik Türk Şiirinde İşleniş”, *İnsan ve Toplum Bilimleri Araştırmaları Dergisi Journal of the Human and Social Science Researches*, Hejmar 2, 2012, r. 291.

Mela cilê yarê şibandiye rengê belazîzê û yar jî şibandiya kulîlka belazîz e. Ji ber ku rengê belazîzê şînê vekiriye weke rengê ezman e. Ew sembola bêdawîti û azadiyê ye.

2.2. Dar û Unsurên bi Daran ve Têkildar

Di devok û diyalektên zimanê kurdî de ji daran re hêşîne û dirext jî tê gotin. Dar di bîr û baweriyên kurdan de ji serdemên kevnar heta îro pîroz hatine dîtin. Ji ber ku dar di axê de bi avê mezin dibe û fotosentezê dike weke heybereke zindî hatiye hesibandin. Lewra dar di bîr û bawerî û çanda kurdan de xwedî cihekî girîng in.

Li gorî pêbawerî û mîtolojiyê, di şeva herî dirêj de an ku di Şeva Yeldayê de Mîthra ji kulîlka nîlûferê xuliqî ye. Kulîlka nîlûferê ku pevgihana roj û avê ye, remza ji nû ve zayin, aşitî, jiyana hevbeş û Ahura Mazda ye. Di çanda kurdan de wekî kulîlka mîhrîvanîyê tê hesibandin. “Her wiha pîrozwerî û taybetiyeke din a mîtrayî û Cejna Yeldayê ‘gula nîlûper’ê ye. Li gor çandnasî û mîtolojiyê, Mîtra di Şeva Yeldayê de ji gula nîlûperê hatiye der.”⁴¹

Di çand û kevneşopîya kurdan de dar xwedî cihekî girîng in û ji mêj ve di nava gel de qedr û qîmetekî bilind dibînin. Di nav kurdan de çandina daran kevneşopîyeke pir kevnar e ku bê armanceke qanûnî, aborî û menfeat, çandeke hezar salan e û nebirîna daran çandeke xwezayî û bi zanebûn e.

Di bîrûbawerîya êzîdîyan de jî dar xwedî cihekî taybet û pîroz in. “Di dînê êzîdî de jî sê roj mirov dikare biçe çol û çiyayan û daran bîne, ew jî bi mercên cureyên darên li jêr: Çiqên dara şikiyayî, Dara ku birûskê lê dabe, Dara hişkbûyî. Ji bilî van sê cureyan, birîna her darên din tawan e û guneh e”⁴²

Yek ji perestina ayîna Şeva Yeldayê çandina daran e ku di vê şevê de çandina daran gelekî xerdar tê dîtin. Di vê şevê de çandina darên hinarê û darên mazî xwedî cihekî taybet in ku weke merasîma îbadeta vê şevê tîr qebulkirin. Her wiha çîni jî di bîr û bawerîya xwe de daran weke elementa pêncemîn dihesibînin. Lê di bîr û bawerîya kurdan de dar ne element e, şênberkera her çar elementan e. Her wiha dar di bîr û bawerî û jiyana kurdan de xwedî cihekî muhîm in.

⁴¹ Qendîl Şeyxbizînî, “Di nav çand û bawerîya kurdî de dar”, r.4.

⁴² Qendîl Şeyxbizînî, “Di nav çand û bawerîya kurdî de dar”, r.3.

Hezkirin û mîhrîvanîya kurdan ji daran re, dûv pejirandina baweriya Îslamê jî berdewam kiriye. Resulullah ji ber ku di her fersendê de çandina daran pêşnîyaz kiriye ev hişmendî heta îro berdewam e.

Darên ku giyanewer in, giyan dane giyandarên din jî û her wiha darên giyanewer têsîr li edebiyat û hunerê jî kirine. Dar di edebiyatê de motîfeke girîng e ku reng û şêwe daye hemû cureyên edebî. Di helbestên Melayê Cizîrî de jî pirî caran dar hatine bikaranîn. Hin caran ji bo teswîra dîmenên siriştê hin caran ji bo teswîra bejn û bala yarê hatine bikaranîn. Di helbestên Cizîrî de er'er, serwa, mêw, narewan û hwd. derdikevin pêşberî me. Dara ku em ê pêşî vekolin selwa ye.

2.2.1. Selwa

Dara selwa di edebiyata klasîk de hêmana herî bijarte ye ku bejna yarê pê tê teswîrkirin. “Li ber bayê hejandina sivik a dara selwayê dema yar hêdî hêdî dimeşe û diheje tîne bîra mirovan”⁴³ “Ev meşa yarê hemû kulîlkên gulîstanê aşîqî xwe dike”⁴⁴ Taybetmendiya herî girîng ya selwayê ew e ku rast û bilind e. Selwa ji ber ku fêkî nade û zivistanan pelên xwe naweşîne, li ber avê çêdibe û ji avê hez dike ji helbestvanên edebiyata klasîk re bûye îlham. Xurtbûna şaxên wê û şînahiya pelên wê her demsal şîn û gur in. Ji gelek çûkên curbecur re bûye sitargeh. Selwa ji ber ku her demsal hêşîne û li ber serma û cemedê zexm e li gelek deveran tê çandin. Her wiha ji ber ku her çar demsalan pelê xwe naweşîne û gava ku ba lê dixê dengê ‘hûû’ derdikeve holê bi piranî ev dar li goristanan tê çandin. Ji ber ku dengê ‘hûû’ weke zikra Xwedê tê hesibandin. “Dara ku di goristanan de jî tê dîtin, wateya jiyanê û mirinê ji bo vê darê hatiye dayîn.”⁴⁵ Melayê Cizîrî di helbestên xwe de yar weke dara serwê bi bejna rast û direj teswîr kiriye.

Selwa rewan zerrîn wereq, çiçek Melê dîn sed neseq
Yaqûtûha yehkî şefeq, yehwî'qudên kewkeba (Dilovan, 2013: 22)

⁴³ Pala; *Ansiklopedik Dîvan Şîiri Sözlüğü*, r.400.

⁴⁴ Fatma Kandemir; “Bâkî ve Nedîm’in Gazellerinde Sevgilideki Güzellik Unsurları”, *Trakya Üniversitesi SBE*, Edirne, 2008, r. 231.

⁴⁵ Metin Hakverdioğlu; “Sevgili Neden Servi Boyludur?”, *Amasya Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Hejmar 4, Amasya, 2016, r. 216.

Dara selwayê her demsal hêşîn e. Li ber bayê payîzê û sermayê zexm e. Lewra Cizîrî dîlbera xwe bi dara serwayê şibandiye. Dîlbera Cizîrî ji weke dara serwayê her wextî xemilandiye û tu carî pîr û kal nabe ew her çaxî ciwan û bedew e.

Ji ber ku selwa dareke rast û dirêj e. Mela bi gotina selwa rewan zerrîn wereq teswîra bejna yarê kiriye. Ew yara ku di dirêjî û راستiyê de bejna wê weke selwiyeke pelzêrîn û hejandiye, yaquta li ser gewrîya wê jî mîna stêrka sibehê diçirise. Çawa ku stêrka berbangê rê û alîyan nîşanî rêwîyan dike her wiha gerdena dîlberê jî ji evîna Mela re peywira pisûlê dibîne. Her wiha ew cîhana helbestvan ronî dike û ji evîna wî re dibe rênîşander.

Zinhari kesê desti bibit ergemê serwê
Bê'uşweyê le'lan ne bi teslîmî jiha girt (Dilovan, 2013:48)

Bila baldar be kesê ku destê xwe dirêjî marê li ser dara selwiye û bila zanibe dest avêtiye marî bi destûra lêvên nazik ne bi sernermiya mar û razîbûna wî. Mela dibêje kesên ku bixwaze dest bavêje guliyên ku bi ser bejna yarê de berdayî ne weke marên li ser dara serwiye daleqandî, divê destûra yarê bixwaze yan na ne pêkane xwe bigihîne guliyên yarê. Mela teswîra bejana yarê bi serwîyê û guliyên wê weke mar teswîr kirine.

Şimşadê xeram û serwê xennac
Canan dibirt, bi'îşwe tarac (Dilovan, 2013:65)

Yara ku bejna wê weke dara şimşîrê ye, dema ku li ber bayê diheje weke sewliya nazik e. Rihê mirovan bi nazikî û delaliya xwe talan dike. Bejna darên serwê û şimşîrê gelekî rast û bilind in. Lewra di helbestên klasîk de teswîra bejna dîlberê bi dara şimşîr û dara serwê tê kirin. Mela jî di vê malikê de dirêjahî, nazikî û bedewiya bejn û bala yarê bi dara serwê şibandiye yan ku dîlber weke dara serwê şayeser kiriye.

Xûn ji dil co co rewan tê, wek eqîq û erxewan tê
Lê ji dest selwa ciwan tê, ew şepala şeng û şox (Dilovan, 2013:82)

Xwîn ji dil weke cokan diherike. Sor weke kevîrê eqîq û rengê erxewanê ye. Lê tişt nabe ji ber ku bi destê yara weke serwî şox û şeng tê. Ji ber ku xwîna sor bi destê dîlbera bejna wê mîna serwîyê bilinde diherike mela kefxweşî û razîbûna xwe nîşan dide.

Di helbesta klasîk de erxewan, ji bo teswîra mey, rondik, xwîn û hinarkên yarê hatiye bikaranîn. Dîsa hêmanên wekî qedeh, xwîn, agir, lêv, rû, hinark, birîn, ziman, dîlber û evîndar ku bi îlhama vê taybetiya nebatî ve girêdayî ne, wateya erxewanê temam dikin. Ji ber ku xwîna sor bi destê dilbera bejina wê mîna serwîyê bilinde diherike mela kefxweşî û razîbûna xwe nîşan dide.

Sed padîşah û Xusrewan, can dan ji'îşqê û rewan
Şêrînlibasê erxewan, min dîn li bejna serwî qad (Dilovan, 2013:89)

Bi sedan rêvebir û qiralan canê xwe di ber evîna te de dane. Min jî cilên sor ên rengê erxewanî li bejna yara bedew dîtî ku bejna wê mîna dara serwîyê rast û bilind e.

Di vê malikê de Mela ji bo bedewiya libasê yarê yan ku cilê yarê serî li erxewanê daye û kinc û cilê yarê bi erxewanê şibandiye. Sed padîşah û Xusrewan anku kralan canê xwe ji bo evîna te dane. Min jî fîstanê sor ê xweşîk û şêrîn ê erxewanî dîtî ku bejna wê weke serwîyekê bilind û rast e.

2.2.2. Narewan

Fagus orientalis, ku bi zimanê tirkî 'kayın ağacı' jê re tê gotin cureyek darê ye ku darên tîran û zînen hespan jê çêdibin. Lewra ji vê darê re dara xedengê hatiye gotin. Lê di edebiyata klasîk de ji ber ku tîrên darîn an ku xedeng ji vê darê saz dibin bûye nav ji tîr û sertîran re û her weha ji bo teswîrkirina çav û birûyan hatiye bikaranîn.

Ne tenê gezme dibarin me ji qewsê du hilal
Me ji mujganê siyeh tenê ceger, tîr û xedeng (Dilovan, 2013:142)

Barana tîran tenê ne ji kevanên her du hilalan an ku tenê ne ji birûyên yarê bi ser me de dibarin. Ji her du mijangên çavên te yê reşxwedeng û tîr zahftir dibarin bi ser cegera min de. Mela awirên yarê şibandiye tîran û ji bo ku wateyê bihêztir bike tîr û xeteng bi hev re bi kar anîne.

Bi narê firqetê suhtim, ji ferqê ser heta pê da
Xedenga xefletê nuhtim, ji berqa lamî'a tê da (Dilovan, 2013:24)

Ji serî heta pêyan agirê firqetê an ku agirê dûrîyê ez şewitandim û xedenga şewqdar ku ji xefil an ku ji nişkê ve li min ket dilê min kul kir. Mela di şuna tîrê ve ji

ber ku tîr ji dara xedengê saz dibin xedeng bi kar aniye û nêrînên yarê an ku awirên wê şibandiye tîran.

Xedenga firqetê reede, dilê ew xefletê lê dit
Dibêjim ger cebel bit ew, dê ker bit dê di gavê da (Dilovan, 2013:24)

Tîra dûriyê weke birûskê ye ew birûska diwar ji nişkê ve li dilê kî bide ew ê di cih de hûrûhêla bibe. Ew dil her çiqas weke çîyayekî qewîn û hêzdar jî be. Wek ku di van malikan de jî xuya dike dara xetengê ne ji ber şikl û xweşikiya xwe ji ber ku zînen hespan û bi taybetî tîr jê hatine çêkirin ev dar di wateya tîran de cihê xwe di nav helbesta klasîk de girtiye.

Wekî ku di van malikan de jî xuya dike dara xetengê ne ji ber şikl û xweşikiya xwe ji ber ku zînen hespan û bi taybetî tîr jê hatine çêkirin ev dar di wateya tîran de cihê xwe di nav helbesta klasîk de girtiye.

2.2.3. ‘Er’er

‘Er’er dareke zexm e û li ber sermayê saxlem e. Çar demsalan kesk e. “Havîn û zivistanan pelên xwe naweşîne dareke temendirêj, rast û bejin direj e.”⁴⁶ Ji vê darê re dara ar’arê jî tê gotin ku li çol û çîyayan çêdibe. Cureyekî ji cureyê serwîyê ye lewra jê re serwîya çîyayî an ku serwîya bejî jî tê gotin. “Pelên wê zivistanê jî naweşin”⁴⁷ Ji ber ku havîn û zivistanan hêşîn e dibe temsîliyeta ebediyetê jî.

Ev dar dareke gelekî zexm e. Lewra demên berê ser banên avahiyan bi vê darê dihate girtin. Ji ber ku dareke rast, nazik û dirêj e di helbesta klasîk de bejn û bala yarê bi vê darê hatiye şibandin. “Herî zêde ji bo bejna yarê wek hêmana pêşibandinê tê bikaranîn. Dema behsa bejna yarê tê kirin, wek îstîare serwîya er’êrê an er’er tê gotin.”⁴⁸ Di helbesta klasîk de çawa ku bi gelemperî er’er ji bo berz û bedewbûna bejna yarê tê bikaranîn Melayê Cizîrî jî bi heman şêweyî wextê ku teswîra dirêjahiya bejna yarê dike ji bo bejn û bala yarê dara ar’arê bi kar tîne. Bi vî rengî Mela bal dikşîne ser bejna rast û dirêj a yarê:

⁴⁶ Bayram; *Çiçeklerle Diğer Bitkilerin Dîvân Şiirine Yansımaları*, r. 934.

⁴⁷ Pala; *Ansiklopedik Dîvan Şiiri Sözlüğü*, r. 25

⁴⁸ Osman Aslanoğlu; “Gîya di Dîwana Şêx Ebdurrahman Aqtepe da”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, Hejmar 1, 2020, r. 40.

‘Er’er xeram e bi qed û qamet
Yek bûse da me bi sed qiyamet (Dilovan, 2013:56)

Ew yara ku bejn û bala wê mîna er’erê diheje, heta ku bûseyek anku maçek da min sed qiyemet li min rabû. Di vê malikê de wekî ku me li jor jî behsê kir Mela bejn û bala yarê bi dara er’erê şibandiye ji ber ku dara er’erê rast û dirêj e.

Min dîn li bejna er’erîn, tayên zubad û ‘enberîn
Bayê seba da çenberîn, zulf çûne ser nûra semed (Dilovan, 2013:89)

Min li ser bejna yarê ku weke dara er’erê dirêj û nazik û rast e, tayên zulfên ku bêhna wan weke bêhna zubadê xweş û enberê ye dîtîn. Bayê sibehê jî li zulfên weke çengelan hilat û ew hejiyan çûne ser nûra xwedayî ku enî û rûyê yarê ne.

Mela di her du malikan de jî bejn û bala yarê bi nazikî û dirêjahiyê şibandiye dara er’erê.

Mawer ke terh û bişkuwan, cîranê berg û lû’lûwan
Ew ‘er’er û selwa ciwan şetrî bi mestî lê xuşîn (Dilovan, 2013:164)

Bi ser por û pişkojan ve ava gulên bireşîne ku cîranê berg û gewheran in. Ew bejna ku mîna dara ‘er’erê nazik û bilind e gewher bi serxweşî li ser xuşîn an ku xîstexîstê dîkin. Mela bejna yarê weke dara ‘er’erê teswîr kiriye ku hingê bi mestî û kubar dimeşe morîk û gewherê yarê xîstexîstê dîkin.

2.2.4. Mêw

Mêw dara tirî ye. Carînan di edebiyata klasîk de bi riya mecazi murselê di dewsa şerabê de jî tê bikaranîn. “Ji ber ku şerab vexwarineke sor e û ji tirî tê amadekirin bûye sedema şibandina lêvên yarê.”⁴⁹ Tirî carnan ji bo porê yarê û carinan jî ji bo lêvên wê dibe mijara teşbîhê. Ji ber ku fêkiyekî şêrîne û dims jê çêdibe lêvên yarê pê tê şibandin. Dema ku bi reng tê şibandin bi riya mecazi murselê şereb tê bikar anîn. Çawa ku şeraba sor mirov serxweş û mest dike helbestkar jî lêvê yarê dişibihîne meya sor ji ber ku lêv jî sor in.

Ya Reb çi turfe mêw e, ev rengê mey dibexşit
Şi’ra me tê perîşan, nezma me tê muşewweş (Dilovan, 2013:110)

⁴⁹ Pala; *Ansiklopedik Dîwan Şiiri Sözlüğü*, r. 139.

Ya reb! Ev çi nûberê taze ye. Ev çi mêweke sosret ya tirî ye. Ev meya taze jê peyde dibe. Tesîreke bibandor li hişê me dike û helbesta me perîşan dike û hevnegirtî dihêle. Mey di edebiyata klasîk de ji aliyê awayê çêkirinê, tesîra xwe ya serxweşker, reng, bêhn û maddeyên curbecur ên ku lê hatine zêdekirin ve gelek navên cuda wergirtine. Ji ber van taybetbendiyên xwe bûye mijara gelek teşbîhên estetîk. Mela yara xwe bi nazikî û tazebûnê dişibihîne mîwê ku lîvên wê weke şerabê sor in û hiş û aqil di serê mirovan de nahêle.

Mela di vê malikê de ji Xwedê dipirse ya reb ev çi turfe mîw e? An ku ev çi mêweke sosrete ku her wextî meyê dibexşîne? Ji ber ku ev pîrs ne li benda bersivekê hatiye kirin hunera îstifhamê hatiye bikaranîn. “Ji bo ku bala xwendekar baş bê kişandin, gotineke bi raman an jî bi hest bê fêmkirin ji siwalekî ku were kirin re îstifham tê gotin.”⁵⁰ Her wiha Mela bîyî ku li benda bersivê be, ji bo bala xwendekar bikşîne ev pîrs ji Xwedê kiriye.

Wê horîsiriştê li me xweş mîwe bi ber kir
Cennat e di wesla te û atesperes î tu (Dilovan, 2013: 65)

Ew dilbera ku tebîetê wê mîna tebîetê horîyê bihiştê ye, ji bo me rez bi ber kirin. Ey dilber weslê te an ku civanê te ji bo me bihişt e lê tu agirperestî. Agir berdidî dilê me û dilê me her dişewitînî, tu me bi bihiştê xwe şad nakî. Di zimanê erebî de cennat rez e. Cennet an ku bihişt yek jimariya cennatê ye. Lewra Mela di vê malikê de rez di wateya baxê bi ber û fêkiyên xweş û bi tam bi kar anîye. Dibe ku ji fêkiyên bi ber û tam xweş mebest sing û berên yarê be.

2.2.5. Şimşîr

Şimşîr cureyekî ji darên xemilandî ye ku pelên wê her demsal kesk dimînin û bê fêkî û bê ber e. Di demên kevin de ji ber zexm û saxlemîyê gelek amûrên weke kevçî û şeh ji dara şimşîrê hatine çêkirin. Di helbestan de ji bo vê darê zêdetir navê şimşad hatiye gotin û bi gelemperî ev nav hatiye bikaranîn. Bejna şimşîrê gelekî bilind e. Heta deh metreyan dirêj dibe. Lewra di helbestên klasîk de teswîra bejna dilberê bi dara şimşîrê hatiye kirin. “Di helbestên klasîk de bejna yarê bi dara şimşîrê

⁵⁰ M. Orhan Soysal; *Edebi Sanatlar ve Tanınması*, MEB yayınları, İstanbul, 1998. r. 59.

tê şibandin.”⁵¹ Şimşîr di helbestan de ji ber dirêjahîya xwe weke hêmaneke ku bejna yarê pê tê şibandin cihê xwe girtiye.

Şimşadê xeram û serwê xennac
Canan dibirt, bi'îşwe tarac (Dilovan, 2013:65)

Dîlbera ku bejn û bala wê mîna dara şimşîrê bilind û nazîke giyanên mirovan bi bedewiya xwe talan dike.

Şimşîr ji ber ku bejna wê zirav, dirêj û bêqisûr e, bi bejna dîlberê re tê dirûvandîn. Wekî din hejandina wê ya bi bayî re wekî meşa dîlberê tê teswîrkirin. Di vê malîkê de bejna dîlberê ji ber nazîkî û bilindahiyê bi dara şimşîrê hatiye şibandin ku şimşîr dareke nazîk, bilind û gelekî zexm e.

2.2.6. Sêv

Sêv jî di helbesta klasîk de weke dar û fêkîyên din ne bi wateya rastîn bi wateyên mecazî weke hêmaneke şibandinê hatiye bikaranîn. Helbesta klasîk ji rastiye dûr e. Lewra di helbestê de sêv tê bikaranîn. Mebest ji sêvê gep û rûyê yarê ne. “Sêv bi rengên xwe yên cihê di çavên mirovan de bûye yek ji fêkiyên herî bi nirx û girîng.”⁵² Di edebiyata klasîk de sêv gelek caran derdikeve pêşberî me. Di helbestên klasîk de gep û rû û sîng û berê yarê bi sêvê tîrî tesbîhkirin.

Nebat û şekkera lêvê, nesîmê wê gul û sêvê
Hilînit perdeya şêvê, şîfaya hindekî derd e (Dilovan, 2013:65)

Eger dîlber çarşefa reş ji ser rûyê xwe bavêje, zîmanê şêrîn û bayê gul û sêvê dê bibe derman ji êş û derdan re. Mebest ji gul û sêvan gep û rûyê yarê ne. Helbestvan gepên yarê bi sêvên sor şibandîye.

Helbestvanên klasîk di helbestên xwe de hinarkên dîlberan bi motîfa sêvê teswîr kirine. Bi gotîneke din di gelek helbestan de hinark bi sêvê re tê şibandin. Lê di hin helbestên klasîk de ev hevşengî di navbera sêv û sîngê dîlberê de hatiye danîn.

Da binoşim mey ji lêvê, mawera reyhan û sêvê
Luleyên şekkîr di nêvê, abê heywan çeşme ye (Dilovan, 2013:193)

⁵¹ Pala; *Ansiklopedîk Dîvan Şiiri Sözlüğü*, r. 432.

⁵² Levent Öztürk; "Sevginin Sembolik Betimi: Elma", *Turkish Studies*, Hejmar 3, 2008, r. 607.

Ez hewl didim ku xwe bigihînim wê dilbere. Da ku ji lêvên wê şerabê, ava rihan û sêvan binoşim. Ji ber ku xwêdana yarê ji bo min ji şekir şêrîntir e û weke ava heyatê ye.

Helbestvanên klasîk di helbestên xwe de hinarkên dîlberan bi motîfa sêvê teswîr kirine. Lê hin caran xwêdana yarê jî wekî ava sêvan hatiye dîtin. Di malika jorîn de jî mebest ji ava sêvan xwêdana yarê ye. Helbestan xwêdana yarê bi ava rihan û sêvan şayesandiye.

Şeker di nêv lêvan e wê, reyhan li dor sêvan e wê
Meş'el di nêv şevanê wê, tîsî ji rengê fenerê (Dilovan, 2013:239)

Peyvên dilberê mîna şekir in. Biskên wê jî weke rihanê li dora hinarkên rûyê wê ne. Rûyê wê weke meşaleyê ye. Porên wê weke şeva tarî reş in. Rûyê wê di nav porên reş de weke lembeyê ronî dide. Mebest ji sêvê hinarkên rûyê yarê ne.

Me ji bexçeya yar zeyyînî, bê pîrs Mela sêvek çînî
We bîma ceneytû cennetî, elqet 'eleyye cinayeta (Dilovan, 2013:23)

Me ji baxê dilberê yê ku weke bîstanê bihiştê tijî fêkiyên xweş in bê rêdan sêvek jêkir. Dilberê jêkirina sêvê weke gunehêkî pîr mezin pejirand. Mîna ku min kesek qetil kiribe. Di vê malikê de hûnera telmîhê heye. Bê destûr xwarina sêvê destnîşaniya bûyera Adem û Hawayê ye ku Xwedê destûr nedabû wan ku ji wê darê bixwin. Adem bê destûr ji dara qedexekirî sêvek çînî. Lewra ew ji bihiştê hate avêtin. Mela bi hûnera teşbîhê hinarkên rûyê yarê şibandiye. Sêva sor û maçkirina wan hinarkên bê destûr ji aliyê dilberê ve weke qebeheteke mezin hatiye hesibandin. Her wiha di vê malikê de ji bo hûnera cînasê cenet û cînayet bi hev re hatine bikaranîn. Cînas bi rîya du peyvên ku wek hev tên nivîsîn û bilêvkirin. Lê xwedî wateyên cuda ne. Her wiha bi tîpên erebî cenet û cînayet wek hev tên nivîsîn.

2.2.7. Tûba

Tûba weke yek ji darên bihiştê tê hesibandin. Tê bawerkirin ku çiqên wê li jêr in û kokên wê li jor in. Ev dar weke dara ku siyê dide ser bihuştê tê pênasekirin. Ji bo kesê ku pesnê wî tê kirin tê bikaranîn. “Ev dara ku tê bawerkirin ku li Sîdreyê cih

digire, bihiştê sîdar dike.”⁵³ Sîdra an ku Sidretû'l-munteha pênaseyeke erebî ye ku tê wateya li ber deriyê bihuştê. Di bilindahiyê de rawestgeha dawî ye. Lewra ji bo penasekirina bilindahiya dara tûbayê hatiye bikaranîn. Dara tûbayê di helbesta klasîk de ji bo pênasikirina bejna dilberê û weke sembola qencî û bihiştê hatiye bikaranîn.

Berê meqsûdê ji Tûba, negirin me'lûm e
Me ji destê xwe yê kûtah û ji payê xwe yê leng (Dilovan, 2013:141)

Eger em fêkiyê meqsed û mirazê ji dara tûbayê an ku ji dara bihiştê negirin ev yek ji rêzê ye ji bo me. Ji ber ku destên me ji karên baş û qenc re kin in û lingên me jî kulek in. Di vê malikê de Mela bihişt bi dara tûbayê sembolize kiriye. Bi dara tûbayê hunera telmîhê bi kar aniye ku bihiştê bi bîr bixe.

2.3. Bexçe

Di helbesta klasîk de bexçe bi gelek navên hemwate yên wekî bax, bexçe, gulîzâr, gulşen, gulîstân û bostân derbas dibe. Carînan bi navên farisî; ravza, riyâz û carînan di zimanê erebî de bi navê hediqe derbas dibe. Bexçe li gor cureyên kulîlkan navên cuda digirin. Wekî ku ji bexçeyê laleyan re lalezar, ji bexçeyên sunbûlan re sunbulzar tê gotin. Her çiqas ji beyarên ku bi çîmen kesk û kulîlkên bejî xemilandîne çemenzar bê gotin jî ji bo hemû xweşikî û delaliyên bax û bostanan jî çemenzar tê bikaranîn.

Di edebiyata klasîk de gelek bedewiyên ku dilber pê tîn teswîrkirin û şibandin taybetmendiyan bax û bexçeyan in. Dema ku mirov qala kulîlk û daran bike pêwîste ku mirov qala bax û bexçeyan jî bike. Helbestvan jî di malikên xwe de vê yekê dike. Xweşikî û bedewiya dilberê bi taybetî rû û gupikên wê dişibîne bax û bexçeyan. Bexçe gelek caran bi bihiştê re tîn yadkirin û bexçeyên bihiştê tînin bîra mirovan. Li gel bax û bexçeyên ku ji gulîstânê cuda tîn dîtin, di helbestan de qala baxê Îremê jî tê kirin. “Yek ji gulên ku di nav gulên cîhanê de tune ye “gula bihiştê” ye. Ew ji bo geşbûnê li benda demsala biharî namîne; havîn û zivistanan dikare geş bibe û qet naseride.”⁵⁴

⁵³ Pala; *Ansiklopedik Dîvan Şiiri Sözlüğü*, r. 473.

⁵⁴ Talip Çukurlu, *Divan Şairinin Gülistan/Gülzar/Gülşen Mefhumi*, *Journal of Turkish Language and Literature*, Hejmar 2, 2017, r. 80.

Bax û bexçeyên ku helbestvan di helbestên xwe de teswîr dikin sembola evîndar û dilberê ne. Di vî baxî de çem an ku ava ku diherike hêstirên çavên evîndar, kulîlk rû û bedewiyên dilberê, bilbil jî evîndarê dil bi kulîlkê dike. “Ji ber ku xemze û bijangên dilberê wekî tîr û xencerê di dilê evîndar de asê mane, dil û hinavên evîndar bi birînan pêçayî ye. Birînen girover ku bi xençer û tîran di sînga evîndar de vebûne, ji ber rengê xwe sînga evîndar veduguhêze bexçeyê gulan.”⁵⁵

Ev hêmanên ku reng û estetikîyê didine helbestan ji gelek unsurên mecazî û teswîran re jî bûne çavkanî. Bi taybetî di helbestan de bi teswîrên biharê derdikevine pêşberî me û weke hêmanên alîkar hatine bikaranîn.

Gulê baxê Îremê Buhtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im (Dilovan, 2013:273)

Di vê beytê de Mela herêma Botan şibandiye baxê bihiştê an ku welatê xwe weke bihiştê teswîr kiriye û xwe jî weke gula geş a vî baxî pênase kiriye. Di şevên tarî de xwe weke çiraya ku şevê ronî dide sembolarî kiriye. Wateya vê malikê pir kûr e, Mela dixwaze beje ku li halê min î perîşan û bêxwedî nenêrin ez di baxê botan de gula herî geş im û dema ku miletê min riya xwe şaş bike û wenda bibe bila berê xwe bide helbestên min. Ew dê di tarî û wendabûnê de weke çirayekê riya heqîqetê nîşanî wan bide.

2.3.1. Gulistan

Gulistan, gulzar û gulşen navê bexçeyên ku gul û kulîlk lê şîn tên. “Gulşen, gulistan û gulzar tenê ne bexçeyên gulan in, weke bexçeyê hemû kulîlk û bilbilan tên dîtin.”⁵⁶ Di helbesta klasîk de gulistan sembola bedewiyên yarê ne. Serwî bejn û balê, gul gupikan, xunce lêvan û sunbul porên yarê temsîl dikin. Lale qedeheke meyê ye ku bi destê dilberê tê pêşkeşkirin û evîndar ji mitala dinyayê xilas dike. Bi vî rengî hemû gulîlkên gulistanê bi yarê re hevîyek dibin.

Gulistan carînan ji bo dinyaya fanî û dewrana dinyayê jî tê sembolarî kirin. Ji ber ku bihar kine û payîz bi ser gulistanê de zû tê ev yek carînan ji aliyê helbestvanan ve bi emrê însan ve tê şibandin.

⁵⁵ Talip Çukurlu, *Divan Şairinin Gulistan/Gulzar/Gulşen Mefhumu*, r.79.

⁵⁶ Bayram; *Klasik Türk Şiirinde Duyguların Dili: Çiçekler*, r. 24.

Di vê tavê di vê xanê, 'eyş û êmînî kanê?
Kesê dest dit ji dewranê, nihalek vê gulîstanê (Dilovan, 2013:13)

Di vê rawestgeha rêwîyan de an ku di bin kubeya ezmên de wê kengî jiyîn û hêminî bi destê me bikeve, şaxegulek li vê dinyaya fanî bi destê kesî nakeve. Di vê malikê de Mela bal kişandîye ser temenê kin û dinyaya fanî. An ku kesek nikare bigihe meqsed û mîradên xwe. Kêşên ku meqsed û miradên xwe bi dest bixe jî ev yek ne demdirêj e. Mirov nikare bi vê yekê ewle be. Ji ber ku dinya fanî ye ev rewş dom nake. Dê weke dema bihara gulîstaneke ev yek kin be û dom nake. Di vê malikê de temenê însan weke dema bihara gulîstanê ku dom nake hatiye teswîrkirin.

Bi werdan zeyyînin gulşen, çîmen da lale bişkiftin
Binefş û çiçekan vêkra, şefeq da yek di rewde da (Dilovan, 2013:65)

Gulşen bi gulan xemilîn û li gulşenan lale bişkivîn. Binefş û çiçek bi hev re geş bûn û ronî vedan û şewqa wan li hev vegeyriya. Di vê malikê îstîfere heye. Mela rûye yarê, enî, zulf û xişlên wê bi gul û kulîlkan re daye teşbîhkirin û weke gulîstanê pêname kiriye.

Îro 'eqarib hate xwar, çû nêv-i baxê gul'izar
Ew bexçeya her lê bihar, lew bilbilan lê qal û şer (Dilovan, 2013: 94)

Îro dûpişkan xwe berda ser rûyê yarê ku rûyê wê bexçeyekî her demsal lê bihar e. Gul û çiçek ji wî rûyî kêr nabin û payîz lê peyda nabe. Lewra bilbil an ku evîndar her qala vî bexçeyî dîkin û li ser vê yara xweşik şer dîkin.

Di vê malikê de helbestvan bi awayekî hunermendane diyardeyeke xwezayê û rûyê dilbera xwe berawirdî hev kiriye. Li hemberî vê diyardeya xwezayê pesnê rûyê dîlberê hatiye dayîn. Mebest ji dûpişkan birca eqrebê ye. Ev birc di demsala payîzê de serwexte ku pelên dar û giyayan hişk dibin. Lê her ku birca eqrebê hatiye û gul û giya hişk bûnê lê rûyê yarê ji bihara xwe an ku ji bedewiya xwe tu tişt wenda nekiriye. Her wek xwe maye. An ku tu bandora demsala payîzê li ser rûyê yarê çênebûye.

2.3.2. Çîmen

Çîmen; bexçeyekî weke gulzar, gulşen, bax û bostana ye. Hêmana sereke û eslî ya çîmenê giyayê kesk e. Cihê seyr û temeşê ye. Gul kulîlka domdar a vî baxçeyî ye.

Çîmen bi gul û giyayên şîn û kesk xemilandiye. “Çîmen baxekî tijî nebatên kurt e û bi rengên kesk xemiliye.”⁵⁷ Çîmen bi taybetî ji bo teswîrên biharê derdikeve pêş û di helbestê de weke unsureke alîkar hatiye bikaranîn.

Nazika min ku bi mestî di çîmen hat û xiram
Ji hesed çûne xusûfê meh û mîhrê di felek (Dilovan, 2013:139)

Dema ku dilbera min a nazik û bedew li çîmenê xwe hejand û tewand, heyv û roj li ezmanan hatin girtin û dînya tarî bû. Ji ber ku heyv û roj mîna yara min ne bedew û rewnaq bûn hesûdî kirin.

Di vê malikê de ji hunerên edebî hunera mubalaxayê heye. Helbestvan dilbera xwe weke kulîlkeke baxê çîmenê teswîr kiriye. Heyv û rojê ji ber xweşikiya wê kîn û hesûdî kirine. Xwe veşartine û dînya tarî bûye.

Çendekî çîmen xurem bû, lê mudam ew subhedem bû
Min bi hiş Baxê Îrem bû, lê seba go min seba ye (Dilovan, 2013:188)

Ew çî çîmeneke pîroz bû. Weke berbanga serê sibehê bû. Ez fikirîm ku ew ne çîmen e. Baxê bihiştê ye baxê îremê ye. Lê bayê sibehê min ji xeyalan şiyar kir. Go na ew seba ye. Seba cih û welatê Belqisê ye û navê bayê sibehê ye di vê malikê de peyva seba bi du wateyan hatiye bikaranîn. Yek wateya nezîk bayê seba yek wateya dûr welatê Belqisê Seba lewra ji hunerên edebî tevriye hatiye bikaranîn. Di vê malikê de bi xweşikî û efsûniya xwe çîmena ku weke Baxê Îrem hatiye xeyal kirin jî dilber e.

Çîmena sultaniyê, yek laleyek baxê te bit
Gulşena xaqaniyê, xarek ji gulzarê te bî (Dilovan, 2013:222)

Bila Xwedê çîmena baxê sultaniyê bike tayek lale ji gulên bexçeyê te. Bila gulşena xaqaniyê jî di gulîstana te de bike stiriye.

Kulîlk vebûna yek laleyê li ser yek şitlê bûye sedem ku ew di helbesta klasîk de bibe sembola tiştên yekane û bi tenê. Helbestan dia û başkurî ji Xwedê re kirine da ku çîmena siltanan di gulîstana Mîr Şeref Xanê Cizîrê de bibe yek tayê laleye. Gulîstana hakaniyê jî di gulîstana wî de bibe stiriye kî kêm nîrx û bêbiha. Di vê malikê de lale wekî cureyekî ji kulîlkên gulîstanê bi sembola yekber û yekdayîya xwe

⁵⁷ Devellioğlu; *Osmanlıca- Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, r. 187.

hatiye bikaranîn. Di vê malikê de çîmen di wateya desthilatdarî û serweriyê de hatiye bikaranîn. Çîmen ji ber ku nîşaneyê sultaniyê û xwedî cureyên curbicur kulîlk e Mela dia ji Xwedê kirine ku çîmena sultaniyê bike tayek lale ji gulên bexçeyê Mîr Şeref Xanê Cizîrê re.

Di vê helbestê de kesê ku Mela medhîye jê re nivîsandiye û dia jê re kirine Mîr Şeref Xanê Cizîrê (Îmameddîn Beg) e. Mîr Şeref pirr qedr û qîmet daye Melê. Mela di bin hîmaya Xan Şeref de dîwana xwe nivîsandiye û pêşkeş kiriye. Her wiha Mela qatibî û şêwirmendiya Mîr kiriye.



3. AJAL DI DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

3.1. Balinde

Ji hemû ajalên ku difirin an ku ajalên xwedî bask in re balinde an jî teyr tê gotin. Di devok û zaravayên kurdî de gelek varyantên navên balindeyan hene. Ji wan re teyr û tûr, firrînde û çivîk jî tên gotin. Lê belê çivîk bi perên biçûk in ku navê xwe ji biçûkbûna xwe distînin. Teyr bi perên mezin in ku gelek celebên wan nêçîrvan in. Ji celebên wekî êlo, baz, başok û hwd. re teyrên seyfî tê gotin. Ev cure teyr dirinde û goştîxwer in. Balinde ne guhandar in an ku çêlikan nakin. Bi qirşûqalan hêlînên xwe amade dikin û di ser hêkên xwe de dibine kurk.

Ji beriya dîrokê heta niha têkiliya mirovan bi ajalan re çêbûye. Ev dîrok kengê an çi wextî destpê kiriye başebaş nayê zanîn. “Ji avabûna dinyayê û vir ve balinde ji bo mirovan bûne sedemên tirsê, rezgirtin û îlham girtinê.”⁵⁸ Di Qur'ana pîroz de jî gelek caran qala balindeyan tê kirin. Balindeyan hem di serdema Îslamê de hem jî di Serdema cehaletê ya beriya Îslamê de jî qedr û qîmet dîtine. Bi taybetî di serdema beriya îslamê de li gor deng û çiqên darên ku balindeyan li ser danîye wateyên cuda lê barkirine. Balinde ji bo fal vekirinê hatine bikaranîn.

Di mîtoloji û bawerîyên kurdan de jî balinde xwedî cihekî taybet in. Hin ji van balindeyan efsanewî ne, hin tirsdar hinek jî weke tawis pîroz hatine dîtin. Di edebiyata klasîk de jî gelek berhem li ser balindeyan hatine nivîsandin. Ji van berheman di serî de berhema Risâletü't-Tayr a ku ji hêla Xezalî ve hatî nivîsandin û Mantikut't-Tayr a ku ji hêla helbestvanê îranî Feridüddin Attâr ve hatîye nivîsandin tên. Di edebiyata tirkî de Mantiku't-Tayr a Gulşehrî, Lisânü't-Tay a Elî Şêr Nevaî, Ravzatü't-Tevhîd û Gul û Bilbil a Mehmed Arif tên zanîn.

Di edebiyata kurdî de jî bêguman Feqiyê Teyran gelekî tê nasîn. Dibêjin li vê dinyayê Hz. Silêman û Feqiyê Teyran ji zimanê çivîkan fêhm dikir û çawa ku mirov bi mirovan re diaxive, ev her du kes jî bi balindeyan re diaxivîn. Di nav gel de dibêjin heger Feqiyê Teyran dengê balindeyekî bibihîsta bê teredût dê bi kîlometreyan li pey biçûya. Da ku bi wî teyrî re biaxife.

⁵⁸ Ömür Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2007, r. 1.

Di edebiyata klasîk de balinde di hin cihan de bi navê murg ku farisî ye derbas dibe. “Dema ku peyva murg bi hin navên din re dibe yek cureyên balindeyan çêdike. Mînak murg-i çemen bilbil, murg-1 devlet humâ, murg-1 harem kevokê, murg-1 şeb-âvîz bûm û murg-1 ûştûr jî hêştirmê temsîl dike.”⁵⁹

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de behsa gelek balindeyan kiriye. Balinde ji beşeke girîng a xwezayê ne. Di helbesta klasîk a kurdî de têkiliya gul û bilbil yek ji teswîrên herî bijarte ne. Têkiliya evîndar û yarê rave dike. Cizîrî ji bo ku di helbestên xwe de hest û diyardeyên cihêreng bi bandortir îfade bike bi gelek cureyên balindeyan re mijûl bûye. Lê ji van balindeyan bêtir cih daye bilbil. Ji bilî vê yekê Cizîrî di helbestên xwe de cih daye balindeyên curbicur ên weke hudhud, nîmbismil, kund, tawis û hwd.

3.1.1. Silêmanê Dunikil

Ji silêmanê dunikil re dawudê dunikil û botbotîk jî tê gotin. Entresan e ku di her du varyantan de jî navên pêxemberan (dawud û suleyman a.s.) heye. Navê wî yê zanistî upupa epops e. Bi tirkî jê re îbîbîk an hudhud tê gotin. Taybetmendiya silêmanê dunikil a herî girîng di helbesta kurdî ya klasîk de hatiye bikaranîn. Ji ber ku di qiseya Hz. Suleyman de ev balinde qasidê Hz. Suleyman e. Dibêjin ku hudhud peyamnêrê Pêxember Suleyman bû û nameyên wî digihandin Belqîsa bajarê Sebayê. Di Qurana pîroz de jî qala vê meseleyê hatiye kirin. Lê belê di çand û edebiyata kurdî de balindeyê qasidan kevok in. Ji ber ku balindeyê qasidiyê kevok in, qasidiyan hudhud tenê bi qiseya Suleyman Pexember ve sinordar kiriye û di vê çarçoveyê de nirxandine.

Di nav balindeyên ku di helbesta klasîk de cih digirin taybetmendiya herî girîng a fîzyolojîk hebûna kumê vî balindeyî ye. Lewra ji vî balindeyî re silêmanê dunikil hatiye gotin. Xwedî dengê xweş e. Dengê wî ji dûr ve jî tê bihîstin. Ji bilî dengê xwe yî xweş çavên vî balindeyî jî gelekî baş dibînin. “Tê zanîn ku dîtina çavê wî di asteke bilind de ye. Lewma ji aliyê Pêxember Suleyman ve hatiye şandin da ku avê bibîne.”⁶⁰ Silêmanê dunikil pêşengî ji Suleyman pêxember re kiriye. Bûye alîkar

⁵⁹ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 20.

⁶⁰ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 126.

da ku ew di çolê de avê bibîne. Lewra ereban navê wê kiriye "hud hud" (li vê derê, li vê derê).

Melayê Cizîrî ji ber dengê wî yê xweş, peyamnêriyê û lez û çalakiya wî di helbestên xwe de cih daye silêmanê dunikil.

Îro ji me bedra tamam, enber feşan bin sed selam
Ey hudhudê şêrîn kelam, ehlen we sehlen merheba (Dilovan, 2013:21)

Silavan li yara ku rûyê wê weke hîva çardeşevî ye dikim. Sed silavên ku bîna enberê ji wan difûre. Ey hudhudê dengşêrîn tu ji ba yarê tê tu bi xêr hatî. Di vê malikê de Mela ji ber dengê wî yê xweş û peyamnêriya wî cih daye silêmanê dunikil. Ji ber ku hudhud ji ba yarê hatiye û peyam jê re aniye Mela kêfxweş bûye û xweş dengîya hudhud anîye ziman. Her wiha di vê malikê de du hunerên edebî întak û nîda hatine kirin. Di bêjeya "Ey hudhudê şêrîn kelam" de ey baneşan e. Lewra hunera nîdayê derdixê holê. Hudhud weke mirovan peyvşêrîn hatiye şayeserkirin. Di hunera întakê de jî ji bo xurtkirin û dewlemendkirina vegotinê hem tiştên bêcan û hem jî heywan dikarin mîna mirovan biaxivin. Her wiha di beyta duyemîn de di navbera selam û kelamê de hunera cînasê hatiye kirin.

We ye Hudhud ji Seba bêt û bizanîn çi ye hal
Ku li halê me xerîban ne sual û ne cewab (Dilovan, 2013:32)

Silêmanê dunikil dê ji sebayê were. Lê em ê nizanibin rewş ber bi qencyê ve an ber bi xerabiyê ve diçe. Ji ber ku kesek li halê me xerîban napirse an ku em xerîb gelekî bêqîmet û kêmtêne dîtin. Di vê malikê de jî helbestvan ji ber qasidiyê cih daye silêmanê dunikil. Bi peyamnêriya xwe derketiye pêşberî me. Seba welatê keybanû Belqis e ku ev hadîse di Quranê de derbas dibe. Dema ku di malikekê de du wateyên rastîn ên peyvekê hebin û ji herdû wateyan wateya nêzîk hatibe gotin lê mebest wateya dûr be hunera tevriyê çêdibe. Di vê malikê de jî seba an ku seher hatiye gotin. Lê mebest bajarê keybanû Belqis e. Her wiha ji ber ku qiseya Silêman pêxember bibîr dixê hunera telmîhê hatiye kirin. Bûyerek an kesekî ku ji aliye her kesî ve tê zanîn dema ku di helbestê de tê bibîrxistin ev hunera telmîhê pêk tîne.

Her wiha Hecî Qadirê Koyî jî di malika jêr de hudhud bi peyamnêriyê sembolîze kiriye.

Suleymanî zeman û şeyxulîslamî enam
Qasîdî rêgey hîdayet hudhudî dana debê(Koyî, 2004:50)

Hudhudek xweş teb'i min îro divê herwek nesîm
Da bi bal dilber hinara baniya dîsa cewab (Dilovan, 2013:39)

Ez îro hudhudekî tebîet xweş û weke bayê seherê bi lez û bez dixwazim. Da ku ez wî bişînim ba yarê. Da ku rewşa min a xirab jê re bêje û bersivekê ji min re werîne. Di vê malikê de jî Mela ji ber lez û çalakîyê cih daye hudhud an ku qasidekî wekî silêmanê dunikil bi lez xwestiye.

3.1.2. Nîmbismil

Nîmbismil balindeyeke ku dema difire xwe diqulibîne. Ji kesên nîv kuştî ku hêj nemirine di nav xwînê de diferfitin re tê gotin. "Balindeyê nîvserjêkirî, nîvkuştî ye."⁶¹ Di edebiyata klasîk de nîmbismil weke sembola aşîqê hêjar û reben gelekî hatiye bikaranîn.

Bi dama muhbetê bend im, xedenga firqetê dil nuht
Bi şubhê murxê nîmbismil, di hev wertêm di xwînê da (Dilovan, 2013:25)

Bi xefk û dava evînê êsîr û girtî me. Tîra xerîbîyê dilê min birîndar kiriye. Weke teyrê nîmbismil li hev diqulibim di nava xwînê de. Ji ber ku nîmbismil dema difire xwe diqulibîne weke kesên nîvkuştî ku diferfitin hatiye sembolîzekirin.

Şêx Ehmedê Xanî jî di malikeke xwe de nîmbismil di heman wateyê de bikar aniye û wiha dibêje:

Teşbîhê bi seydê nîm-bismil
Bêşubhê gihanê halê müşkil (Xanî, Dîwan)

3.1.3. Bilbil

Bilbil bi bedewiya deng û awaza xweş tê naskirin. "Bi Erebi navê wî "andelîb" û bi Farisî navê wî "hezâr" e. Di helbesta klasîk de mirov rastî herdu nava jî tê."⁶² Çûkekî bedena wî biçûk e. Bi lez û bez e. Awazên wî dewlemend û stranên wî xweş

⁶¹ Erdoğan Alparslan; *Ferhenga Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, Zanîngeha Dicleyê EZC, Diyarbakır, 2021, r. 265.

⁶² Ahmet Talat Onay; *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı*, Millî Eğitim Bakanlığı Yayınları, İstanbul 1996, r. 147.

in. Ji gul û nesrînan hez dike. Hin caran bêhemdê xwe li pelên gula diqelibe û dikeve. Li ber germê û bêaviyê bêsemax e. Agirê evînê hingê ku dilê wî dişewitîne, wisa tê hizirkirin ku ger saetekê avê venexwe dê bimire. Demsala ku herî zêde jê hez dike bihar e û dema gulan e. “Dema bibîne kesek gulekê jê dike feryad û fîxanê dike.”⁶³

Bilbil û edebiyata klasîk ji hev cuda nayên hizirkirin. Ew remza evîndarê yarê ye ku bi êşa dilê xwe digirî û dinale. Bi stranan her tim behsa bedewiyên yara xwe dike. Lewra bilbil remza evîndarîyê ye. Bilbil carinan evîndar bi xwe ye. Carinan giyanê evîndar û carinan dilê evîndar e. Bilbil evîndarê gulê tê hesibandin. Bi vê rewşa xwe gelekî dişibihe kesên evîndar. Her wiha dengê wî yê xweş wekî peyv û helbestên evîndar in. Çawa ku bilbil bê gul nabe aşiq jî bê maşuq nabe. Çawa ku stirên gulê kezeba bilbil diêşîne, eziyêtên yarê jî dilê evîndar kul dike. “Bilbil ji ber hezkirina gulê û ji ber êşa dûrbûna jî gulê, tim dixwîne. Bi heman awayî helbestvan jî xwe wek bilbil dibîne û dibêje ku ew jî wek bilbil bi êşa dûrbûnê bang dike û dixwîne û qet sebra wî nemaye.”⁶⁴ Bi kurtasî hemû taybetmendiyên bilbil di evîndar de mewcud in. Bilbil di berbanga sibehê de li hemberî gulê distire. Gulê ji bo bilbil pirtûkeke nû vekirîye. Dibêjî qey bilbil wê pirtûkê dixwîne. Hemû şahiya bilbil ji bo gulê ye. Dema ku ew ji gulê dûr dikeve, di nav nalînê de dimîne. Dema gulê dibîne mest dibe. “Gul ji bo nazê, bilbil ji bo nîyazê hatiye afirandin.”⁶⁵

Bilbil hêlînên xwe li baxçeyên gulan an jî li qadên şîn ên gir, di çiqilên daran û gulan de çêdikin. Da ku wan ji maran biparêzin. Wekî din marên ku ji hêlînên çûkan hez dikin dikarin bi hembêzkirina darên din bi hêsanî bigihên hêlînê. Ji ber vê sedemê bilbil dixwazin di nav gul û gulzaran de bijîn.

Di helbesta klasîk de bilbil gelek caran sembola evîndarê bê mirad e. Çawa ku bilbil evîndarê gulê ye û herdem ji bo gulê bi nalîn e, aşiq jî bi heman rengî her dem bi kul û hesreta dilberê ye. Lê aşiq, bilbilekî bêyom e. Her çiqas hewl bide jî nikare bigihêje armanca xwe. Her dem bi derd û keser e. Êsîrê rekeha ye. Hêmana herî zêde ku Cizîrî di helbestên xwe de bi kar anîye têkilîya gul û bilbil e. Gelek mînakên helbestan hene lê em ê tenê çend mînakên bidin:

⁶³ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 64.

⁶⁴ Aslanoğlu; *Gîya di Dîwana Şêx Ebdurrahman Aqtepe da*, r. 28.

⁶⁵ Pala; *Ansiklopedik Dîvan Şiiri Sözlüğü*, r. 77.

Sehergeh endelîp mest in ji bihna werd û bişkojan
Şubhê totak û goyînan dinalîn em di firqê da (Dilovan, 2013:25)

Bilbil ji ber bêhna gulên bişkiftî û yên hîn nebişkiftî di dema berî beyanê de serxweş û mest in. Em jî mîna tûtak û goyînan dinalin.

Bilbil di edebiyata Rojhilat de xwedî cihekî girîng e. Ji ber ku di dema pişkiftina gulan de ew bi awayekî xweş û zelaltir distire, tê hesibandin ku di navbera gul û bilbil de têkiliyeke evînê ya xeyalî heye. Bi vî awayî bilbil sembola evîndar, gul jî sembola dîlberê ye.

Ger çî bilbil cewhêrê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji işqa bulbul e (Dilovan, 2013:199)

Çendî heqîqet û çewhera bilbil gul be jî lê ew bedewî û şan û şerefa gulê ji ber evîna bilbil e. Çimkî gul dîlbera bilbil e.

Di helbesta klasîk de gelek peyvên ku bi têgeha bilbilê re peyda dibin hene. Bilbil hem di edebiyata Rojhilat de hem jî di edebiyata cîhanê de xwedî cihekî girîng e. Tê pejirandin ku di navbera bilbil û gulê de têkiliyeke evînê ya xeyalî heye. Ji ber ku bilbil di demsala biharê de dema ku gul dipîşkivin bi dengekî xweş û zelal dixulxul e.

Ev yek temsîla rewşa yar û evîndar dike. An ku xweşikiya gulê bi saya bilbil e. Ger ne ji bilbil ba dê qîmeta gulê ewqas nebûya.

Ji kovan letîfa gul'îzar, lew tîn ji bilbil ah hezar
Şûna gulan restîne xar, nîva cihê gulzarî çerx (Dilovan, 2013:78)

Piştî ku felekê ew ji gulzarê dûr xist strî li şûna gulan di şopa wê de şîn hatin. Bilbil hezar carî dixê axîn û nalîn bi hesreta yara şêrîn.

Li gorî mutasawifan bilbil sembola evîndarê ku bi dil û can ji bo evîna îlahî dişewite ye. Piştî ku bilbil ji gula xwe dûr dikeve bi hesreta dîlbera xwe dixê feryad û fixan. Di vê malikê de Mela biskên yarê şibandiye gulê. Evîndar an ku aşiq jî şibandiye bilbil. Mebest ji gulê rengê sor e. Dibe ku ji bo teswîra biskên yarê yên hinekirî bisk bi gulê hatibe şibandin.

Durî kirin ji sunbulan, çiçek û bişko û gulan
Dil me ji rengê bulbulan, şubhetê daxî lale kir (Dilovan, 2013:91)

Em dûrî gul û kulîlk û sunbulan kirin ku bisk û kezî û dev û lêvên yarê ne. Dilê me jî weke bilbilekî ku aşiqê gulê ye kewand û daxek lê danî.

Xuncleba ji rengê gulê, dêmê bi sir numa Melê
Şubhetê bulbulan seher, lew me fixan û nale kir (Dilovan, 2013:91)

Yara ku devê wê piçûk weke bişkoja gula û rûyê wê yê nazik weke şaxegulekê, rûyê xwe ji Mela re diyar kir ku tijî raz û şîrani ye. Loma me jî weke bilbilan nalîn û fixan kir. Xubçe ji aliyê helbestvanên klasîk ve ji bo teswîra devê dîlberê hatiye bikaranîn. Ev peyva ku ji bo kulîlkên ku hêj venebûne tê bikaranîn, di edebiyata tesewufê de sembola tazebûn û ciwaniyê ye. Di vê malikê de Mela bi peyva “xunclebe” devê yarê şibandiye gula ku hej venebûye û evîndar jî wekî bilbilê ku evîndarê gulê ye teswîr kiriye.

Îro eqarib hate xwar, çû nivê baxê gul’izar
Ew bexçeya her lê bihar, lew bilbilan lê qal û şer (Dilovan, 2013:94)

Îro dupişk daketin û çûne nivê bexçeyê gulên rûyan ên ku her demsal lê bihar e. Ji ber ku her demsal bihar e bilbin yanî aşiq daîm li ser wî bexçeyî şer dikin.

Li vir Mela bi hunereke bilind fonomeke xwezayê û rûyê yarê tîne ber hev û pesnê yara xwe bi awayekî gelekî edebî dide. Ew dibêje dema ku dinya dikeve burcê eqrebê êdî demsal dibe payîz. Pel û dar zer dibin û pelên xwe diweşînin û dar rût û tazî dibin. Lê rûyê yarê digel ku eqrep an ku biskê hunandî ketine ser rûyê wê jî dîsa weke xwe maye û bihara rûyê xweşik her geş maye. An ku demsalê tu guhertin di rûyê yarê de nekiriye û bilbil an ku aşiq jî her li ser xweşikiya yarê şer dikin.

3.1.4. Bûm

Bûm teyrêkî şevêder û goştîxwer e. Serê bûm li gora gewdê wî mezin û bi pirç e. Perên wan dirêj û fireh in lê boçikên wan kin in. Sehkirin û bînayîya çavên bûman pir dijwar e. Zayenda mê ji zayenda nêr girtir e. Bûm nêzîkî deh hêkan dike û di navbêra sî û çil rojan li ser hêkan kurk dimîne. Bûmê ku êvarê û berbangê derdikeve nêçîrê, ajalên ku nêçîr dike di xew de wan digire. “Bûm dikare bikeve hêlîna her

balindeyekî û hêk û çêlikên wî bixwe. Lê belê bi roj ji ber ku çavên wan nabînin rastî erîşa balindeyên din dibin û ji wan re dibin nêçîr.”⁶⁶

Di hin devokên kurdî de ji bûm re kund an kundê kor tê gotin. Di edebiyata klasîk de bi navê tûtak û goyîn derbas dibe. Çavên wî gelekî mezin in. Lê ji ber ku bi şev nêçîrê dike û bi roj nabîne jê re dibêjin kundê kor. Bûm cihên kavi, bêhis û goristanan ji xwe re dixwe mesken. Di nav gel de balindeyekî bêyom tê dîtin. Li gor bawerîyê bûm li ser banê kîjan malê deyne dê mirî ji wê malê derkeve.

Sedema ku kund bêyom hatiye nîşandan ew e ku dema ku lawê Keyûmers Sîyamek li çiyayê demawendê ji aliyê Dêw û Hevrîdan ve tê kuştin hayê Keyûmers jê tune bû. Lê dilê wî diqilqilî û ditengijî, ji bo ku saloxekê ji lawê xwe Sîyamek bîne dide rê û berê xwe dide çiyayê demawendê. Li ser rîya xwe rastî kundekî tê, kund çend caran dixwîne û difire. Bi xwendina kund re Keyûmers gumanê dibe ser tiştên qewimî û dema digihêje çiyayê demawendê dibîne lawê wî Sîyamek hatiye kuştin. Kuştina lawê xwe bi xwendina kund re girêdide û nifirên negotî li kund dike. Ew roj ev roj e navê bêyomiyê dikeve histûyê bûm.

Bûm cureyekî balindeyan e ku bi wêranbûna xwe tê naskirin. Bi vî awayî di wêjeyê de cih girtiye. “Bûm bi wêranbûnê tê bîranîn û weke hêmaneke nifiran tê bikaranîn.”⁶⁷ Evîndarên ku ji yarê rû nabîne weke bûm kavilan ji xwe re dixwe mesken.

Sehergeh ‘endelib mestin, ji bêhna werd û bişkojan
Şûbhê tûtak û goyînan, dinalîn em di ferqê da (Dilovan, 2013:25)

Şeveqan bilbil ji ber bêhna gul û bişkojan an ku gulên nebişkiftî serxweş in. Lê em jî weke bûman dinalin. Tûtak ji kesên bextreş re jî tê gotin. Helbestvan di evînê de ji ber ku xwe bextreş dîtiye xwe dişibîne bûman. Tûtak ji kesên bextreş re jî tê gotin. Helbestvan di evînê de xwe bextreş dîtiye ku xwe şibandiye bûman. Çimkî bûm di edebiyata klasîk de sembola bêsiûdî û wêranîyê ye. Di malikê de bûm û bilbil hatine berawirdkirin. Bilbil di berbangê de bi yara xwe şa dibe. Lê em ji yara xwe dûr in lewra wekî goyîn û bûman her dinalin.

⁶⁶ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r . 52.

⁶⁷ Mehmet Çavuşoğlu; *Necâti Bey Divânı'nın Tahlili*, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 1971, r. 265.

3.1.5 Teyrê Tawis

Teyrê tawis bi perên xwe yên rengîn tê nasîn. Gelekî rengîn e û zahf xweşik û bi xeml e. Di devokên kurdî de jê re “teyrê tawis, teyrê tawus, teyrê tawiz”⁶⁸ tê gotin. Bi latîni navê wî balindeyî *Pavo cristatus* e. Li Kurdistanê, Hindistan û heta Çînê an ku li welatên asyayê tên dîtin. Wexta ku perê xwe vedike û hildide jor, mîna yekpareyekê ye. Li ser her perekî wî weke ku çavek hebe heye. Bi vê rengînî, xeml û xweşikiya xwe gelekî balê dikşîne.

Di çand û mîtolojiya kurdan de gelek taybetmendiyên teyrê tawis ên cuda û pîroz hene. Di bawerîya kevnar a Ezdîyatîyê de teyrê tawus semboleke dînî û pîroz e. Teyrê Tawus sembola Melekê Tawus e. Ji ber vê pîroziya teyrê tawus, di çanda kurdan de gelek tefsîr û wate li perên wî hatine kirin. Nexşên tawis hatine çêkirin û bi dîwarê malan ve hatiye daleqandin.

Tawus bi perên xwe yên dirêj û bi rengên balkêş ên li ser perên xwe navdar e. “Di helbesta klasîk de bi bedewiya xwe gelek caran behsa tawis tê kirin.”⁶⁹ Tawis bi perên xwe yên rengîn û bi şikl û bedewiya xwe bûye mijara helbestê. Di edebiyata klasîk de bi bedewiya xwe ya şêrîn bûye sembola evîna evîndaran.

Cewrê Hindê dê kişînit, her kesê Tawus divêt
Gewher û durra yetîm, bê terkê ser têtin teleb? (Dilovan, 2013:36)

Mela di vê malikê de balkişandiye ser biqîmetbûna tawis. Dibêje her kesê ku bixwaze bibe xwediye tawis divê zehmetî û dijiwariya riya Hîndîstanê bide ber çavên xwe. Ma gelo bêtî zehmetî û cefayê mirov dikarê cewheran bi dest bixe. An ku helbestvan ji bo tiştên bi qîmet tawis bi kar aniye. Ji ber ku welatê tawis Hîndistan e û tawis kêmtê dîtin. Dibe ku mela di vir de behsa evîna îlahî jî kiribe. “Di beyta yekem da Mela evîna îlahî dişibîne teyrê Tawus.”⁷⁰ Çawa ku mirovê bixwaze xwe ragihîne hezkirina Xwedayî divê xwe li ber dijiwarî û zehmetiyan bigire. An ku mirovên ku daxwazkarê hezkirina Xwedayî ye divê bizanibe ku di vê riyê de gelek

⁶⁸ Zana Farqînî; *Ferhenga kurdî-tirkî-kurdî*. Enstîtuya Kurdî ya Stembolê, Stenbol, 2011, r. 66.

⁶⁹ Pala; *Ansiklopedik Dîwan Şiiri Sözlüğü*, r. 456.

⁷⁰ Yasin Duran; Berawirda Şîretên Ku Di Helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî De Derbas Dibin, *Kurdîyat, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Hejmar 3, Van, 2021, r. 108.

zor û zehmetî û dijwarî hene. Evîna ku Mela behsê kiriye evîneke zahmet û dijwar û kêmsal e. Ji bo şayesandina vê evîna kêmsal helbestvan di rista duyem de “durra yetîm” bi kar aniye. Ew şibandiye durra bêheval. Her wiha ji ber ku dura yetîm hem tê wateya rastîn hem jî ji ber ku dîlber pê hatiye şibandin û tê wateya mecazî jî di edebiyatê de ji vê yekê re hunera îstixamê tê gotin.

3.1.6. Qijik

Di helbesta klasîk de balinde, bi hêzbûn, awaz, nêçîrvanî, bedewî û nebedewî bûne remzên helbestan. Qijik di helbestê de bi piranî remza nebedewbûnê îfade dike. Di helbesta klasîk de bi navên zax û xurab tê bikaranîn. Ji ber ku laşê mirî û nesaxan dixwe û kedî nabe di helbestê de remza nebaşîyê ye. Her wiha li gel vê yekê remz û sembola diz û kambaxiyê ye. “Qijik wekî sembola gunehkarî, xapandin, çavbirçîtî, çavnebarî û wekî ajaleke dizek tê dîtin.”⁷¹ Qişik jî wekî bûmê kor balindeyeke sembola bêyomîyê ye. “Qişik, bi rengê xwe yê reş û dengê xwe yê gemar, sembola xebera ne bi xêrê ye.”⁷² Qişik bi piranî di helbestê de qemariyê temsîl dike. Ji ber gemara xwe rikeber bi qijikê tê şibandin. Qijik xwedîyê rengê reş û dengê kirêt e. Ji ber vê yekê, rikeberê ku tê xwestin ku bê rûreşkirin bi qijikê tê wekandin. Wekî evîndar bilbil tê pêşberî qijikê û di cihê yarê de jî gul tê bikaranîn.

Ref ref nehiştin zaxi zax danîn li dil min daxi dax
Dê kî bimînit saxi sax westane leşker sef bi sef (Dilovan, 2013:130)

Qijikên reş, qumrî nehiştin ew kuştin ref bi ref. Di dilê min de dax da. Ma gelo ji van qumrîyan kî sax dimîne ku leşker wisa rêz bi rêz sekinîne? Yanî kesek sax namîne. Di vê malikê de ji ber rengê xwe yê reşê tarî cilên yaran bi qijikan hatiye şibandin an ku mebest ji qijikan yarên kinc reş in. Yarên bi cilên reş xemilandî, êrîşî koma evîndaran kirin. Hemû ji holê rakirin û kesek sax nehiştin. Van yaran bi kirinên xwe yên hov dilê me daxek lê danîn. Bi agirê hesret û xemgîniyê dilê me şewitandin.

Ez dibêim axir zeman e, dê qiyamet rabitin
Lew şeva tarî kişandî û nehişt eswed xurab (Dilovan, 2013:38)

⁷¹ İbrahim Demirkazık; Divan Şiirinde Karga, *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi*, Hejmar 24, İstanbul, 2011, r. 131-178.

⁷² Muhammet Fatih Demirdağ; “Alevi-Bektaşî Şiirinde Kuş Mitolojisi”, *Külliyat Osmanlı Araştırmaları Dergisi*, Hejmar 2, 2017, r. 14.

Ez dibêm dawiya dinyayê ye, tofan e û qiyamet dê rabe. Lewra şev tîr û tarî bûye û ji qijikan jî şev tarîtir bûye. Ji ber ku reşê qijikê sembola tofan û xeberên nexweş e Mela di helbestê de cih daye vê yekê. Rengê reş ê qijikê bi agahiyên nexweş ve girêdayîye.

Can dê nedit ew malxerab her sîneê cotek xurab
Tê da birin pence'w kulab wê can di dest wê rûh di kef (Dilovan, 2013:38)

Evîndarê ku her kêlî û saetê du qijik bi laprûşk û pençeyên xwe dilê wî diqelişînin, mala wî kavil dibe, êdî ew çawa dikare rihê xwe teslîm neke. Di nav pençên qijikekê de canê evîndar di nav pençên din de jî rihê evîndar heye.

Evîndarê ku mala wî wêran bûye, maye çerm û hestî nikare edî rihê xwe teslîm neke. Ji ber van qijikên ku her kêlî bi laprûşkên xwe xwînê ji dil tînin evîndar wê çawa karibe bijî? Di vê malikê de her du qijik du keziyên yarê ne. Ji ber reşayiya porên yarê ew bi qijikan hatiye şayesandin. Her wiha di vê malikê de ji bo bala xwendekar bê kişandin bêyî ku li benda bersivdayîna kesekî be pirsek hatiye kirin. Lewra ev yek mînaka hunera îstifxamê ye.

3.1.7. Huma

Navê vî teyrî bi farisî hûma, bi erebî “bulah” e. “Siya vî teyrî bikeve ser kê dibe xwediyê dewletê.”⁷³ Lewra ji vî teyrî re teyrê dewletê tê gotin. “Humayê ku weke teyrê dewletê tê naskirin tê bawerkirin ku bextewarî û saadetê tîne.”⁷⁴ Cihê ku ew lê dijî bi qasî ku hişê mirov negire û çavê mirov nabîne bilind û di firehiyek bêşînor de hatiye pêşbînîkirin. Dema ku çil zendî nêzî erdê dibe siya wî bikeve ser kî ew kes dibe siltan an jî kesekî pir dewlemend. Balindeyekî pîroz e ku lingên wî tune ne. Zîrarê nade kesî û sax nayê dîtin. “Sembola bext, serwerî, qencî û bihuştê ye.”⁷⁵

Huma ji ber ku bi hêsanî nayê dîtin û siya wî bikeve ser kî ew kes dibe siltan. Di edebiyata klasîk de yar pê tê şibandin. Ji ber ku yar rû nade evîndar lê dema ku rû dide evîndarê xwe jî wî li dinyayê dixê kesê herî bextewar. Di edebiyata me de wekî simbola halxweşî, dewlemendî, hêz û bextewariyê tê dîtin.

⁷³ Bahattin Ögel; *Türk Mitolojisi II*, Türk Tarih Kurumu Basımevi, Ankara, 1996, r. 276.

⁷⁴ H. Dilek Batıslam; “Divan Şiirinin Mitolojik Kuşları: Hümâ, Anka ve Simurg”, *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi*, Hejmar 1, İstanbul, 2008, r. 187.

⁷⁵ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 117.

Saye numayê cebhetê neqş û xetê ji qudretê
Nuqte û herf û cezme tê bal û perên humayê zulf (Dilovan, 2013:127)

Zulfa ku neqşeke ji qudreta ezêlî ye, siyê davêje ser enîyê, ew mîna bask û perîkên teyrê Huma ye di şiklê nuqte û herfan e. Mela di vê malikê de zulfên yarê şibandiye huma ku siya zulfan weke siya teyrê hûma ketiye ser enîyê.

Zulf di helbesta klasîk de yek ji hêmana ku pirr zêde tê bikaranîn û hêmana bingeîn a bedewiyê ye. Helbestvanan ji bo teswîra zulfên dîlberan gelek hêmanên teşbîhê ên wekî sunbul, reyhan, binefş, mar, şev, ewr û qijik bi kar anîne. Lê dema mirov li vê malikê dinêrê zulfên yarê bi hêmaneke neasayî ve hatiye şibandin. Ev yek nîşaneyê hunerwerîya helbestvan e. Mela di vê malikê de zulfên yarê şibandiye teyrê huma. Siya zulfan weke siya teyrê hûma ketiye ser enîyê. Lewra ev teşbîh mîna keke nûwaze ye.

Her dilê bazîsîfet, dê seydê teyxûnek we bî
Firr û perwazê humayî, penceyê şungari bit (Dilovan, 2013:45)

Her dilê ku xwedî xasîtiya teyrêbaz e bêguman wê bibe nêçîra cewhera te, perwaz û firîna teyrê dewletê ya huma wê di nav laprûşkên şûnkar de biqede.

Mela di vê malikê de kesên pozbilind şibandine teyrê huma. An ku kesên ku xwe weke huma bêhempa dibînin xwe di ser mirov re dibînin Xwedê wî bike êsîrê şungar ku balindeyekî nêçîrvan e. Gelekî mezin û bi pençe ye.

Bi umîda te humayê ne Melê torî veda
Wer temaşeyê cîhan bûye hemî tor û şebek (Dilovan, 2013:140)

Ey teyrê huma! Ne tenê Mela tora xwe yan ku xefka xwe vedaye da ku te nêçîr bike. Were binêre hemû dinya an ku gelek kesan tor û xefk vedane. Da ku te ji xwe re nêçîr bikin. Di vir de huma yar e. Mela dibêje evîndarê te tenê ne ez im. Gelek kes te ji xwe re dixwazin. Ji ber ku huma hêsan peyda nabe û bi qedr û qîmet tê dîtin Mela jî yara xwe şibandiye teyrê huma. Ji ber ku yar ji bo wî giranbiha û tekane ye.

3.1.8. Teyrê Sîmir

Koka navê teyrê sîmir digihe zimanî îbranî ku tê wateye dewekî gerdendirêj. Sîmir di zimanê kevin ê Avestayî de bi navê Mərəyo Saêna û di sanskrîtî de jî bi navê śyena derbas dibe ku tê wateya balindeyekî mezin. Teyrekî efsûnî ye. Ev teyr di

efsane û çîrokan de derbas dibe. Çîyayê Elburzê cih û warî vî teyrî ye. Ev çîya dibe ku çîyayên Zagrosan bin. Ji ber ku di çîrokên ereban de Aryane welatê sîmir e. Aryane jî Kurdistana îro ye û carînan jî cih û warê sîmir çîyayê Qafê ye. Li gor erdnîgariya ereban çîyayê Qafê dikeve rojhilatê ereban lewra di erebî de qaf tê wateya rojhilat an ku tê wateya çîyayên rojhilat. Ji ber ku Zagros jî li erdnîgariya rojhilatê ereban cih digrin bi îhtimaleke mezin ev çîya Zagros in.

Di metnên edebî de sîmir bi navê anka û zûmrûdûanka jî derbas dibe. Ji ber ku bi qasî sî çûkî mezin e yan xwedî taybetmendî û rengê sî çûkî ye navê sîmurg lê hatiye kirin an kusî teyr. Sî+mir û sî+murg di zimanên îranî de tên wateya balinde û teyr. Tê bawerkirin ku sîmir ji hemû balindeyan mezintir e. Hêkên wî bi qasî çîyayan mezin in û bi çeng û lapûşkên xwe dikare filekî hilde ezman.

Teyrê sîmurg balindeyekî zahf xweşik û pir reng e lewra jê re teyrê sî reng jî hatiye gotin. Di nav gel de sîmir weke balindeyê mirinê jî tê dîtin. Ji ber ku sîmir teyrêkî pîroz e dibêjin wateye sî+mir ji mirinê tê. Di zemanên kevin de hatiye bawerkirin ku sîmir giyanên mirovan biriye bihûştê. Li heremên kurdan li ser hinek tehtên gorên kevin mirov rastî sembolên teyrê sîmir dibe. “Li gor rîwayetan tê gotin ku sîmir çûkekî kesk e û dişibihe çûkê bihûştê.”⁷⁶

Ji ber ku sîmir teyrêkî efsûnî û rengîn e û taybetmendiyan hemû balindeyan dihevine û her tim bilind difire. Di helbestên klasîk de gelekî derbas bûye. Helbestvanan gelek caran yara xwe bi bedewî û pozbilindiyê şibandiye sîmir. Girtin û bidestxistina sîmir ji ber ku nepêkane di helbestan de evîndar dûrîdestiya yara xwe bi dûrîdestiya sîmir şibihandiye.

Enqa ne şîkarê kes e davan tu biçîn ver
Dava ku li enqa vedî, badi hewa girt (Dilovan, 2013:47)

Mela di vê malikê de yara xwe bi teyrê sîmir şibandiye dibê kesek nikare sîmir zem bike û ji xwe re bike nêçîr. Yan ji ber ku sîmir teyrêkî efsûnî ye ku tune ye yan ji ber ku teyrêkî pir bilind û xurt e. Lewra kesên ku here nêçîra sîmir dê dest vala vegere enaq hewa bikeve xefka wî.

⁷⁶ Musa Tektaş; *Muhabbet Gülleri*, Nasihat Yayınları, Ankara, 2006, r. 160.

3.1.9. Kew

Kew balindeyeke bi bedana xwe hinekî ji kevokê girovertir û mezintir e. Li serzemîna Ewropa, Bakurê Efrîka û li Asyayê dijî. Bi gelemperî rengê wî boz û qehweyê vekirîye, pî û niklê wî sor e, dûvê wî kin e. Bi gelemperî li erdê dijî. Bizirk û kêzikan dixwe. Dengê wî pir xweş e û balindeyekî bi şiklê xwe xweşik e. Ji ber goştê wî tê nêçîrkin.

Gelek cureyên vî balindeyî hene. Lê cûreyê ku li erdnîgariya kurdan herî zêde tê dîtin kewê gozel e. Ji vî cureyî re ‘alectoris chukar kurdestanica’ an ku kewê kurdan jî tê gotin. Ev kew li hemû erdnîgariya kurdan tê dîtin. Lê zahftirîn serhed cih û meskenê wî ye. Di çand û baweriya kurdan de kewê gozel xwedî cihekî taybet e. Li gor çanda kurdan kewê gozel sembola hijêkirina yekalî ye. Wateye wî ya herî girîng ji bo kurdan hemû kes neyarê kew e û kew jî neyarê qewmê xwe ye.

Di edebiyata klasîk de bi navê kebk derbas dibe. “Kewê ku di helbesta klasîk de bi navê kebk derbas dibe bi meşa xwe ya narîn, bi sîfatên xweş-reftar, xweş-hiram, nazende û hwd tê yadkirin.”⁷⁷ Di helbestên klasîk de bi wateyên erênî derdikeve pêşberî me. Taybetmendiya meşa wî, dengê wî yê xweş û ji ber sedema ku tê nêçîrkin di helbestan de bûye mijara metaforan.

Ew kebkê xeraman ku di kozê li qebû hat
Şahîne qedayê bi texaful ji xwe re girt (Dilovan, 2013:48)

Mela di vê malikê de kew ji ber ku tê nêçîrkin weke meteforekê bi kar aniye. Ew kewê ku di meşê de pozbilind û ji xwe bawer e dema ku bi qebeqeb tê cihê nêçîrê, heya wî jê nîn e û dibe nêçîr ji şahîne qederê re. Di vê malikê de Mela însan şibandine kew. Heya mirov ji mirov tune, li ser xwe ye û dibe nêçîr ji ferîşteyê mirinê re. Hafîzê Şîrazî jî di helbesteke xwe de nêzîkî vê helbesta Cizîrî malikek nivîsandiye:

Didî an qehqeheê kebkî xeraman hafîz!
Kî zî ser pençeê şahîne qeda xafil bûd.

Ma te ne dît ey Hafîz! Çawa ku kewê pozbilind qebeqeb dikir. Ew kewê ku heya wî ji naprokê şahîne qederê tune bû. Lê ew şahîn hat wî bir û ji xwe re kire

⁷⁷ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 162.

nêçîr. Helbesta Cizîrî û Hafîz gelekî nêzî hev in. Herduyan jî kew di heman metefor û wateyê de bi kar anîne.

3.1.10. Kevok

Kevok bi navê kebûter û qumrî jî di helbestên klasîk de derbas dibe. Balindeyekî li gorî serê xwe xwediyê bedeneke mezin û girover û gewr e. “Ji kevoka biçûk re qumrî tê gotin.”⁷⁸ Ji ber ku wek balindeyê postager tê naskirin bûye teyrekî bijarte di helbestên klasîk de. Di zemanên kevin de peyamên ku dihatin nivîsandin bi piyê kevokê ve dihatin girêdan û şandin. Bi vî awayî kevokê erka postaya îro pêk tanî. Ji ber ku ji cihên dûr dûsa vedigere mal û hêlîna xwe weke teyrekî jîr û dilsoz tê naskirin. “Kevok di çanda Îslamê de sembola aşî û pakiyê ye.”⁷⁹

Li gorî rîwayetê Nebî Nuh piştî tofanê sê caran kevok şiyandiye bejayiyê. Da ku bizanibe ka av vekîşiyaye an na. Kevok di cara pêşî de cihekî nabîne da ku li ser deyne. Cara duyemîn bi katikeke zeytûnê di devê xwe de vedigere (ev tê wê wateyê ku ava ku li ser rûyê erdê ye kêm bûye û ketiye asta serê daran). Nebî Nûh piştî heftiyekê careke din kevokê bi rê dike. Vê carê kevok venagere, tê fêmkirin ku av vekîşiyaye û erd zuwa bûye. Piştî ku kevok venagere Nebî Nûh û ajalên di keştiyê de ji keştiyê peya dibin.

Pêxemberê Îslamê dema ku li çiyayê Sewrê di şikeftê de xwe vaşartîye du kevok li ser dara devê şikeftê helina xwe çêdikin û hêkan dikan. Bi saya kevokan muşrik guman nakin ku pêxember di şikeftê de ye. Lewra kevok di rola rizgarkerê Pêxemberê Îslamê de ye. Lewra kevok ji bo mislimanan xwedî cihekî taybet e. Her wiha kevok yek ji wan çar çûkane ku Pêxember Brahîm bi emrê Xweda ew serjê kirine.

Kevokê di helbesta klasîk de weke qasid û nêçîra baz cih girtiye. “Kevoka ku weke balindeyê tê nêçîrkirin tê zanîn di helbesta klasîk de weke postager hatiye xeyalkirin û bi yarê ve hatiye têkildarkirin”⁸⁰ Melayê Cizîrî jî di helbestên xwe de cih daye kevokê û ev balinde weke sembola bêgunehî ku dibe nêçîra baz bi kar aniye.

⁷⁸ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 99.

⁷⁹ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 108.

⁸⁰ Pala; *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 277.

Ew dilê min wek kebûter, nabitin kes lewme kit
Lew di vê torê we dakeftî me dîn sed şahînbaz (Dilovan, 2013:100)

Mela di vê malikê de dilê xwe şibandiye kevoka bêhêz ku dibe nêçîra baz. Dibêje kes nikare gazinc û loma ji min bike. Dilê min ketiye xefka evînê. Ji ber ku ne ez tenê me gelek kesên weke bazan xurt û bihêz jî ketine xefka evînê û jê rizgar nebûne.

Di helbesta klasîk de kevok sembola pêtî, aşî û bêhêzîyê ye. Baz jî sembola hêz û îhtîşamê ye. Mela di vê malikê de dilê xwe şibandiye kevoka bêhêz ku dibe nêçîra baz. Çawa ku kevok li hemberî baz bêhêz e jî lê kesên wekî baz xurt jî wekî kevokê dibine êsîrê evînê.

Netrîk û berg û şetrîyan, reqse ji rengê xemriyan
Baz û 'uqab û qumriyan, seyr e seher tebayê zulf (Dilovan, 2013:127)

Helbestvan di vê malikê de kevok ji ber meşa wê bi kar aniye. Di malikê de nazikiyek heye. Baz, êlo û kevok bi hev re hatine bikaranîn. Xişlên yarê dihejin weke reqsa xemrîyan û di seherê de weke êlo, baz û kevokan dimeşin.

3.1.11. Qaz

Qaz balindeyên avî ne. Gelek cureyên wan hene. “Qazên koçer di wêjeya gelêrî ya Anatolyayê de cihekî girîng digirin.”⁸¹ Di helbesta klasîk de qaz bi navê bet jî derbas dibe. Bet cûreyên komên qazên mezin in. Gelekî rast û bi lez difirin. Qaz piranî di helbesta klasîk de bi werdek û qazqulingê re cih digire. Wekî hêmana şibandinê tê bikaranîn. Di hin helbestan de weke xemla xwezayî ya golan tê nirxandin.

Qaz ji ber ku balindeyekî avî ye û nêçîra xwe bi noqên kamîkazî ji nav avê derdixe di helbesta klasîk de sembola çavên di nav rondikan de xeniqîyî û dilê noqî deryaya evîn û xwînê ye. Melayê Cizîrî jî di beyta jêr de qaz bi heman simbolê bi kar aniye.

Xûn ku ji dil bi mewci bêt, eşkê rewan me tene xet
Nîli ji dîdeyan dizêt, keftime navê şubhê bet (Dilovan, 2013:122)

⁸¹ Ögel; *Türk Mitolojisi II*, r. 551.

Mela di vê malikê de rondikên ku ji ber êşa evînê ji çavan diherikin şibandiye çemê Nîla Misrê. Xwe jî weke qazeke ku di nav de avjenîyê dike pênase kiriye.

Cobar direwan in, çimenan terhi ciwan in
Mestane bi ref ref li kenaran sî û qaz in (Dilovan, 2013:154)

Rûbar diherikin, çîmen şîn û geş bûne mest bûne refên sî û qazan li kenarên rûbaran. Di vê malikê de tesfîra demsala biharê hatiye kirin. Bi hatina biharê çîmen bişkîfîne û bûye firefîra qaz û werdekan. Lê Mela ev yek ne bi hatina biharê ve bi hatina yarê ve girêdaye lewra ji hûnerên edebî hûnera hûsnû talîlê bi kar anîye.

3.1.12. Teyrêbaz

Teyrêbaz yek ji balindeyên seyffî ye ku nêçîra çûk û mişkan dike. “Baz balindeyekî nêçîrvan e ku beriya nêçîrê di sitûyê wî de zengilek heye û bi dest ve girêdayî ye.”⁸² Carînan çavên wî jî girê didin. Gelekî bilind difire. Tenê ji bo nêçîrê dadikeve erdê. Laşê mirî naxwe. Ji bo ku bilîse cihên bilind tercîh dike û li cihê kaviş û wêran danayne. Ev balindeyê nêçîrvan di edebiyata klasîk de bi navê baz, şahîn û şahîbaz jî derbas dibe. Teyrêbaz xwedî perên dirêj û laşekî zexm e. Ji ber ku şaha pê nêçîr kiriye jê re şahêbaz jî hatiye gotin.

Teyrêbaz xwedî nikilekî ber bi jêr ve gungilî ye. Demekî dirêj dikare li hewayê sekinî bimîne û cihê nêçîra xwe tespît bike. “Teyrekî dirinde û nêçîrvane. Bi tûjbûna awirên çavên xwe nêçîra xwe bi lezgînî digire.”⁸³

Baz sembola hêz û îhtîşamê ye. Di helbestê de bi piranî ji ber ku balindeyekî nêçîrvane hatiye bikaranîn. Di nav helbesta klasîk de teyrêbaz jî ber bêrehmî, dirindeyî û bilind firîne hêmaneke ku yar bi van sîfetên wî hatiye şibandin.

Di çarçoveya têkiliya nêçîr û nêçîrvan de weke evîndar û yar hatiye sembolîzekirin. Mela di malika jêr de baz weke sembola hêz û qewetê bi kar anîye.

Ew dilê min wek kebûter, nabitin kes lewme kit
Lew di vê torê we dakeftî me dîn sed şahînbaz (Dilovan, 2013:101)

⁸² Pala; Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü, r. 70.

⁸³ Hulusi Gürbüz; "Everekli Seyranî Divanında "Kuşlar", *Turkish Studies*, Hejmar 6, 2014, r. 495.

Baz remza jîr, keleş û çalakbûnê ye. Mela di vê malikê de dilê xwe şibandiye kevoka bêhêz ku dibe nêçîra baz. Dibêje kes nikare gazinc û loma ji min bike ku dilê min ketiye xefka evînê. Ji ber ku ne ez tenê me gelek kesên weke bazan xurt û bihêz jî ketine xefka evînê û jê rizgar nebûne.

Ferre 'eqîlî min lehî bî, misle bazin ew 'uqab
Zabe rûhî, mislema inhelle fî narin celîd (Dilovan, 2013:87)

Di vê malikê de baz ji ber lêz û beza xwe bi elo re hatiye bikaranîn. Hişê min weke baz û teyrekî ji ber êşa dilê min firiya û rihê min mîna qeşa û cemedê ku di agir de bihelin heliya. Çimkî baz di firînê de ajalekî pir çalak e. Ji bo dijiwariya êşa dil taybetmendiyeke teyrêbaz hatiye bikaranîn. Êşa evînê hişê min wekî bazekî bi lez ji serê min bir. Ji ber êşa evînê dil û hinavên min wekî qeşaya li ber agir heliyan.

Her dilê bazîsîfet, dê seydê teyxûnek we bî
Firr û perwazê humayî, penceyê şungari bit (Dilovan, 2013:45)

Her dilê ku xwedî xasîtiya teyrêbaz e bêguman wê bibe nêçîra cewhera te. Perwaz û firîna teyrê dewletê yê huma wê di nav laprûşkên şûnkar de biqede.

Her çiqas dilê her evîndarekî di warê berxwedanê de mîna bazekî hov be jî bi hêsanî neyê bidestxistin. Dê rojekê bibe nêçîr ji nêçîrvanekî. Çimkî huma bi ku ve biçe bila biçe di dawiyê de dibe nêçîra şungar ku balindeyê herî dirinde ye. An ku kesên ku li ber evîna we li ber xwe didin Xwedê wan ji we re bike nêçîr.

Evîn di vê helbestê de bi baz evîndar jî bi şungar hatiye şibandin. Evîna ku weke teyrêbaz di fermana te de be û xwe bibîne û serî bikîşîne li ber hezkirina te Xwedê wê bike nêçîra şungar ku balindeyekî nêçîrvan e gelekî mezin û bi pençe ye.

3.1.13. Goyîn

Goyîn balindeyekî weke kevokê ye. Lê belê dengê wî mîna nalînê ye. Cudahiya goyînan a ji kevokan a eşkere xetîkên berqirka wan û dengê wan e. Di devokên kurdî de ji goyînan re kotirî, koter, kebokurk û qumrî jî tê gotin. “Di erebî bi navê qumrî derbas dibe, cureyekî çûkane ku ji kevokê piçûktir e.”⁸⁴ Di zimanê tirkî de jê re ûveyîk kuşu tê gotin. Di farisî de bi peyvên kârâsi, kâlince, mâsuçe, mûsiçe

⁸⁴ Ferit Devellioğlu; *Osmanlıca- Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Yayınları, Ankara, 2009, r. 527.

derbas dibe. Goyîn bi lez difîrin. Goyînên mê hêlînên xwe hildibijêrin û monogam in. Ew bi dilsoziya xwe ya ji bo hevserên xwe têne naskirin. Tê gotin ku dema yek ji hevjinan dimire, yê din heta dawiya jiyana xwe bi goyîneke din re nazewice. Ji ber vê yekê jiyana goyînê piştî mirina hevserê wê bi êş û elem derbas dibe. “Hestên wan yên dilovanî pir dijwar in. Ew tenê ne ji hevserên xwe re, ji çêlîkên xwe re jî pir dilovan têne nasîn.”⁸⁵ Bi dengê xwe yî weke nalînê di helbesta klasîk de sembola evîndarê bi êş û elem e.

Mislê goyîn te rewan nale ji dilê miskînî tîn
Em nizanin tu çira her we dinalî şeb û rûz (Dilovan, 2013:105)

Çima tu şev û roj weke goyîn dinalî ey Mela! Ji dilê te weke ava rewan nalîn tîn weke nalîna goyînan. Lê belê em nizanin bê tu ji ber çi sedeman bi şev û roj dinalî. Mela êş û elem û feryad û fixanên xwe bi goyîn şayesandiye ku ev balinde bi nalînên xwe binavûdeng e.

Şubih şem' û şemal im ez, ji ber hubba te lal im ez
Ze'îf im wek hîlal im ez, sifetgoyîn dikalim ez (Dilovan, 2013:254)

Ji ber evîna te bêziman bûme. Weke mûmê dişewitim û dihelim. Weke heyva yekşevî lewaz û jar im. Mîna goyînan feryad û fixanê dikim. Di vê malikê de jî goyîn sembola feryad û fixan û nalînê ye.

Ji kovana te şêrînê, dinalim şubhê Goyînê
Dirêjim hêstirên xwînê, wekî tavê di baranê (Dilovan, 2013:229)

Ey yara Şêrîn ez ji ber bêrîkîra te weke teyrê goyîn tim û tim dinalim. Rondikên min mîna tavana baranê bixwîn diherikin.

Çîroka Ferhat û Şîrîn di nav mijarên mesnewiyên edebiyata Îranê de xwedî cihekî girîng e. Çîroka ku bi navê Husrev û Şîrîn jî tê naskirin. Ev çîrok di edebiyata klasîk de yek ji wan mesnewiyên ku herî zêde lê hatiye şuxulandin. Lewra di vê malikê de hunera tevriyê heye. Ji ber ku helbestvan bi peyva şêrîn hem yar hem jî Şêrîna yara Ferhad aniye ziman.

⁸⁵ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 172.

3.1.14. Tûtî

Di helbesta klasîk de yek ji balindeyên ku bûye hêmana şibandinê jî tûtî ye. Tûtî di gelek helbestan de bûye remz û sembola zimanşêrînê û zarxweşîyê. Di zimanê tirkî de papağan jê re tê gotin. Tûtî xwarinên şîrîn ên wekî şekir dixwin. Tê bawerkirin ku eger avê vexwin dê bimirin. Di nav gel de tê gotin ku ji ber ku herî zêde dema tûya xuya dikin û ji tûya pir hez dikin ji wan re tûtî an jî tûtî hatiye gotin.

Xasîtiya tûtî ya herî naskirî, qabiliyeta zarîkirina zimanê mirovan e. Ji ber vê qabiliyetê di qefesan de tîr xwedîkirin. “Ji bo tûtî hînî axaftinê bikin eyne tê bikaranîn. Kesê ku dixwaze tûtî hînî axaftinê bike diçe pişt eynê û diaxife. Tûtî jî dibe qey çûke û teqlîda wî dike.”⁸⁶ Ji bo ku tûtî bikaribe hînî axaftinê bibe şekir pê didine xwarin. Tê bawerkirin ji ber ku şekir xwariye, peyvên şêrîn û xweş ji devê wî derdikevin. Lewra bi piranî di helbestê de bi zimanxweşîyê hatiye teswîrkirin. Helbestvanan zimanxweşîya yara xwe şibandine tûtî.

Xweşheramê ez xulamê nazikê şêrînkêlamê
Tûtîya eywanmeqamê dil ji min bir dil ji min (Dilovan, 2013:170)

Ewa ku meşa wê bi tinazî û pirr nazik e dilê min heland. Ew a nazik û terhîn û şêrînpeyv ku cihê wê û meqamê wê eywana bilind e dilê min heland.

Di vê helbestê de bi gotina “Tûtîya eywanmeqamê” helbestvan hem tûtî wek sembola dîlberê û tebîeta wê weke zimanê tûtî ku sembola bedewbûnêye şayesandiye.

Her wiha helbestvanê sedsala 18an Weda’î jî nezîkî malika Mela di malîkekê de xasîtiyên dîlberê bi tûtî şayeser kirine.

Tûtîya tib’etşeker îro li xergahê me dî
Dê fîda kem can û dil ça’xê ku reftarî diket (Dereşî, 2012:48)

3.1.15. Qertel

Qertal di hin devokên kurdî de bi navên elo, eylo, daraş, hêlû û teyrê belek jî tê naskirin. Di zimanê erebî de nesr û uqab jê re tê gotin lewra di hin malikan de bi navê uqab derbas dibe. Ji malbata balindeyên nêçîrvan balindeyê herî mezin e û

⁸⁶ Pala; *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 474.

sembola hêz, qewet û heybetê ye. “Ev teyrê ku demeke dirêj dikare li ezmanan bimînê, helîna xwe jî li cihê bilind avadike. Awirên wan jî pir dijwar in.”⁸⁷ Qertel bi mezinahî û awir dijiwariya xwe tê naskirin û herweha di edebiyata klasîk de yek ji wan hêmana ye ku gelekî hatiye bikaranîn. Qertel ajalekî ker û lal û temendirêj e. Qertelê ku nêçîrvanekî baş e bi hêsanî tu nêçîr nikare xwe ji destên wî rizgar bike. Ev taybetmendiya qertel bûye sedem ku dilber pê were şibandin.

Cinnî teyyarek me dî werbû di min winda kirim
Dame ber penc û kulaban, hilfirandim wek ‘uqab (Dilovan, 2013:39)

Cinekî ku difire li min peyde bû. Ez di bin baskên xwe de veşartim û ez dam ber şeqam û penceyan. Ez weke qertelekî hilfirandim ezmên. Di vê malikê de qertel ji ber hêz û qeweta wî hatiye bikaranîn. Ew cinê firoker wekî qertelekî hatiye teswîrkirin.

Netrik û berg û şetriyan, reqse ji rengê xemriyan
Baz û ‘uqab û qumriyan, seyr e seher tebayê zulf (Dilovan, 2013:127)

Di vê malikê de di nav baz û qertel û qumrî de hevahengek heye. Lewra ji hunera tenasûbê re mînaekeke xweş û balkeş e.

3.2. Ajalên Çar Ling ên Bejî

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de cih daye gelek ajalan. Ji van ajalan hin jê balinde hin jê ajalên avî û hin jî ajalên çar ling in ku li bejayîyê dijîn. Ji bo wate û hestên cuda Mela di helbestên xwe de ajalên weke şêr, xezal, waşaq û hwd. bi kar anîne. Di vê binbêşê de em ê ji van ajalên bejî ku di helbestên Mela de derbas dibin çend mînanan bidin.

3.2.1. Şêr

Şêr an ku bi navê zanistî *Panthera leo* cûreyekî ajalan. Ji malbata pisîkên mezin e. Li hin cihên Başûrê Asyayê û li parzemînê Efrîqayê dijîn. “Şêr ajalekî bi eslê xwe Efrîkî ye ku bi temberî û bi qewet e.”⁸⁸ Di edebiyata klasîk de bi navê esed û eslan jî derbas dibe.

⁸⁷ Ceylan; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, r. 150.

⁸⁸ İsmail Parlatır; *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, Yargı Yayınevi, Ankara, 2016, r. 101.

Li gor bawerî û kevneşopiya Elewîyan dema ku Pêxemberê Îslamê li ser rêya Mîracê ye, dema ku digihêje erşê, şerek derdikeve pêşiya wî û rêya wî digire. Pêxember jî gustîla tiliya xwe derdixe û ji şêr re tavêje. Şêr gustîlê dixê devê xwe û ji riya wî derdikeve. Roja din dema Pêxember vedigere û qala Mîracê dike. Hz. Elî gustîlê ji devê xwe derdixe û dide Pêxember. Piştî vê bûyerê ji Hz. Elî re “Esed’ullah, Şêrê Yezdân, Şêrê Xwedâ” hatiye gotin. Lewra di edebiyata klasîk de gelek caran navê Hz. Elî û şêr bi hev re hatiye bikaranîn.

Di helbestan de şêr sembola hêz û qewetê ye. Lapûşkên şêr hêmaya ku yar dikare her tiştî bike îfade dike. Di helbestan de şêr û xezal jî bi hev re hatine bikaranîn. Sedema ku xezal û şêr jî bi hev re tên bikaranîn ew e ku çavên yarê weke yên xezalê xweşik û wek çavên şêran bi heşmet tên teswîrkirin. Melayê Cizîrî jî di helbestên xwe de çavên yarê şibandiye şêran.

Zulf çûne ser nûra zelal, carek were bayê şîmal
Bîskan ji ser dêmê vemal, zulfan ji ber cotê esed (Dilovan, 2013:89)

Ey bayê kur were ji ser rûyê yarê ku nûr jê dibare, zulfan vemale. Zulfên ku li ber çavên yarê ne an ku zulfên ku nahêlin ez çavên yarê bibînim bide alî. Şêr di edebiyata klasîk de sembola hêz, îhtîşam û heybetê ye. Lewra Mela di vê malikê de herdu çavên yarê bi heybetî şibandine du şêran.

Ala û tayên qurmizîn, eslen di ber daberrişîn
Nêrgiz di baxan tewwizîn, neyşekeran nîşan e reqs (Dilovan, 2013:115)

Di vê malikê de ji bo sifeta çavên yarê eslan hatiye bikaranîn. Aslan navê şêr ê bi zimanê tirkî ye. Ji ber ku şêr ajalekî dirinde û bi heybet e û di dilê mirovan de hesta tirs û rêzgirtinê hişyar dike. Helbestvan çav û awirên yarê bi şêr teswîr kirine.

Qewsê du hîlalan ku li ser burcê esed bî
Bû şuhre di’amê, ‘emel enguştî numa girt (Dilovan, 2013:49)

Her du birhên yarê weke du hîvan in. Mîna ku li ser birca şêr bin. Hînga ku ev çav û birh binavûdeng in di bedewiyê de gel bi tiliyan wê dilberê nîşanî hev dide. Birca şêr yek ji bircên astronomîk e ku bîst û heft stêran di nava xwe de dihevin. Ji ber ku ev stêr di teşeya şêr de ne ji vê bircê re birca şêr hatiye gotin. Mela rûyê yarê bi birca şêr şibandiye. Herdu birhên wê jî weke heyva nû teswîr kiriye. Gengaz e ku mebest ji birca şêr çavên dilberê be. Birhên hîlalî yên li ser çavan weke şêran in.

3.2.2. Weşek

Weşek an werşeq cureyekî ajala ye. Ji malbata pisîkên mezin e û goştîxwer e. Weşek ji pisîka malê mezintir û ji piling piçûktir e. Eyarê wê pir saxlem û zexm e. Ji ber eyarê xwe tê nêçîrkirin. Cîl û keresteyên ku ji eyarê wê tên çêkirin giranbiha ne. Eyarê wê bi pirç e û pirça wî nerm e. Li gorî rîvayetê, amûrên şer ên wekî tîr, şûr û rimê tu bandorê li eyarê weşeqê nakin. Lewra ji postê vî ajalî zirx hatine çêkirin. Qaşo kesên ku vî zirxî li xwe dikin, di nav agir de naşewitin û di avê de naxeniqin.

Dîlbera min seherê, hatî bi tox û bi yedek
Sed yedek bûn di berê, tîkî bi sîncab û weşek (Dilovan, 2013:130)

Di berbanga sibê de yara min tevî ala û hespên yedek hat. Di pêşiya wê de sed hespên ku bi postên weşeqan zînkirî bûn dimeşîyan. Mela di vê malikê de ji ber ku eyarê weşeqê kêmtir dîtî û giranbiha ye hespê yarê yê pêzînkirî teswîr kiriye.

3.2.3. Ga

Ji ga re di hin devokên kurdî de conega jî tê gotin. Zayenda wî nêr e. Ji zayenda mê re çêlek tê gotin. Li gorî baweriyeke kevin, dinya li ser qiloçên ga sekiniye. Ji vî gayî re gamasî tê gotin. Ev ga li ser piştî masiyekê ye û masî di nav avê de ye. Salê carekê ga dinyayê ji ser qiloçekê xwe dideyne ser qiloçên din. Lewra erdhêj diqewimin. “Di encama ser hejandina vî gayî de erdhej û zelzele çêdibin.”⁸⁹

Beriya şoreşa pîşesaziyê ji ber ku coht û çandinî bi ga dihate kirin di çanda kurdan de ga weke sembola hêz û qewetê jî tê dîtin.

Xalibê ehlê zemanî Mela ademî yin?
Vanumayîn ji kerê mey reş û gayê te yê beş (Dilovan, 2013:113)

Mela ev malik ji ayetekê wergirtiye. Kesên ku li vê dinyayê dane pey kêf û sefayê ew weke kerên reş in. Şêxên xapînok û sexte ku ji bo mal û milkê dinyayê şîretan li civakê dikin jî weke gayê beş hatine simbolîzekirin.

⁸⁹ Pala; *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 32.

3.2.4. Sihor

Gelek cins û cureyên sihoran hene. Di devok û heremên kurdî de jê re sihorîk, sivorî, sihorik, simore, çekeloz, pilûr û hwd. tê gotin. Sihor ji gûz û berûya pir hez dike. Havîn û payîzan ji bo zivistanê kara xwe dike lewra gûz û berûyan vedişêre.

Di edebiyata klasîk de sihor ji bo temsîliyeta taybetmendiyên mirovan hatiye bikaranîn. Mela ji ber ku eyarê wî bi pirç û nerm e bi weşek re di malikekê de bi kar anîye.

Dîlbera min seherê, hatî bi tox û bi yedek
Sed yedek bûn di berê, têkî bi sîncab û weşek (Dilovan, 2013:136)

Di berbanga sibê de yara min tevî ala û hespên yedek hat. Di pêşiya wê de sed hespên ku bi postên sihor û weşeqan zînkirî bûn dimeşîyan. Mela di vê malikê de ji ber ku eyarê sihor û weşeqê kêmtê dîtî û giranbiha ye hespê yarê pê zînkirî teswîr kiriye.

3.2.5. Hesp

Hesp ajalekî xurt û zexm e. Di devokên kurdî de estor jî jê re tê gotin. Di helbestên klasîk de bi navên ferse û semend jî derbas dibe. Hesp di çand û jiyana kurdan de xwedî cihekî girîng e. Di jiyana kurdan de weke weseyîteke riyên dûr hatiye bikaranîn. Kurdan gelek kar û barê xwe bi hespan kirine. “Hesp ajaleke kedîye ku ji bo bar û siwarbûnê tê xwedîkirin.”⁹⁰

Ji ber ku di mîtolojî û baweriyên kurdan de hesp xwedî cihekî taybet e di edebiyata klasîk de jî hatiye bikaranîn. Hesp yek ji lehengê sereke yê destana Rustemê Zal û destana Derwêşê Evdî ye. Ji xeynî destan û çîrokên kurda hesp di gelek berhemên navdar de jî hatiye bahskirin. Di berhema navdar ya Evlîya Çelebî de ji bo hesp “eşref-i mahlûkat” hatiye gotin. Melayê Cizîrî jî di helbestên xwe de ji bo hin sembolan hesp bi kar anîye.

Min go mihê new, çaşîneyê ebrûyê yar î
Go min çi hed e, şubhetê ne’lê feres im (Dilovan, 2013:96)

⁹⁰ Parlatır; *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, r. 113.

Min ji heyva yekşevî pîrsî di nazikî û xweşikiyê de tu ne weke birhên yara min î? Ew ê got çî hedê min e ku ez weke yara te xweşik û nazik bim. Ez encaq bibim nalê bin pîyê hespê wê. Mela di vê malikê de rasterast hesp bi kar neaniye. Ji bo kêmbûnê nalê binê piyê hesp bi kar aniye. An ku helbestvan nalê bin piyê hesp ji bo mubalaxayê bi kar aniye. Her wiha di vê malikê de hunera întaqê heye. Mela ji bo xurtkirin û dewlemendkirina vegotinê heyva nejîndar weke mirovan daye axaftin. Hafîzê Şîrazî jî nêzî vê wateyê di malika jêr de mubalaxa bi nalê hespê kiriye.

Hilal ta kî meger ne'lê merhebeş girde de
Zi bamê 'erş-i sedeş bûse ber turab zede

Hîva yekşevî sed carî ji ser banê felekê axa binê nalê yarê maç kiriye. Ji bo ku ji binê piyê hespê wê re bibe nal.

Van rehrewên himmetbilind, berdane meydanê semend
Ser keşte bîn hette bi çend, ev rekbê meşxeldarê çerx (Dilovan, 2013:81)

Evan rêwiyên daxwazbilind hespên xwe berdane qadan. Ev rêwî gihane meqsed û miradên xwe. Lewra hespên xwe azad kirine. Lê heya me ji tiştêkî nîne an ku felekê em bi dinyayê ve mijûl kirine lê heta kengî em dê meşxelderê vê dinya fanî bin? Mela bi peyva rêwiyên himmetbilind behsa kesên ku li pey şopa evîna îlahîne dike. Kesen ku riya wan evîna îlahî ye gihane meqsed û miradên xwe û hespên xwe azad berdane. Melê ji bo ku bala xwînêr bikşîne û hest û ramanan bibandortir bike fikr û ramana xwe di şiklê pîrsê de dane. Lewra ev yek ji hunera îstîfhamê re mîna keke xweşik e.

3.2.6. Ker

Di edebiyata klasîk de bi navên har, himar û merkep jî derbas dibe. Ev ajal ji bo barhîlanînê û siwarbûnê tê bikaranîn. “Ker, merkeb ajala bikêr a ji bo bar û siwarbûnê ye.”⁹¹ Ker di nav civakê de baş nayê ditîn û di helbesta klasîk de ji bo sembolên neyînî hatiye bikaranîn.

Di edebiyata klasîk de car caran ji ber efsane û meseleyan behsa kerê tê kirin. Yek ji van meseleyan bûyera ketina kerê dema di tofanê de li keştiya Nebî Nûh siwar dibe. Dema tofan nû dest pê dike Nebî Nûh bi tiliya xwe keştiyê nîşanî ajalan dide û

⁹¹ Parlatır; *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, r. 419.

bi dorê hemû ajal li keştiyê siwar dibin. Dema ku dor tê kerê ew li keştiyê siwar nabe. Her çiqas Nebî Nûh hewl dide lê ew dîsa jî nakeve hûndir. Lê sedema ku nakeve hûndir şeytan bi dûvê wî ve asê mayê û ew nahêle. Nebî Nûh hêrs dibe û dibêje de bikeve hûndir ey naletî! Dema wisa dibêje ker siwarî keştiyê dibe. Dema tofan diqewime Nûh, şeytan di keştiyê de dibîne û şaş dimîne. Jê dipirse tu çawa û bi destûra kî li keştiya min siwar bûyî. Ew jî dibêje dema te got bikeve hûndir ey melûn, ez jî ketime hûndir. Ma qey ji min pê ve melûn hene.

Ker di helbestên klasîk de sembola nezanî û ehmeqîyê ye. Helbestvanan ji bo kesên ehmeq û nezan hêmana kerê bi kar anîne.

Tu ji fêslê here eslê ku divê dêrê xerab
Da nebî merkebê cehlê tu di bin barê hudus (Dilovan, 2013:64)

Tu baş li kokê an ku li rastiye vekole û dev ji şaxê berde. Zanibe ku her tişt fanî ye. Tişteki mayînde li vê dinyayê tune ye. Van tiştan baş bizanibe da ku tu di bin barê hebûne de nebî kerê cehlê. Helbestvan kesên cahil û nezan şibandiye kerê.

Xebais teb'e jahil seg sirişt e
Yeqîn ew ker ji canan lew dîkî bîz (Dilovan, 2013:104)

Cira kesê cahil û tebîeta wî weke ya şeytanên mê ye. Xulqeta wî weke ya segan e. Yeqîn ke ew ker e, xwe ji canan dûr dike. Di vê malikê de helbestvan kesên ehmeq bi kerê şibandiye.

Xalibê ehlê zemanî Mela ademî yin?
Vanumayîn ji kerê mey reş û gayê te yê beş (Dilovan, 2013:112)

Mela ev malik ji ayetekê wergirtiye. Kesên ku li vê dinyayê dane pey kêf û sefayê ew weke kerên reş in. An ku kesên gunehkar ku axreta xwe nafikirin weke kerên ehmeq hatine pênasekirin.

3.2.7. Xezal

Xezal ajaleke guhandar û bi qiloç e. Li çol û çiyayan dijî. Pir bi lez û bez e. Lewra nêçîrkirina wê pir zehmet e. Ajaleke paq zirav û pir narîn e. Di helbestên klasîk de carînan bi navê “ahû” derbas dibe. Taybetmendiyeke xezalê ew e ku ji zikê wê bêhneke xweş peyde dibe ku jê misk tê çêkirin. Ji ber vê bêhna xweş di helbestan de têkiliyek di navbera gul û xezalê de hatiye çêkirin. Carînan helbestvan bêhna pora

yarê bi bêhna xezalê tesfîr kiriye. Xezal ji ber ku nêçîra wê zahmet e û ajaleke sil e bi riya kînaye bi yara sext ve, ji ber kubariya çavên xwe çavên yarê bi çavên xezalê û bi sedema bêhnxeşîya xwe bêhnxeşîya yarê pê hatiye şibandin. “Xezal bi mezinî û xweşikiya çavên xwe di helbestê de hatiye bikaranîn.”⁹² Xezal bi mezinahî û reşîya çavên xwe bûye sembola yarê. “Aşiq bedewî û tirsonekiya yara xwe şibandiye xezalê”.⁹³

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de vecînoqî û xweşikiya çavên yarê bi xezalên şibandiye.

Dil ji min bir dilberek zîbaqeba
Çehvxezal û purşepal û mehlîqa (Dilovan, 2013:299)

Mela di vê beytê de dibêje; Dil ji min bir dîlbereke fîstansipehî çavên wê weke yên xezalê xweşik, purşepal û rûhîv. Mela di vê beytê de çavên dilbera xwe şibandiye çavên xezalê. Rûyê dîlbera xwe jî şibandiye heyvê.

Dizanim şehsiwarê min, xezalek wê di fitrakê
Bi cayê seyde ez bûma, di wê fitrak û bendê da (Dilovan, 2013:26)

Ez zanim yara min, sultana min şaha siwaran e. Xezaleke ku hatiye nêçîrkirin ketiye xefkê de. Lê xwezî ez di dewsa wê de hatibame nêçîrkirin. Ez ketibame xefk û bendan de. Di vê malikê de xezal ji ber ku tê nêçîrkirin yar bi xezalê hatiye şibandin.

Canê xwe me kir daneê dema ku vedayî
Ahû sîfet ew pê hesiya, rahê xeta girt (Dilovan, 2013:47)

Canê xwe me kir dane da ku em pê xezalê nêçîr bikin. Lê dema ku xezal hate ber xefkê û çav li rihê me ket, weke xezalekê tirsîya û da ser welatê Xetayê. Ew nebû nesîbê me, em jê bêpar man. Di vê malikê de Mela ji ber ku xezal ajaleke sil û tirsoneke û vedicinîqe yara sil bi xezalê simbolîze kiriye.

3.2.8. Fîl

Di nav ajalên bejayî de ajala herî gir û mezin fîl e. Li cîhanê du cure fîl hene. Fîlên Efrîqayî û fîlên Hîndîstanê. Fîlên Efrîqayî bi term û cismên xwe ji fîlên Hîndîstanê gîstir û bilintir in. Fîlên Hîndîstanê ji demên kevin ve hatine kedîkirin.

⁹² Onay; *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı*, r. 91.

⁹³ Pala; *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 24.

Di barkêşî û cengan de hatine bikaranîn. “Fîl ajaleke wehşî û qerase ye ku li herêmên germ ên wekî Hîndistan û Efrîkayê dijîn.”⁹⁴ Fîl ajalekî xwedî gewdêyekî gir û bi qewet e. Xurtumeke wê yî dirêj heye ku bi vê xurtuma xwe dikare daran ji kok rake.

Fîl di edebiyata klasîk de ji ber qewet û hêza xwe hatiye bikaranîn. Lewra di helbesta klasîk de sembola hêz, qewet û desthilatdarîyê ye. Melayê Cizîrî di helbestên xwe de cih daye fîl û diranên filan “ac” û weke hêmaneke şibandinê bi kar aniye.

Bendî kirim gerçî şubhê filî bûm
Simî berê, sa’îd û bazû ji’ac (Dilovan, 2013:67)

Herger ez bi qasî filekî bi hêz û qewet jî bim, wê yara ku sîngên wê weke zîv in û zend û bendê wê weke diranê filan şewq didin û diteyisin ez dil girtime. Ez bûme esîrê xweşikiya yarê û ez hatime girêdan. Mela ji ber hêz û qewetê fîl bi kar aniye. Ji ber ku ajaleke pir xurt û bi qewet e. Diranê filê jî “ac” ji ber ku zêde spî ne sîng û berê yarê pê hatine şayesandin.

Hetta bi nûra badeyê, rengîn nekî siccadeyê
Dûr î ji wê şehzadeyê, durdaneya gerden ji ‘ac (Dilovan, 2013:69)

Heta ku tu sicadeya nimêjê bi meyê rengîn nekî, tu yê ji wê xatuna keça şah a gerdena wê weke dinanê fila spî dûr bimînî. Di vê malikê de gerdena spî bi diranê filan hatiye şibandin.

Neyşekera gerden ji ac, dîsa ji reştozên semed
Qewsên li bala ferq û tac, keyber reşandin bê ‘ ebed (Dilovan, 2013:89)

Neyşekera ku qerdena wê mîna diranê filan spî ye, ji birhên reş ên Îlahî, bêserûber û bêhed tîr li min reşandin. Di vê malikê de jî gerdena dîlberê bi diranê filan hatiye şibandin. Ji ber ku diranê filan spî û dirêj in.

Ger çî li ber derd û cefan filî bûm
Bêmefer ez matî kirim, şahî û fil (Dilovan, 2013:143)

Ku ez li ber derbe û cefayan bi qendê fil qerase bûm, lê niha şah û fil pêşiya min girtine û ez nikarim tev bigerim. Di vê malikê de mebest ji fil hem şibandina ajalê qerase ye hem jî kevîrê santrancê ye ku di lîstika santrancê de çeprast tevdigere.

⁹⁴ Parlatır, *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, r. 467.

3.2.9. Seg

Seg binecureyekî ji malbata guran e ku ajalekî kedî ye. Di devokên zimanê kurdî de jê re seg, sipek, kutik, se û kûçik tê gotin. Gelek cureyên wan hene. Ji bo nêçîrê û şivantiyê tên bikaranîn. Ji segê şivanan re sepandî, ji yê nêçîrê tûle tê gotin. Ji sega mê re dêlik û ji çêlkên wan re cewr tê gotin.

Seg di nav kurdan de ji bo ewlehîya mal û pez tê xwedîkirin. “Seg ji bo parastina mal û pez û nêçîrê tê bikaranîn, ajalek e ku bi dilsozîyê tê naskirin.”⁹⁵ Di çanda kurdan de seg ajaleke ku kêr hatiye dîtîn û gelek caran behsa wî bi nêçîrê re hatiye kirin.

Di helbestên klasîk de bi navê tûle, seg û kelb derbas dibe. Her ku seg ajalekî nêçîrê ye, ji bilî nêçîrê di wateya heqaret û şermezarkirinê de hatiye bikaranîn. Her çiqas bi dilsozîyê navdar jî be di edebiyata klasîk de bi wateyên neyînî cih girtiye.

Bi tûlê asîtanê ra, vexwendim, mîr bi dergahê
Bi vî çavî hebîb dîtîm, şukir ev şefqê mewlê da (Dilovan, 2013:27)

Yarê ez vexwendim dergahê li gel segên nêçîrê an ku yarê min weke segan hesiband ez weke seg dîtîm. Spas ji Xwedê re ku bi çavên segan jî be min yar dît. Di vê malikê de seg di wateya kêrîyê de hatiye bikaranîn. Di vê malikê de hûnera berzîkirin, mubalaxa û teşbîhê heye.

Li qelbê asîtanê xwe, nepirsî hebîb carek
Gelo naêne bîrê em, di vê nêçîr û ravê de (Dilovan, 2013:25)

Yarê qet careke tenê jî pîrsa segê devê deriyê xwe nekir û em careke jî nehatine bîra wê. Dema çû nêçîrê em qet nehatine hişê wê ku seg jî bi xwe re bibe nêçîrê. Seg ji ber ku di nêçîrê de tê bikaranîn di vê malikê de evîndar pê hatiye şibandin. An ku evîndar ji bo ku bi yarê re dem derbas bike qîma xwe bi seyîfî jî anîye. Xwe li ber evînê weke seg xwe kêr hesibandîye. Mebest ji seg nefspîçûkî û xwe kêmdîtîn e.

Dergehê lutfî te xanim, ma li mehrûman vebî?
Înne kelben basiten dehren zîra' en bi l-wesîd (Dilovan, 2013:87)

⁹⁵ Parlatır; *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, r. 925.

Di vê malikê de hûnera îktîbasê heye Mela ji ayeta 18an ji sûreya el-kehfê risteyek daye ji bo wateya helbestê xurt bike. Ger deriyê te li me kesên belengaz vebe dê çi bibe ey xanim! Ji ber ku ev kes weke segan li ber deriyê te veketiye. Ji ber ku di sûreya el-kehfê de segek bi sedan sala li ber deriyê şikeftê li benda xwediyê xwe maye bûye sembola wefadarî û disozîyê. Lewra di vê malikê de helbestvan ji bo hestê xurt bike ev bûyer bibîr xistiye. Her wiha ev malik ji hunera telmîhê re mîna keke nuwaze ye.

Te tenê zewq û sefa kir, bi seyê dilberê ra
Sernixûn ke şubê nûn, geh weku dalê şeb û rûz (Dilovan, 2013:105)

Te tenê kêf û zewq û sefa kir bi segên dîlberê ra. De here secde serê xwe bitewîne weke tîpa nûn carna jî weke tîpa nûn bikeve rewşa rûkuyê bi şev û roj. Ji ber ku ev nîmet bûye qîsmet û nesîbê te. Di vê malikê de hûnera mubalaxayê heye. Evîndar bi segên yarê re kefxweş û şad bûye. An ku her çendî seg kêr were dîtin jî ku seg, segê yarê be cihê şanazî û bextewariyê ye.

3.2.10. Piling

Piling ji malbata pisîkan e. Li welatên Başûrê Asyayê dijîn. Ajalekî dirinde û bihêz e. Ev ajal pir nêçîrvan e. Bi hêsanî tu nêçîr nikare xwe ji destên wî rizgar bike. Piling ji ber ku zêde bi qewet e di çanda kurdan de remza hêz û îhtîşamê ye. “Di serdema Bûdîst de jî, eyarê pilingan hêz û îhtîşama Bûdîzmê simbolîze dikir.”⁹⁶ Piling di helbesta klasîk de ji bo awir, hêz û eyarê xwe yê giranbûha weke hêmana şibandîne cihê xwe girtiye.

Şox û şengê zuhrerengê, dil ji min bir dil ji min
Awirên heybet pilingê, dil ji min bir dil ji min (Dilovan, 2013: 170)

Ew dilbera nazdar û geş ku rûyê wê mîna gerstêrka gelawêjê dibiriqê û nêrînên çavên wê mîna awirên pilingan heybetdar in dilê min xiste êsîrê xwe. Ez dildarî xwe kirim.

Piling ajaleke gelekî livger, xwediyê rengên şox û şeng û hinekî xwedî sihûd e. Ji ber ku ew girsehêz hatiye afirandin hêza tu ajalî tesîrê lê nake. Xwediyê aqilekî

⁹⁶ Yaşar Çoruhlu; *Türk Mitolojisinin Anahatları*, Özgür Kitabevi, İstanbul, 2002, r. 138.

mukemel e. Lewra ew bi hêsanî nakeve xefk û kemînan. Di edebiyata klasîk de piling nîşana hêz, ihtîşam, mêranî û heybetê ye.

Di vê helbestê de awirên dilberê bi awirên heybetdar ên pilingan hatine şibandin. Ji ber ku awirên pilingan gelekî bi heybet û erjeng in. Her wiha ji bilî hunera şibandinê awirên dilberê bi awirên pilingê hatine şibandin Mela bêjeyên “dil ji min bir dil ji min” di dawiya hemû malikên xezalê de dubare kiriye bi vê yekê jî hunera tekrîrê derketiye holê.

Ji ceger Mela pilingan, bi kulab û pens kerr kir
Esedan ji pence vêran, dil û sîne herîşandin (Dilovan, 2013:159)

Cegera Melê pilingan bi pense û lapûşkan ji hev de parçe kirin. Şêran jî bi pençeyên xwe dil û sînga wî qetqetî û hûr kirin. Piling ji ber ku sembola hêz û qewetê ye lapûşkên wî ji bo êşa dil hatine bikaranîn. Di malika pêşîya vê malikê de Mela dibê dema me ew rû heyv dît têgihiştin ku tu mefer nema ku dê dil û ceger helak bibin. Ev malik jî berdewama wê ye ku dil û cegerê Melê ji ber bedewîya yara rûheyv helak bûye. Weke ku şêr û piling bi lapûşan cegera wî hûr û hêla bikin lê hatiye.

2.3. Marîjok û Kêzik

Di bin banê vî serenavî de em dê marîjok û kêzikên ku di malikên Melê de derbas dibin vekolin. Di nav van ajalan de ajalê ku herî zêde di helbestên Cizîrî de derbas dibe mar e. Mela di gelek malikên xwe de bi hûnerên edebî mar bi kar aniye. Ji bilî mar, dupîşk, tîmseh û gelek ajalên din jî di dîwana Melê de cih girtine. Ajala ku em dê pêşî vekolin dupîşk e.

2.3.1. Dûpişk

Dûpişk ji çîna girêçikpiyên jehrî ye. Dema xwe di xeterê de hîs dike bi derziya dûvê ser piştî xwe jahrê berdide laşê dijminên xwe. Li cih û heremên germ weke Batman, Riha û Mêrdînê bi taybetî di demsala havînê de pir tên dîtin. Bi şiklê xwe ajalekî erjeng e. Ev kêzik xwedî jahreke xetere ye ku bi hêsanî dikare mirovekî bikuje. Dûpişk bi vê jehra xwe yî dijwar hatiye nasîn û di wêje, stêrnasî û mîtolojiyê de hatiye bikaranîn. “Di mîtolojiya Mezopotamyayê de dûpişk bi jehra xwe sembola

hêza efsûnî û parastinê ye. Sembola xwedawenda evîn û jintiyê ku Îştar e.”⁹⁷ Di ol û baweriyên semawî de nêrîna li dûpişkê ne bi ewayekî erênî ye. Di baweriya cihûtiyê de dûpişk sembola rikberî û mirinê ye. Di mizgînîya Mesîh de sembola cihûyen murted e ku ji baweriyê dûr ketine. Di baweriya Zerdeştîyê de dûpişk yek ji sîxurên Ehrîman tê qebulkirin. Xwedayê tariyê ye û temsîla hêza xerabiyê ye.

Di pirtûka hadîsan a Buxarî de hadîseyek di derbarê dûpişk û çar ajalên din de heye. Hadîs bi vî rengî ye: “Pênc ajal fasiq in û mirov wan li Mekeyê li cihê harem jî dikare wan bikuje. Ev ajal; mişk, dûpişk, qijik, kulemar û segê wehşî ne.”⁹⁸

Di edebiyata klasîk ya kurdî de dûpişk navê bircekê ye. Jê re birca dûpişk tê gotin. Lewra di helbesta klasîk de hem di wateye bircê de hem jî weke ajalekî hatiye bikaranîn. Di helbestên Melê de bi navên ‘eqarib û yeka wê ‘eqreb jî derbas dibe. Dûpişk bi teşe û rengên xwe xirabiyê temsîl dike. Di helbesta klasîk de guliyên porê yarê bi dûpişk hatiye şibandin. Melayê Cizîrî jî ji bilî wateye neyînî kezîyên dîlberê şibandiye dûpişkan.

Zulfên put û şîrînleban jehrî ne şubhet eqreban
Lê min ji biska purgirê îro tîne girtin du ta (Dilovan, 2013:23)

Zulfên yarên lêvşêrîn, weke dupişkan bi jehr in. Lê dîsa jî min îro ji biskên yarê ên girêk girêkî destên xwe avête du takan. Ji ber ku kezîyên yarê girêk girêkîne Mela porên dilberê bi dûpişkan şibandiye. Gotiye her ku porê yarê jahrdar e jî min dîsa destê xwe avêtiyê. An ku min mirina xwe da ber çavên xwe û min destê xwe avête kezîyên yarê.

Di vê malikê de gelek caran lebatên yarê hatine şibandin. Mela porên yarê wekî pûtan şayesandiye. Ji ber ku bi gelemperî rengê porê yê serdest reş e ew weke temsîliyeta xirabiyê hatiye teswîrkirin. Her wiha rû jî nûra îlahî ye. Porên reş mîna pûtekî li ber nûra îlahî weke nobedarekî sekinîne. Ew nahêlin ku aşîq bigihêje meqsedên xwe. Lewra ev porên reş her tim weke pûtekî ji Mela re dibin sedama gunehan. Lêvên yarê weke şekirê şêrîn hatine teswîrkirin. Axaftinên yarê ji bo

⁹⁷ Neşe Yıldırım; “Yakın Doğu Sembolizminde Akrep, Yılan; Akrep Adam ve Şahmeran”, *Folklor/Edebiyat*, Hejmar 27, 2001, r. 8.

⁹⁸ Ebû Abdillâh Muhammed bin İsmâil Buhârî; *Sahîh-i Buhârî (el-Câmiu’s-Sahîh)*, Cilt I-VIII, Çağrı Yayınları, İstanbul, 1992, r. 16.

evîndar şêrîn in. Her ku lêvên yarê weke şekir şêrîn bin jî Mela ew şibandine dupişkan. Çawa ku dupişk bi jahra xwe yî kujer mirovan jahrî dike dîlber jî bi lêvên xwe yî sorî mîna agir derd û xeman dixê dilê evîndar.

Hat padîşahê pir sipah, qamet elîf dêm şubhê mah
Dad û meded sed ah û ah, zulf û 'eqarib têne ser
Kuştî me xelko eqrebê, mest im ji şewqa xebxebê
Talî' tenê me d'kewkebê, 'egarib têne der (Dilovan, 2013:94,95)

Ew dîlbera bejna wê weke tîpa elîfê rast û rûyê wê weke hîvê spî û şewqdar e, bi leşkerên xwe ve bi ser min de hat. Hewar e bi min ve werin. Sed ah û ah zulf û dupişk bi ser rûyê wê de têne xwarê.

Dûpişkan ez kuştîme û şewqa gerdenê ez dîn kirime. Daxwaziyên min jî ji stêrkan ku îro dûpişk derkevin. Di van herdû malikan de Mela zulfên li ser cênîkên yarê şibandine dûpişkan. Di malika dawî de hêvî ji stêrkan hatiye kirin ku birca eqrebê derkeve. Birca eqrebê yek ji duwazdeh bircan e ku di dema payîzê de serwext e. Mela ji bo ku payîz bi ser rûyê yarê de were û bedewiya yarê wî nekuje daxwaz ji felekê kiriye ku birca eqrebê serwext bibe. Her wiha birca eqrebê demsala payîzê serwext e û payîz jî remza kalbûnê ye.

Îro 'eqarib hate xwar, çû nêv-i baxê gul'izar
Ew bexçeya her lê bihar, lew bilbilan lê qal û şer (Dilovan, 2013:94)

Îro dûpişkan xwe berda ser rûyê yarê. Bexçeyekî her demsal lê bihar e. Gul û çîçek ji wî rûyî kêr nabin. Payîz lê peyda nabe. Lewra bilbil an ku evîndar her qala vî bexçeyî dîkin û li ser vî yara xweşik şer dîkin.

Di vî malikê de helbestvan bi awayekî hunermendane diyardeyeke xwezayê û rûyê dilbera xwe berawirdî hev kiriye. Li hemberî vî diyardeya xwezayê pesnê rûyê dîlberê hatiye dayîn. Mebest ji dûpişkan birca eqrebê ye ku ev birc di demsala payîzê de serwext e ku pelên dar û giyayan hişk dibin. Lê her ku birca eqrebê hatiye û gul û giya hişk bûne. Lê rûyê yarê ji bihara xwe an ku ji bedewiya xwe tu tişt wenda nekiriye. Her wek xwe maye. An ku tu bandora demsala payîzê li ser rûyê yarê çênebûye.

3.3.2. Tîmseh

Tîmseh dewekî marîjok ê ku di çêm û beravîyan de dijî. Ajaleke goşt xwer e. Di kurdî de jê re cirnîs jî tê gotin. Bi taybetî di çemê Nîlê de dijîn. Di edebiyata klasîk de bi navê nehing derbas dibe. “Tîmsehê ku di edebiyata klasîk de bi navê nehing derbas dibe. Ajalekî ji çîna marîjoka ye ku çerm stûr, dûv dirêj û dirinde ye. Li herem û rûbarên germ dijî.”⁹⁹ Di dîwana Melayê Cizîrî de tîmseh weke sembola meyxuran hatiye bikaranîn.

Tu şerabê bi xerabê, bi nehingan de demê
Dê kiyafet bi cih rengî me bikin kûze û tas (Dilovan, 2013:106)

Bi gemiyan meyê bide tîmsehan bila ji meyê têr vexwun. Vexwarina meyê bi tas û çêran wê çawa têra me eraqvexwaran bike. An ku vexwarina bi alavên piçûk têrî me nake.

Di vê malikê de ji hûnerên edebî hûnera tenasûbê heye. Di vê malikê de teşbîha qedehan bi geştiyan û şibandina meyxwuran bi tîmsahên ku têr nabin hunermendane hatiye nivîsîn. Lewra ji hûnera tenasûbê re mîna keke nuwaze ye.

3.3.3. Morî

Ajaleke ji çîna kêzika ye û piçûk e. Morî bi kolonî tevdigerin. An ku bi malbatî di bin axê de li morîstanan dijîn. Di nava morîyan de sazûmaniyek heye. Hemû li gor wê sazûmaniyê tevdigerin û qet dernakevin dervî wê. Di meş û bi rê ve çûnê de, di yek rêzê de li pey hevdu dimeşin. “Morî bask berde, laş piçûk û xwedî nifûseke qerebalix in. Li koloniyên di binê erdê de dijîn û nîzameke wan heye.”¹⁰⁰

Morî di edebiyata klasîk de ji ber meseleya wê ya bi Silêman Pexember re pir hatiye bikaranîn. Pexember Silêman ku pêxemberekî hikumdar e dema ku diçe seferê dengê morîyan dibihîze. “Dema ku ew têne geliyê moriyan, morîyek dibêje ey morîno! Bikevine hêlînên xwe; da ku Silêman û artêşa wî bêhemdê xwe li pê we nekin.”¹⁰¹ Dema Hz. Silêman van gotinan his dike, dikene. Ji ber meseleya Hz.

⁹⁹ Parlatır; *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, r. 172.

¹⁰⁰ Hülya Boz; “Klasik Türk Şiirinde Karınca”, *Vankulu Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Hejmar 4, Van 2019, r. 28.

¹⁰¹ Kurana Kereim, *Sûreya Neml*, ayet 18.

Silêman û morîyan di beytên edebiyata klasîk de gelek caran navê morî û Hz. Silêman bi hev re cih digirin. Lê belê ji bilî van hemûyan di edebiyata klasîk de Hz. Silêman sembola hêz û qewetê ye û morî jî sembola lewazîyê ye.

Di dîwana Melê de morî bi navê zerre derbas dibin. Cureyekî morîyên gelekî piçûk in û weke sembola piçûkiyê hatine bikaranîn.

Sar dibit dil ma bi sed cewr û cefayan zerreyek
'Îşq-i teb'et nar e hingî dê biçit dijiwari bit (Dilovan, 2013:46)

Ma sar dibe dilê min bi qasî zerreyekê ku bi sedan zor û zehmetî hebin jî. Dilê min qet ji eşqa te sar nabe. Ji ber ku evîna min weke agir e. Her ku diçe geştir û dijiwartir dibe. Morî ji ber piçûkiya xwe di vê malikê de hatiye bikaranîn. Kêzikeke gelekî piçûk e. Her wiha di vê malikê de ji hûnerên edebî îstifham heye. Îstifham bêyî ku li benda bersivê be ji bo xurtkirina wateyê pirsek tê kirin.

Mela jî bêyî ku li benda bersivê be ji bo xurtkirina wateyê pirs kiriye û gotiye ma sar dibe dilê min bi qasî zerreyekê yan ku nabe lewra ev mînak ji hunera îstifhamê re mînaekeke xweş û balkeş e.

Mîrî û padîşahî, mûyek li nik Mela yî
Nadim bi milkê alem yek zerreyek înayet (Dilovan, 2013:55)

Mîrî û serwerî li ba Mela tayek mû ne. Heta kemala van tiştan bi qasî mûyekî jî tune ye. Zerreyeke bi tenê ya guhdana yarê bi mîrî, serwerî û hemû mal û milkê dinyayê nadim. Di vê malikê de Cizîrî zerreyek înayet ji paşîya ristê vegerandiye pêşîya ristê. Lewra di vê malikê de hûnera rewanbêjîyê heye. Morî jî sembola piçûk û bêqîmetiyê ye.

3.3.4. Mar

Hem pêvajoya wî ya jiyanê û hem jî mercên nebaş ên ku tê de dijî ji kunên binê erdê ve derketina holê û sedema ku ew xwe ji nû ve zindî dike û bê xwîn ji kirasê çermê xwe vediqete, bûye sedem ku ji hêla mirovan ve weke sembola mirin û ji nû ve jidayikbûnê were hesibandin. Car carinan ji ber heman sedemê bi derman re hatiye têkildarkirin. Di destanên kurdan de jî mar di sembola berdewamiya bê edaletî, zilm û xerabiyê de hatiye bikaranîn.

Di çanda kurdan de tê bawerkirin ku gencîne ji aliyê maran ve tên parastin. Marên ku bi sedan salan dijîn hene. Ji wan maran re marên zîha an jî ejdeha û ziya tê gotin. “Ev mar ji ber mezinahiya xwe ev nav girtiye. Dema marek ji aliyê emrê xwe ve zêde mezin bibe laşê marê jî beramberî emrê xwe mezin dibe û her weha ev mar dibe Ziha.”¹⁰²

Di edebiyata klasîk de yek ji ajalên ku herî zahf hatiya bikaranîn mar e. Mar bi şikil û rengên xwe xirabiyê temsîl dike. Ji ber jehra wî ji aliyê mirovan ve nehatiye hezkirin. “Mar tenê ne bi şiklê xwe ji ber jahra xwe jî di helbestan de gelekî hatiye bikaranîn.”¹⁰³

Di helbesta klasîk de porên yarê yên reş û dirêj û bi fetlonek bi mar hatiye şibandin. Mela jî di hin helbestan de mar bi navên wekî ef’a, erqam, îlan û jiha bikaraniye û porên yarê bi mar şibandiye.

Herdu îlanên te dê min toqê gerden kir medam
Da mi her bêtin tebessum wek gula dehhakê rûh (Dilovan, 2013:73)

Herdu keziyên te yên weke maran min kirine toqek di sitûyê xwe de. An ku min herdû keziyên te li qirika xwe gerandine. Min xwe xistiye êsîrê evîna te. Da ku giyanê min tim tebessumê bike. Mebest ji herdû îlanan keziyên yarê ne. An ku herdû keziyên yarê bi mar hatine şibandin. Îlan an ku yılan di zimanê tirkî de mar e.

Zinharî kesê destî bibit erqemê serwê
Bê ‘uşweyê le’lan ne bi teslîmî jiha girt (Dilovan, 2013:47)

Kesê ku destûr ji yara ku bejna wê weke dara serwîyê ye nexwestibe, bila destê xwe nede porên wê ku weke maran e. Ji ber ku porên yarê weke marên jiha xeternak in û bêdestûr kes nikare destê xwe bigîhîne keziyan. Di vê malikê de mar du caran derbas bûye. ‘Erqamê serwê’ marê li ser dara serwê ye ku dara serwê dareke gelekî dirêj e. Bejna yarê bi serwê û porên yarê bi mar ve hatine şibandin. Mela marê zîha jî ji ber xeternakiyê bi kar aniye. Kesên ku bêdestûr destê xwe bavêje keziyên yarê ew kezî dê weke marê zîha ji bo wan kesan xetarnak bin.

¹⁰² Şehadet Sarıgül; Mar di Mîtolojiya Cîhanê de û di Vebêjên Gelerî yên Mûşê de Marê Ziha, *Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Hejmar 8, Muş, 2019, r. 37.

¹⁰³ Pala; *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 309.

Ew çiçekên şetrî şibeht, efa sifet qelbê me mêht
Selwa ji balayê we reht, ev perdeya gulnar-i xet (Dilovan, 2013:120)

Ew çiçekên ku weke morikan in, weke marekî bi dilê me vedan. Yarê jî ew perdeya gulnarîn ji serwîya bejna xwe dawirand. Mela zulfên yarê bi dirêjîyê şibandiye mar û bi rengê sor jî şibandiye gulnarê. Dibe ku porên yarê hinekirî bin. Lewra bi dirêjîyê şibandibe mar û bi rengê xwe şibandibe gulîlka hinarê.

3.3.5. Mêş

Di helbestên Cizîrî de ajala ku bi navê megesê derbas dibe mêş e. Gelek cureyên mêşan hene. Di helbestên klasîk de carinan şana yarê bi mêşa reş hatiye şibandin. Lê ji ber ku ji tiştên şêrîn hez dike, çiqas kiş dîkin û dixin der vedigere. Bêar û bêrû ye. Lewra evîndar pê hatiye şibandin.

Di dîwana Melê de jî mêşê ji ber rikdarîya xwe cih girtiye. Ji ber ku ajaleke rikdar e evîndar bi mêşê hatiye şibandin.

Sed cewr û cefa dî bi me, naçîn ji derê te
Yekser tu nebat î û li teb'ê meges im ez (Dilovan, 2013:96)

Eger tu çiqas zor û zehmetîyê bidî min jî ez ji ber deriyê te ne diçim û ne jî xwe didim alî. Ji ber ku tu yekser şekirî û tebîetê min jî weke yê mêşê ye. Ji ber ku her çiqas mirov mêşan diqewirîne jî ew dîsa li mirov vedigerin. Lewra Mela bi hûnereke edebî evîndar bi mêşê şibandiye û yar jî weke şekir pênase kiriye.

3.3.6. Perperîk

Perperîk cûreyek ji kêzikên ku difirin û bi hêkan zêde dibin. Ev ajal bi awayekî maşot mezin dibin an ku di eslê xwe de kurm in. Bi kêm temenîyê têne nasîn. Hin cûreyên wan tenê hefteyekê dijîn. Di ziman û diyalektên kurdî de zêdeyî sî navên perperîkan hene. Pepûle, perîstank, perîtang, perperik, perperok, perwane, pilpiling, şerîfok, belbelîtank, belîtank, firfirok, pelatûtik, û peleseywanok hin ji van navan in. Di helbesta klasîk de herî zêde perwane derbas dibe. Cureyekî ji perperîkê şevê ye. Perwane heya ku xwe dişewitîne bi şemê re têdikoşe. Çavên perwaneyan gelekî piçûk in. Bi roj li cihên tarî dilîsin. Dema ku dinya tarî dibe ber bi ronahiya ku dibînin ve difirin. Ji ber ku çavên wan diteyisin nikarin xwe ji ronahiyê dûr bixin. Lewra li tiştên rewnaq ên wekî agir û lempeyan digelîbin.

Xweşewitandina perwaneyê di helbesta klasîk de gelekî hatiye dubarekirin. Ji ber ku remza evîndarê ku di agirê evînê de dişewite. Di tesewifê de jî perwane semboleke girîng e. Ew sembola zatê fena ye ku di eşqa Xwedê de dişewite. “Bi gelemperî, dema ku şem û perwane di malikekê de bi hev re têne bikaranîn, şem sembola evîna dûrîdest e. Perwane jî sembola evîndarê ku canê xwe dide ji bo gihîştina wê.”¹⁰⁴ Di demên kevin de ji ber ku mûm ji bo ronahiyê çavkaniyeke girîng bû, helbestvanan ev ajala ku li dora mûmê dizivire şibandine evîndar û dîlber jî bi mûmê şibandine.

Di dîwana Melayê Cizîrî de perwaneya ku gelek caran behsê hatiye kirin, bi çirayê re hatiye bikaranîn. Ji ber ku pervâne sembola evînê û çira jî sembola evîndar e.

Gelo dîsa bibînim ez, çirayê wesletê hilbit
Bisojim şubhê perwanê, di ber wê nûr û şewqê da (Dilovan, 2013:25)

Gelo ma ez ê carekedin bibînim ku çiraya civana yarê pêketiye. Ez weke perwaneyekê li ber şewqa çiraya yarê dişewitim. Di vê malikê de evîn û evîndar bi çira û perwanê hatine şibandin.

Şem û perwane bi zatê xwe, ji halê me di dûr in
Ateşek sirf e ji eşqa te, vewesta me lebaleb (Dilovan, 2013:33)

Çiraya ku dişewite û perwaneya ku xwe di agirê wê de dişewitîne, ew dûrî halê min in. Her ku perwane dişewite jî rewşa min ji ya perwanê xirabtir e. Ji ber ku agirê evîna te agirekî sirf e û ji agirê mûmê gelekî diwartir e û ev agirê diwar ji serî heta binî ez şewitandime. Di vê malikê de hûnera teşbîh û mubalaxayê heye. Mela agirê evînê ji agirê çirayê diwartir pê nase kiriye.

Ser ta bi qidem, ez bisujim şubhê Melayî
Perwanesifet suhtim û bê sewt û his im ez (Dilovan, 2013:97)

Ji serî heta pîyan wekî Mela bisojim ne girîng û xem e. Weke perwanê bêhis û bêdeng im ez. Xweşewitandina perwaneyê di helbesta klasîk de gelekî hatiye dubarekirin. Di helbesta klasîk de perwane remza evîndarê ku di agirê evînê de dişewite. Ji ber ku dema perwane dişewite bêhis û bêdeng e Mela xwe şibandiye

¹⁰⁴ Derya Karaca; “Klasik Türk Şiirinde Şem ve Pervane Kullanımları,” *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Hejmar 61, 2018, r. 142.

perwanê û gotiye eger ez bişewitim jî ez dengê xwe ji ber êşa evîna te dernaxim. Ez ê weke perwanê bêhis û bêdeng di evîna te de bişewitim.



ENCAM

Ji destpêka mirovahîyê û vir ve ye têkilî û têkoşîna însan bi xwezayê re dest pê kiriye. Ji mirovên ewil heta îro xweza bûye navenda jiyana mirovan. Ev rewş bûye sedem ku xweza bandorê li jiyana rojane û li gelek qadên din bike. Bi taybetî helbestvanên xwedî hestên hestiyar û raman kûr zahftir di bin vê bandora xwezayê de mane. Ev rewş bi zelalî di helbestên wan de jî xuya dike.

Di vê lêkolînê de dîwana Melayê Cizîrî ji hêla hêmanên xwezayê ajal û nebatan ve hatiye lêkolînkirin. Ewil helbestên ku di dîwana Melayê Cizîrî de cih digrin hatine kontrolkirin. Di helbestên ku hatine analîzkirin de ajal û nebatên heyî hatine nîşegirtin û tesnîfkirin. Bi vî rengî beşên tezê hatin tesnîf û amadekirin. Lêkolîna me ji destpêk, sê beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de qala çarçove û metodolojîyê hatiye kirin. Di bêşa yekem de danasîna jiyana û kesayeta edebî ya Melayê Cizîrî hatiye kirin. Di bêşa duyem û seym de ajal û nebat hatine senifandin û tehlîlkirin.

Di xebatê de eşkere bûye ku yek ji helbestvanê gewre yê sedsala 16an Melayê Cizîrî di helbestên xwe de ajal û nebat pir bi kar anîne. Hat dîtin ku Melayê Cizîrî di warê şêwaz, bêje û bikaranîna zimên de gelekî hûnerwer û pêşketiye.

Piştî pêşgotinê, xebata me bi sê beşên sereke û her beşek di nava xwe de bi binbêşa hatiye senifandin. Di encama vê lêkolînê de em gihaştin van encaman:

Dîwana Melayê Cizîrî ji aliyê wêje û hûnerê ve di nav wêjeya kurdî de di asteke bêhempa û di dereceyeke bilind de ye. Ji bo kesên ereb Ebû Tayyîb el-Mûtenebbî û ji bo Eceman Hafîz, her çiqas hêja bin, ji bo kurdan jî Mela keseyetekî ewqasî hêja û qedirbilind e.

Gelek nîqaş di derbarê jiyana Melê de hatine kirin lê agahiyên ku Mela di hin malikên dîwanê de bi hesabê ebcedê dane çavkaniyên herî pêbawer in.

Mela di sedsala 16-17an de di dewra Mîrektiyên kurdan de li deverên wekî Heskîf û Cizîrê jiyaye û karûbarên mîrê Cizîrê kiriye. Mela di wêjeya kurdî de helbestvanê ewil e ku di bin sitara serwerekî de dîwaneke birêkûpêk nivîsandiye.

Li gor pîvanên edebiyata klasîk di nava kurdan de cara pêşî Cizîrî dîwaneke bipergal nivîsandiye. Di encama xebata me de eşkere bûye ku di helbestên Cizîrî de ji hêmanên xwezayê ajal û nebatên curbicur bi awayekî hunermendane hatine bikaranîn.

Tesîreke xurt ya xwezayê li ser helbestên Cizîrî çêbûye. Ajalên ku di helbestên Cizîrî de cih digrin cihêrengiyeke mezin nîşan didin. Ajalê ku herî zêde hatiye bikaranîn bilbilê ku di edebiyata klasîk de sembola evîndarê dil bi kul e. Xezal jî ji ber xweşikiya çavên xwe û narîniya xwe pir hatiye bikaranîn ku yar pê hatiye şibandin. Pervaneya ku sembola evîndar e û marê ku temsîla porên yarê ne du ajal in ku zêde hatine bikaranîn.

Di lêkolînê de hêmanên xwezayê carînan bi wateyên erênî carînan jî bi wateyên neyînî derketin pêşberî me. Bi vê xebatê careke din derket holê ku xweza çemeke û jiyanê dide deryaya helbestan.

Di dîwanê de hêmaneke din ya xwezayê dar bûn. Gelek cûreyên daran derketin pêşberî me. Dar bi gelemperî di watên mecazî de bi meteforan di helbestan de cih girtine. Bejn û bala dilberan bi daran hatine şibandin. Dara ku herî zêde hatiye bikaranîn serwî û er'ar e. Di helbestên helbestvan de gelek hûnerên edebî hatine bikaranîn ji van hûneran ên herî berbelav ku derketin pêşberî me îstîfham, mubalaxa, teşbîh, îstîfâre û tenesûp in.

Lêkolîna me nîşanî me da ku xweza deryayeke bêserûbin e û vê deryayê hêz û îlham daye hemû helbestvanan. Her wiha em dikarin bêjin ku vê deryaya bêserûbin di piraniya helbestan de cihê xwe girtiye. Ev hêmanên xwezayê ji wateyên rastîn bêtir di wateyên mecazî û edebî de hatine bikaranîn. Her wiha bi vê lêkolînê eşkere bû ku helbestvanên serdema klasîk di derbarê stêrzanî, dîrok û bîyolojîyê de xwedî zanîneke kûr û berfireh in. Di vê lêkolînê de eşkere bû ku Melayê Cizîrî di derbarê ajal û nebatan de kesekî zêde haydar û serwest e.

ÇAVKANÎ

- Acar, Hayrullah; “Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Farisînûsî: Nimûneya Weda’î” e-*Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, Hejmar, 8/1, 2016, r. 297-326.
- Adak, Abdurrahman; *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2014.
- Alparslan, Erdoğan, “*Ferhenga Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*”, Zanîngeha Dicleyê EZC, Diyarbakır 2021.
- Aslanoglu, Osman; “Gîya di Dîwana Şêx Ebdurrahman Aqtepî da”, *The Journal of Mesopotamian Studies, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşan Diller Enstitüsü Dergisi*, Hejmar 5/1, Mardin, 2020, r. 22-46.
- Ayvazoglu, Beşir; *Güller Kitabı, Türk Çiçek Kültürü Üzerine Bir Deneme*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2008.
- Badî, İsmail; “Bibliyografyayê Melayê Cizîrî”, *Mecelletu Vejîn, Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, hejmar 20, Bingöl, 2000, r. 86-101.
- Batıslam, H. Dilek; “Divan Şiirinin Mitolojik Kuşları: Hümâ, Anka ve Simurg”, *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi*, Hejmar 1, İstanbul, 2008, r. 185-208.
- Bayram, Yavuz; *Çiçeklerle Diğer Bitkilerin Dîvân Şiirine Yansımaları ve Anlam Çerçeveleri, Ondokuz Mayıs Üniversitesi SBE, Samsun, 2001.*
- Bayram, Yavuz; “Klasik Türk Şiirinde Duyguların Dili: Çiçekler”, *Turkish Studies*, Hejmar, 2/4, 2007, r. 209-219.
- Bolelli, Nurettin; “Kürt Bilginlerin Yazdıkları Bazı Eserlerinin Tanıtımı”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Hejmar 1/1, Bingöl, 2015, r. 67-81.
- Boz, Hülya; “Klasik Türk Şiirinde Karınca”, *Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Vankulu Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Sayı.4, Van, 2019, r. 27-56.
- Buhârî, Ebû Abdillâh Muhammed bin İsmâîl; *Sahîh-i Buhârî (el-Câmiu’s-Sahîh), C.I-VIII*, İstanbul, Çağrı Yayınları, İstanbul, 1992.
- Ceylan, Ömür; *Kuşlar Divanı-Osmanlı Şiir Kuşları*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2007.
- Cizîrî, Mela Ebdusselam; *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Amd. Tehsîn İbrahîm Doskî, Wer. Jan Dost, Weşanên Dara, Dîyarbekir, 2018.
- Çavuşoğlu, Mehmet; *Necâtî Bey Dîvânı’nın Tahlili*, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 1971.

- Çoruhlu, Yaşar; *Türk Mitolojisinin Anahatları*, Özgür Kitabevi, İstanbul 2002.
- Çukurlu, Talip; Divan Şairinin Gülistan/Gülzar/Gülşen Mefhumu, *Journal of Turkish Language and Literature*, Hejmar 2, 2017, r. 69-85.
- Devellioğlu, Ferit; *Osmanlıca- Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Yayınları, Ankara, 2009.
- Demirdağ, Muhammet Fatih; "Alevi-Bektaşî Şiirinde Kuş Mitolojisi", *Külliyat Osmanlı Araştırmaları Dergisi*, Hejmar 2, 2017, r. 12-18.
- Demirkazık, İbrahim; "Divan Şiirinde Karga", *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi*, Dergisi, Sayı 24, İstanbul, 2011, r. 131-178.
- Dêreşî, Seîd; *Dîwana Weda'î*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2012.
- Deylemi, Şehredâr b. Şîrûye; *el-Firdevs bi Me'sûri'l-Hitâb*, C. 1, Beyrut, 1996.
- Duran, Yasin; "Berawirda Şîretên Ku Di Helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî De Derbas Dibin", *Kurdîyat, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Hejmar 3, Van, 2021, r. 101-117.
- Dilovan, Selman; *Dîwana Melayê Cizîrî*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2013.
- Doskî, Tehsîn İbrahim; Şerha Dîwana Ehmedê Xanî, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2022.
- Doski, Tahsin İbrahim; "Mele Ebdirrehîmê Westanî û Şerha wî li ser Dîwana Melayê Cizîrî", *Kurdîyat, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Hejmar 7, Van, 2023, r. 59-73.
- Ergün, Zülküf; "Peywendiya Mîr û Mela di Çarçoveya Patronaja Edebî de", *Mukaddime*, Hejmar 8 (Özel Sayı 1), 2017, r. 153-170.
- Farqînî, Zana; *Ferhenga kurdî-tirkî-kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stembolê, Stenbol, 2011.
- Gülhan, Abdülkerim; "Divan Şiirinde Meyveler ve Meyvelerden Haraketle YapılanTeşbih ve Mecazlar" *Turkish Studies, International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Hejmar 3/5, 2008, r. 345-374.
- Gündoğdu, Rıdvan; *XIX. Yüzyıl Klâsik Türk Şiirinde Mevsimler*, Dumlupınar Üniversitesi SBE, Kütahya 2017.
- Gürbüz, Hulusi; "Everekli Seyranî Divanında Kuşlar", *Turkish Studies*, Hejmar 9/6, 2014, r. 485-504.

- Hakverdioğlu, Metin; “Sevgili Neden Servi Boyludur?”, *Amasya Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Hejmar 4, Amasya, 2016, r. 215-230.
- Karaman, Gülay; “Perîşân Çiçek Sünbül ve Klasik Türk Şiirinde İşleniş”, *İnsan ve Toplum Bilimleri Araştırmaları Dergisi Journal of the Human and Social Science Researches*, Hejmar 1/2, 2012, r. 288-319.
- Kandemir, *Fatma, Bâkî ve Nedîm’in Gazellerinde Sevgilideki Güzellik Unsurları*, Trakya Üniversitesi SBE, Edirne, 2008.
- Kur’an-ı Kerim Meâlî*, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara, 2008.
- Karaca, Derya; “Klasik Türk Şiirinde Şem ve Pervane Kullanımları,” *Uluslararası Araştırmalar Dergisi*, Hejmar 61, 2018, r. 129-146.
- Kurdo, Qenate; *Tarîxa Edebîyata Kurdî, Weşanên Öz-Ge*, Ankara, 1992.
- Kutlar, Fatma Sabiha ve Öztekin, Özge; “Divan Şiirinde Çiçeklere Dair”, II. Uluslararası Gölbaşı Göller-Andezit ve Sevgi Çiçeği Festivali, Bizim Büro Basımevi, Ankara, 2006. r. 601-627.
- Koyî, Hecî Qadir, *Dîwan, Wêşanên Nefel*, Årsta/Sweden, 2004.
- Milan, Morad Berouki, “Hemanên Îranî Yê Dîrokî û Mîtolojîk di Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Dîwana Melayê Cizîrî de”, *Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yê Li Tirkîyeyê, Mêrdîn*, 2019.
- Neşe, Yıldırım; “Yakın Doğu Sembolizminde Akrep, Yılan; Akrep Adam ve Şahmeran”, *Folklor/Edebiyat*, Hejmar 27, 2001, r. 5-22.
- Onay, Ahmet Talât; *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı*, Millî Eğitim Bakanlığı Yayınları, İstanbul, 1996.
- Ögel, Bahattin; *Türk Mitolojisi II*, Türk Tarih Kurumu Basımevi, Ankara, 1996.
- Öztürk, Levent; “Sevginin Sembolik Betimi: Elma”, *Turkish Studies-International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Hejmar 3/5, 2008, r. 607-614.
- Pala, İskender; *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2005.
- Parlatır, İsmail; *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, Yargı Yayınevi, Ankara, 2016.
- Sadinî, M. Xalid; *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, Nûbihar, Stenbol, 2014.
- Sarıgül, Şehadet; “Mar di Mîtolojiya Cîhanê de û di Vebêjên Gelerî yê Mûşê de Marê Ziha”, *Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi Anemon*, Hejmar 8(UMS’20) Muş, 2019, r. 35-40.

Sakaoğlu, Necdet; “Lale”, *Dünden Bugüne İstanbul Ansiklopedisi*, C. 5, Tarih Vakfı Yayınları, İstanbul, 1994.

Soysal, M. Orhan; *Edebi Sanatlar ve Tanınması*, MEB yayınları, İstanbul, 1998.

Şeyxbizînî, Qendîl; “Di nav çand û baweriya kurdî de dar”, *Xwebûn*, 8 Çile 2023.

Tektaş, Musa; Muhabbet Gülleri, Nasihat Yayınları, Ankâra, 2006.

Turan, Abdalbaki; Melayê Cizîrî Dîwanı ve Şerhi, Weşanên Nûbiharê, Ç. Duyem, Stenbol, 2012.

Uraz, Murat; Türk Mitolojisi, Düşünen Adam Yayınları, İstanbul, 1994.

Yaylalı, Yasemin, “İbn Yemîn’in Gazellerinde Çiçekler, Ağaçlar ve Meyveler”, *Atatürk Üniversitesi İlahiyat Tetkikleri Dergisi*, Sayı 2, Erzurum, 2017, r. 272-297.

Zivingî, Mela Ehmed; Gerdeniya Gewherî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Ç. Yekem, Stenbol, 2013.

Xeznedar, Marûf; Mêjûyî Edebî Kurdî, Weş. Aras, C. 3, Hewlêr, 2001



T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

**MELAYÊ CİZÎRÎ DİVANINDA BİTKİ VE
HAYVANLAR**

Nihat OĞURTAY

20711011

Danışman:

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mardin-2023